Lijneya IKMG'ê ya weşanê: ... weke IKGM, em hewl didin ku lijneyeke pisporên zimanî ava bikin ... ▶ R. 2

LE MONDE diplomatique kurdî

Tîrmeh-Tebax 2010 - Hejmar 9 www.lemonde-kurdi.com · info@lemonde-kurdi.com 24 Rûpel

Îran û Rûsya, di navbera hevkarî û xirecirê de
JACQUES LÉVESQUE
▶ R. 4

HEVPEYVÎN
Diyalogeke banal di navbera Chomsky û guhdarên wî de
▶ R. 6

Li Amerîkayê, peywendiya parêzerî û siyasetmedariyê
ALAIN AUDI
▶ R. 8

Nasyonalîzma flamanî ku ji motîfên nasnameyî bêtir xwedî bingehekî civakî ye
SERGE GOVAERT
▶ R. 10

Di nava Ereban de dînamîkên çandî
HICHAM BEN ABDALLAH EL ALAOUI
▶ R. 19

# Civata rêzdar, Împeretoriya bêrûmet

SERGE HALIMI

Li Fransayê bablîsokeke eşkerekirinê dibe sedema ku mirov di ciyê xwe de bişeqize… Tê gotin ku birêvebirên siyasî bi berdewamî milmilaneyê -him jî bi dostaniyeke jidil- bi mêr û jinên karsaz re dikin. Ev karsaz partiyên birêvebirên siyasî -û kampanyayên wan- fînanse dikin. Li hemberî vê xizmeta xwe, ew jî dê kêmkirineke hêja a mîqdarê baca xwe bi dest bixin. Ya hîn balkêştir: kêmkirina baca li ser hatiniya pirr (nêzîkî 100 milyar Euroyî li ser deh salan) e, ku wê bi taybetî bibe xwedî îmtiyaz ... hatiniya pirr, ji sala 2006'an û vir ye bi "mertal"ekî ku bi vê niyetê hatiye çêkirin tê paraztin. Di encamê de, hejmara birêvebiran (û malbatên wan) yên ku ketine telaşa xwe bi xwe pêkanîna pêdiviyên qanûna nû ya giştî, ku ji karê sendîkayê bêtir dixwazin bibin karsaz, dê zêdetir bibe.

Bi vî awayî, "bûyera Bettencourt" ê tiştê ku ji berê ve xuya bû [1] eşkeretir kir. Nîsana bihurî, gelo rojnamevanên lêkolîner û profesorên rûmetê di xew de bûn, ku Bernadette Chirac ket konseya birêvebiriya LVMH, grûba luks ku ji aliyê Bernard ve tê birêvebirin û sermiyanê sereke yê Fransayê ye? Dîsa di heman demê de, Florence Woerth li Hermès'ê ji xwe re karekî birêvebiriyê bi dest xist. Ji zû ve ye ku wê bala xwe daye ser karê xwe –bêyî ku ev yek piçekî jî be dilê wê bibijînepereyê Liliane Bettencourt'ê, ku ew jî sermiyana Fransayê ya duyem e. Eric Woerth ji bo wê wiha dibêje: "*Ez wezîrê wekheviya jin û mêran im, heger min rê li ber kariyera jina xwe bigirtaya, min ê neheqiyeke mezin kiribûya,* [...] *ku beramberê ya min e* [2]" Bi rastî jî kes nikare wî ayil bike ka çima li hemberî pêşketina jina xwe ya pîşeyî derneketiye, lê kesî dengê xwe nekir bê çawa "beramberî"yeke wiha di navbera karê birêvebireke sermayedar a mezin ku xema wê li Seychellesê "sivikkirina bacê" ye û yê wezîrekî karên civatî de ku xwe ji bo kesaxa teqawîtiya karkeran amade dike de, destnîşan bike. Ev tişt hemî, berî "bûyera Bettencourt"ê bûn. Têkiliyên di navbera pere û desthilatê de wê demê jî weke yên îroj bû. Lê, wê demê, tu pirsgirêk tunebû.

Bandora vê "skandal"a nuha dibe ku ji hûrgiliyan be: Wezîreke Dewletê ya ciwan a li ser karê xwe azwer ku ji bo li ber birêvebirên foneke spekulatîf a bi navê City bigere ji serdaneke fermî ya Londrayê îstifade kir da ku şîrketa xwe ya bi navê "Nouvel Oxygène" fînanse bike; di rewşeke wek ya Bettencourt'ê [3] de, ji hatiniya salê rêjeyeke bacê ya %1 ta % 6'an tê xwestin (mertal xwe dide ber...); rojnamevaneke navdar ku li ser TF1'ê (kanaleke televizyona ya taybetî) bi xwediya L'Oréalê re hevpeyvînekê pêk tîne wiha dibêje: "*Ez wê nas dikim ji ber ku min bi wê û mêrê wê re li mala dostên hevbeş şîv xwariye. Carinan em bi minasebeta hin pêşangeyan jî li hev rast hatine.*"

Ji bo ku ev bûyera ku weke livlavkê belav dibe bibe gerdeniya Qralîçeya olîgarşiya Fransî, divê dijberê wê, bi kêmanî, di navbera giştî û taybetî de encameke weha jê derkeve ku peywendiya dezgehên fermî û yên taybetî bi dawî bibe, helbet divê "xizmeta" rojnamevanan jî neyê jibîrkirin ku wan jî bi vî awayî peymana hevkariya xwe ya bi dewlemendiyê re çêkir. Ji aliyê din ve, heger hêviya paqijkirina atmosfera Împeretoriya bêrûmet bûbe sedema anîna Elîzeyê ya birayekî Sarkozy yê din yê siyamî, şemateya meha dawîn bi kêrî tişekî nehatiye. Weke mînaka, Birêvebirê Giştî yê Fona Navneteweyî ya Pereyan [4]. Sermiyanên mezin dê serketina sosyalîstekî din ê karsaz di xefikeke dîtir de pîroz bikin. Û her tişt dê dîsa ji nû ve dest pê bike.

Wergera ji fransî: Yakûb Karademîr

1- Li dosyaya me ya heşt rûpelî ya li ser «Pere û siyasetmedar» an binêrin, di serê hezîranê de derketiye
2- ANF / AFP, 21'ê Nîsanê, 2010
3- Weke Thomas Piketty dibêje, «Gelo Liliane Bettencourt bacê dide?», *Libération*, 13'ê tirmehê, 2010
4- Olivier Toscer bixwînin, «Li çepê, lê nêzîkî derdorên karsazan», *Le Monde diplomatique*, çiriya pêşîn, 2003

4 191764 203502 09

Almanya: 4,50 €
Awûstûrya, Belçîka, Fransa, Hollanda: 5,00 €
Brîtanya: 4 £, Danîmarka: 40 DKK, Norweç: 40 NOK, Swêd: 50 SEK, Swîsre 6,50 CHF

## TURKIYE Û PIRSGIRÊKA KURDÎ

# Ji Hewldana Çareseriyê ber bi Şerrê Navxweyî ve

PROF. MITHAT SANCAR *



SERHAD BAPIR, *Libendêmayîn*, 32 x 32 cm, Grafîka bi şîrêjê ya li ser Linoleum

Hewldana Vebûna Kurdî ya ku Hikumetê tebaxa sala çûyî dabû destpêkirin, kiribû ku di pirsgêreka Kurd de hêvî ji nû ve û bi awayekî xurt vejiyana. Ji bo çareseriyê şertên derve û yên hundir guncav dixuyan. DYA'yê plana xwe ya vekişîna ji Iraqê eşkere kiribû. Meşandina vê planê bi awayekî eşkere li Kurdistana Iraqê bi "parastina îstîqrarê" ve girêdayî bû. Ji aliyê îstîqrarê ve, diviya têkiliyên Birêvebiriya Herêma Kurdan ya Iraqê û Turkiye'yê bihatana "normalîze" kirin. Di vî karî de şertê herî girîng ew bû ku PKK êdî nebûya "faktora serêşandinê". Şerrekî di navbera PKK'yê û Kurdên Iraqê de ne li gora fikra îstiqrarê bû. Ji ber wê, pêdivî bi rêbazeke weha hebû ku PKK'yê û Kurdên İraqê ber bi şerr ve nebe. Di vê rewşê de, teşwîqkirina Turkiyeyê ku pirsgirêka xwe ya Kurd çareser bike, weke rêya herî guncav diyar dibû.

Ji hêla din ve, hilbijartinên herêmî yê 29'ê adara 2009'an, polîtîkaya AKP'yê ya kurdî bi awayekî cîddî hejandibû. Bêtesîrkirina tevgera kurd a siyasî û piştî wê jî "vebûna bikontrol û vebûna sînorkirî" baskê vê polîtîkayê yê herî girîng pêk dianî. Li pişt girrê serokwezîr Erdogan "wergirtina Diyarbekirê" jî ev hesab hebû. Serkeftina ku DTP'yê di hilbijartinê bi dest xistibû, mecbûr kir ev hesab biguherin. Êdî ji aliyê AKP'yê ve jî wexta "tiştên nû" hatibû. "Vebûna Kurdî" di vê çarçovêyê de weke "ceribandinekê" kete dewrê.

Hikumetê serê ewilî xwe dûrî "naveroka pirsgirêkê" digirt û meseleya "rêbaz û şewazê" bi pêş derdixist. Hikumetê di vê zemînê de civîn li dar dixistin û bi hinek derdoran re hevdîditin pêk dianîn. Bûyera herî girîng a qonaxa vebûnê ya destpêkê, hevdîtina Erdogan a bi rêvebirên DTP'ê re bû. Ev gava hikumetê avêt ku demeke dirêj DTP vêder kiribû weke peyameke dilxwaziya diyalogê hate fahmkirin. Di vê qonaxê de digel ku ji derdorên nijadperest û neteweperest reaksiyonên tûnd jî dihatin, hikumetê hewl dida ku nîşan bide ku ew berdewamiya vebûnê de bi biryar e. Lê belê her ku reaksiyon tîr dibûn di nava hikumetê de jî "diyardeyên şewazguherînê" zêde dibûn. Her ku çû, "zimanê ewlekariyê" ku pirsgirêka kurdî di nava çarçoveya "tekoşîna li dijî terorê" de asê dikir, kete nava nava axaftinên berdevkên hikûmetê jî.

▶ R. 2

Vê rewşê kir ku li derdorên PKK'yê gumanên peyda bibe ku armanca vebûnê tasfîyekirina wan ya bi awayekî fîzîkî û sîyasî ye. Ev guman, ji serî de bi van derdoran re hebû û wan ev tim ji bo ku mirov zû bi zû baweriya xwe bi vebûnê neyne weke sedem bi kar dianî.

A rast, herkesî zanîbû ku qedera vebûnê dê bi nêzîktedayina li hember faktora PKK'yê ve girêdayî bûya. Yanî kilîta vebûnê di nava "pirsgirêka şîddetê" de bû. Dîtina vî tiştî ewqasî ne dijwar bû; heya kilîta ku dawiyê li vê şîddetê bîne neyê dîtin wê ew qufl girtî bimaya.

Hikumetê serê ewilî weha tev gerriya ku mirov digot qey di pirsgirêka bidawîkirina şiddetê de berê xwe dide rêya "beçekkirinê". Ji bo vê rêbaza ku li gora wê rêxistina çekdar dê tev li pevajoyê bibûya û bihataya qanekirin ku dev ji çekan berdaya jî, ji aliyê hikûmetê ve, jê re amadekariyeke baş lazim bû. Di demeke kin de hat fahmkirin ku di vê meseleyê de bernameyeke hikûmetê ya zelal û projeyeke wê ya ku li ser hatiye xebitîn tuneye. Vê kêmaniyê kir ku hikumet nikaribe sînga xwe bide ber reaksiyonên nijadperest/ neteweperestan yên li dijî "vebûnê". Welhasil, piştî ku komên ji Qendîl û Maxmûrê derbasî Turkiyeyê bûn û pêşwazîkirina wan bi awayekî girseyî û di lewnê şahiyê de hate lidarxistin û van derdoran bertekeke tûnd û berfireh li dar xist, hikumetê jî biryara xwe ya „polîtîkaya ewlekariyê" da.

Bingehê vê polîtîkayê ew bû ku, bi rêya dîplomasiyê ve dorê li PKK'yê teng bike û bi rêya operasyonên leşkerî ve jî wê mecbûrî radestkirinê bike. Bi vê hêla xwe ve, tu cudahiya wê ji polîtikayên ku dewlet ji serê 25 salan û vir ve dimeşîne tune bû. Ev polîtîkaya ku çendîn caran hatiye ceribandin û îflas kiriye, vê carê dê li gel "vebûna demokratîk" bihataya meşandin. Yanî, "vebûn", dê ji bo ku ev polîtîka bi awayekî rehettir bi rê ve biçûya bihataya bikaranîn.

Lê belê, tecrûbeyên van bîst û pênc salên ku pirsgirêka kurd û pirsgirêka PKK'yê êdî bûne yek têra xwe têra xwe eşkere kiriye ku ji bilî çareseriyeke li ser qanekirina rêxistinê, pêkanîna daxistina ji çiyê gengaz e û encamên rê û rêbazên wekî din jî dê gellekî giran bin. Serkevtina vê rêbaza ku em dikarin wekî "bêçekkirina bi rêya siyasîbûnê" bi nav bikin, bi xurtkirina çerxa demokratîk û azadkirina qada siyasî ve girêdayî ye. Bi vî awayî, bingehê wê tê danîn ku rêxistina çekdar bi rêya "bi riya siyasetê ve tasfiye" bibe. Ji ber wê, divê di serî de di mijarên mîna guhertina qanûna partiyên siyasî, bipêşxistina azadiya rêxistinbûyîn û azadiya ramanî de ku bi salan e di rojeva Turkiyeyê de ne û di pêvajoya şewrên bi YE'yê re de jî babetên sereke ne, gavine xurt bihatana avêtin. Lê hikûmetê xwe neda ber. Weke mînak, him reformên dadî ku nehiştaya DTP bihataya girtin nexistin rojeva xwe û him jî bi ser de helwêsteke weha nîşan da ku girtina DTP'yê teşwîq dikir. Girtina DTP'yê û xistina parlementeriya serokê giştî Ahmet Turk û hevseroka berê Aysel Tugluk derbeke giran li siyaseta demokratîk xist. Bûyereke din ku bû sedem ku hikumet rasterast bibe berpirsiyara tengbûyina qada siyasî jî operasyonên KCK'yê bû. Ev operasyonên ku siyasetmedarên kurd tê de hatibûn binçavkirin û polîsan wêneyên wan yên di rewşa "dîlgirtinê" de kişandibûn û belav kiribûn jî bûn sedem ku li van derdoran û bi giştî jî di nava raya Kurdan de hêrseke mezin peyda bibe.

Piştî van rûdanên ku dan xuyakirin ku hikumetê hemû giraniya xwe daye ser hilbijarteka "ewlekariyê û dîplomasiyê", di nava derdorên PKK'yê de fikra ku mebesta AKP'ê bi "tasfîyekirina bi darê zorê" ye xurttir kir. Ocalan û PKK'yê di hêr kêlîkê bi lêv kiriye ku ew ê bi awayekî tûnd li dijî "planên tasfîyekirinê" derkevin. Ji van daxuyaniyan mirov dikare derxîne û bibêje ku hêviyên Ocalan û PKK'yê li dora van herdu xalan diçin û tên: ji bo Ocalan "warekî rehet" û "ciyekî rêzdar" ; ji bo PKK'yê jî sîyasîbûyin.

Her ku Ocalanî dît hikûmet guh nade van hêviyan, wî jî zimanê xwe li hember AKP'yê tûjtir kir. Ocalanî AKP li hember çareseriyê weke astenga herî mezin dît û ew "dijminê sereke" îlan kir. Êdî, ji hêzxistin/qelskirina AKP'yê û asêkirina hikumetê, bû armanca Ocalan û PKK'yê ya herî girîng. PKK'yê nîşan da ku her ku ew bitengije, ew ê hikûmetê jî bi xwe re têxe nava agirî; ji ber vê, bi çalakiyên kolanan û bi êrîşa Reşadiyeyê ve dabû xuyakirin ku, sazkirina atmosfera "şerrê navxweyî" jî di nav de, ew dikare serî li her rêyê bide. Daxuyaniyên berdevkên PKK'yê yên ku digot ku ew ê çalakiyan ber bi bajarên mezin ve bibin û stratejiya "şerrekî nîvgiran bimeşînin" vê yekê piştrast dike. Girtinên ser Qereqolan ku vê dawiyê pêk hatin, êrîşên Îskenderûn û Stembolê didin xuyakirin ku êdî ev stratejî li dar e.

Weha dixuye ku ev stratejiya PKK'yê dê ji hêla encaman ve, û bi awayekî ji mecbûrî, guherîneke têxe nava polîtîkayên wê. Ocalan û PKK, ji 1999'an û vir ve tim û daîm dibêjin ku wan dev ji doza "welatekî serbixwe" berdaye û êdî ne alîgirên veqetandinê ne. Di hevdîtina bi parêzerên xwe re ya di 18'ê hezîranê de Ocalanî ev bi van peyvan dubare kir: "Tiştê em dixwazin ne veqetandin e, me gellek caran ev got, em aliyê bihevrebûyineke azad, wekhev û dilxwaz" in. Lê ev çalakî, şertên "bihevrejiyînê" tahrîp dikin. Wekî din jî, di zemîneke weha de ku ev 25 sal in ku vî şerrî bi du hêlan re jî hestên girr û hêrsê ji hev re dane ser hev, derketina "şerrê navxweyî" ne îhtîmaleke zêde dûr e. Weke ku Enzensberg di pirtûka bi navê "Dîmenên Şerrê Navxweyî" de jî dibêje: "Şerrê navxweyî, (…) her dem ji aliyê kêmarekê ve tê destpêkirin; ji sed kesan yek jî wê bixwaze, ev dikare têrê bike ku êdî jiyana bi hev re ya bi awayekî medenî ne gengaz bibe."

Ji hêla din ve, her ku şerr bidome, tasfîyekirina hêza artêşê a di nava pergala sîyasal de û dezgehên mîna Ergenekonê dijwartir dibe. Ji ber vê, AKP ji dêleva rêbazên "bêçekkirine"ê ku dê şiddetê bi dawî bike, berê xwe bide "polîtîkaya ewlekariyê" ku ji bilî gurkirina asta şiddetê pê ve bi kêrî tiştekî nayê, ew ê hebûna xwe jî têxe xetereyê.

Em ji bîr nekin ku "zemîna hevbeş a hêmû şerrên navxweyî ew e ku cudahiya di nava xerakirin û xwexerakirinê de ji holê rabe". Serkevtiyên şerrê navxweyî tunene; heta "serkevtina Pirus" jî ne gengaz e. Digel ku li Turkiyeyê şerrê navxweyî ne qeder e jî, vekirina rêya li ber aşitiyê jî ne bi qasî ku tê gotin dijwar e. Ji bo vê, pêdivî hinekî bi dilsoziyê, hinekî bi wêrekiyê û hinekî jî bi şiyanê ve heye.

* Profesorê hiquqê li Universîteya Enqerê

Wergera ji turkî:
Kejo Bajar

# EDÎTORYAL

**Xwendevanên hêja**,
Piştî du mehên bêdengiyê, ***Le Monde Diplomatique Kurdî*** bi organîzasyoneke nû û gellek nûbûnên di naverok û şiklê xwe de ji nû ve derdikeve. Van guherînên pêwîst em mecbûrî navbirekê kiribûn.

Nûbûna yekem ku dê her bi vê hejmarê bala we bikişîne, çapa rojnameyê ye. Herweha, bi armanca ku em weşaneke têrtije û xurt pêşniyarî we bikin, me di hilbijartin û bicihkirina nivîsan de jî hin guherîn pêk anîne.

Ji bo ku em bikarin naveroka rojnameyê jî xurttir bikin û asta weşana wê bilindtir bikin, me ekîba xwe ya rojnameyê jî xurttir kir. Di nava nivîskarên me de, di nava lijneya me ya weşanê de û herweha di nava wergerên me de, hûn ê ji hejmara bê û bi şûn ve gellek nûbûnan bibînin.

Rojnameya me dê di warê zimanî de çavê kul derman bike. Ji ber ku em di wê baweriyê de ne ku ***Le Monde Diplomatique Kurdî***, ji ber dîroka zimanê xwe yê ku tê de bi kar tîne û pê diweşe, xwedan mîsyoneke girantir e û divê li gora vê berpirsiyariyê tev bigerre. Zimanê ku di hemû wersiyonên *Le Monde Diplomatique*'ê yên din de tê bikaranîn, zimanekî bilind e, û bi zimanên din jî xwendevanên wê bêtir kesên xwende an jî rewşenbîr û siyasetmedar in. Ji ber wê, xema wersiyonên din û ya wersiyona kurdî bivê nevê ji hev cuda dibe. Hejmara xwendevanên me yên ku bi zimanê xwe perwerde bûne pirr kêm e, lê îroj em dibînin ku nifşekî din radibe û kurdiyê di hemû qadên hunerî, rewşenbîrî, siyasî û civakî de bi kar tîne û li astengan nasekine, digel ku hin daxwazên wî jî hene. Ji ber wê, em di wê baweriyê de ne ku weşanên mîna ***Le Monde Diplomatique Kurdî***, dê di warê avakirina hişmendiyeke nû û zimanekî bilind de xizmeteke mezin bikin û bersiva daxwazên dema me yên zimanî û rewşenbîrî bidin.

Hewla me ya bilindkirin û paqijkirina asta zimanî dê her dewam bike. Armanca me ji vê hewlê ew e ku em, bi alîkarî û piştgiriya pisporên zimanî ve, vê kurmanciya ku bi awayekî civakî û çandî ji eslê xwe hatiye bidûrxistin, hatiye kêmkirin, qelskirin û bişaftin, bi weşana vê rojnameyê û nivîsên nava wê ve bigihînin asta ku heq dike û xebatên me yên di vî warî de hê jî didomin. Ji ber wê, weke IKGM, em hewl didin ku lijneyeke pisporên zimanî ava bikin û ne bi tenê di ***Le Monde Diplomatique Kurdî*** de, lê herweha di hemû bernameyên xwe yên weşanî yên din de, di bin çavdêrî û alîkariya vê lijneyê de bixebitin û li gora pêşniyarên wê weşanên xwe bikin yek ji bingehên kurmanciyê ku siberojê jî bikare bi kêrî zimanê me were. Me bi vê mebestê hin hevalên xwe yên nû tev li rojnameyê kirine ku hûn ê xebatên wan di vê rojnameyê de bibînin.

Ji hejmara îlonê û bi şûn de, em ê rûpeleke vegera nava dîrokê jî pêşkeşî xwendevanên xwe bikin û bi navê «*Ji arşîva Le Monde Diplomatique'ê*» hin nivîsên ku ji salên 1960'î û vir ve li ser Kurdan û Kurdistanê û mijarên bi wan ve têkildar hatine weşandin di nava rojnameya xwe de bi cih bikin, da ku em bibînin ka gelo di salên 60'î, 70'î, 80'î û 90'î de, bi çavê *Le Monde diplomatique*'ê dem bi dem niherîna li Kurdan û welatê wan çawa û li gora çi guheriye. Bi vî awayî, em dixwazin xizmeta arşîva Kurdan jî bikin.

Rojnameya me dê herweha hewl bide ku alîkariya xwendina kurdî jî bike û ji ber wê, ew ê cih bide weşanên nû û pirtûk û kovarên ku bi kurdî hatine çapkirin û wan bide nasandin.

Ji bilî van nûbûnan, beşekî me yê din jî dê hebe ku tê de em ê cih bidin daxwaz û rexneyên xwendevanan. Hûn jî dikarin fikr û ramanên xwe rave bikin û bi nivîsên ku di rojnameyê de hatine çapkirin re nîqaşê bikin an jî fikrên xwe li ser wan û li ser rojnameyê bibêjin. Pîvana me ast e û ziman e. Rûpelên *Le Monde Diplomatique*'ê ji herkesî re vekirî ne…

Lijneya IKMG'ê ya weşanê

**Le Monde Diplomatique kurdi**
Ji aliyê Independent Kurdish Media Group GmbH ve tê weşandin

**INDEPENDENT KURDISH MEDIA GROUP GMBH**
Konrad-Adenauer-Ufer 39
50668 Köln / Almanya

**Desteya birêvebiriyê**
Murat Satık
Rıza Dinç

**Le Monde Diplomatique kurdî**

**Redaksiyona Zimanî**
Îbrahîm Seydo Aydogan

**Alîkarên vê hejmarê**
Semra Polat
Sharo Îbrahîm Garip

**Berpirsê hunerî**
Hasan Hüseyin Deveci

**Designer**
Fabio Biasio

info@lemonde-kurdi.com
www.lemonde-kurdi.com

**Webdesigner**
Erhan Yekta

**ABONETÎ**
Independent Kurdish Media Group GmbH

Postbank
Konto: 371219609
BLZ: 500 100 60
iBan: de84 5001 0060 0 3712196 09
BiC: PBNKDEFF

**Abonetiya Salane:**
Almanya: 50 €
Derveyî Almanyayê: 60 €
Abonetiya dîjîtal: 20 €

**Le Monde Diplomatique**

**Damezrîner**
Hubert Beuve-Méry

**Birêvebirê giştî**
Serge Halimi

**Sernivîskar**
Maurice Lemoine

**Cîgirên Sernivîskarî**
Martine Bulardi
Philippe Rivière
Anne-Cécile Robert

**Redaksiyon**
Alain Gresh
Mona Chollet
Pierre Rimbert
Dominique Vidal

**Birêvebirê hunerî**
Alice Barzilay

**Dokumantasyon**
Olivier Pironet

**Sekreter**
Sophie Durand
Monique Salomé

Tel: 00 33 (0) 153 94 96 01
Fax: 00 33 (0) 153 94 96 26

1-3, rue Stephen-Pichon,
F-75013, Paris, France

## MÊTINGEHKARÎ, FANON Û BEŞÎKÇÎ

# "Rûyên Reş û Maskeyên Spî"

SHARO ÎBRAHÎM GARÎP

Modernîzm weke teorî li hember Teoriya Emperyalîzmê derketiye. Galtung têkiliya emperyal weke bikaranîna hêzê ya ji bo têkiliyên newekhev têdigihê ku neteweya navendî li ser neteweya li kêlekê bi kar tîne. Modernîzm têkiliyên ser-bin û derdor-navend'ê weke pirsgirêkên binyadî yên nava pergalê dibîne ku li gora wê, pergal bi xwe dikare heq ji wan derkeve. Li Tirkiyeyê teorîsyenên ku meyla wan li ser rastgiriyê ye xwe baş li teoriya Modernîzmê girtine, fikra çepgir jî her li derve li Emperyalîzmê gerriyaye, nexasim Antî-Amerîkanî weke Antî-Emperyalîzm fêm kiriye. Lê, beşeke pirr mezin a rewşenbîrên tirk naxwazin têkiliyên emperyal ên di navbera Turkiyeya ku li ser kavilên împeratoriyekê ava bûye û mêtingeha wê ya dawîn bibînin. Hinekî zehmet e ku mirov bibêje ku helwesta pirraniya rewşenbîrên kurd ji ya rewşenbîrên turk cuda ye. Heta ku têkiliyên di navbera du gelan de li ser hêmana wekheviyê ava nebin, tu tişt nikare welatekî ji emperyalîzmê xelas bike. Sosyolog Dr. Îsmaîl Beşîkçî (ne bi tenê maskeya zilamê spî, maskeya zilamê reş jî derdixe û mêtingehkariyê li darî çavan eşkere dike.) Ha ji ber vê yekê rêbaza civaknasiyê ya Beşîkçî hêjayî lêkolînê ye.



Îsmaîl Beşîkcî

**Rêbaza Beşîkçî:**

Beşîkçî rêbaza danberhevê ya ku him di zanînên fennî de him jî di zanînên civakî de bi pirranî lê diqesidin, weke metoda bingehîn bi kar tîne. Beşîkçî di peyta honakên di serê xwe de li diyardeyan nagerre, berovajiyê wê, hewl dide ku ji diyardeyan ji xwe re rastiyan peyda bike. Lêkolîna wî ya *Pergala Anadola Rojhilatê û Eşîreta Xalîkan a koçber* ji bo vê yekê mînakeke baş e. Gava ku di gerra Kurdistanê de li diyardeyên cuda rast tê, berê xwe dide lêgerîn û analîza rasteqîniyeke civakî. Jêderka daneyan civak bi xwe ye û bi rûqetên vertîkal û horîzantal ên ku ji jiyana civakî bi xwe hatine stendin him tebeqeyên dîrokî di nav periyodên demê de dide ber hev û him jî bi rêya rûqeta horîzantal kirûyên di wekhevî/newekhevî'yê de dide ber hev.

Di zanînên civakî de bi gelemperî du rêbaz tên bikaranîn: an gelek kirû heta ji dest tê bi hindik guherbaran re, an jî pirr hindik kirû bi guherbarên ku heta ji dest tê zêde re tên nirxandin û li têkiliya sedem-encam'ê tê kolîn. Beşîkçî ji ber xebata xwe ya meydanî bi pirranî rêbaza duyem bi kar tîne. Ji bo ku ji encaman bawer be di hevkêşeyên xwe de, bi guherbarên ku dê bên vegotin û neyên vegotin re her dem guherbara kontrolê jî bi kar tîne. Ev guherbara kontrolê bi pirranî dijberê bûyerekê ye. Di pirsên ku li dadgehan ji hakiman dike de ev rêbaz veşartî ye. Cîhê guherbarên di hevkêşeyên xwe de diguhere û ji hakiman re dibêje: "Em bibêjin ku welatekî bi navê X'ê Turkiye dagir kir û turkî qedexe kir..." Pirsên ku weha dest pê dikin çongên lijneya dadgehê sist dikin.

Beşîkçî ji dijberiya her tiştî dide rêyê û hewl dide ku rêya xwe bibîne; li cîhê ku dijberiya cîwarî û maddî tune be hewl dide ku bi dijberiya rawêjî bi ser rasteqînê ve be. Ev, rêbaza herî bibandor a diyalektîk e ku Kant bi kar tîne. Digel ku carinan bi giştî rêbaza deduksiyonê bi kar tîne jî giraniya xwe dide ser rêbaza îstîqrayê (enduksiyon). Têkiliyên sedem-encam'ê yên ku ji hemû daneyên xebata meydanî bi dest dixîne, axir dide ber normên mantiqî an jî gerdûnî. Ango, Beşîkçî ne weke ku tê îddîa kirin pozîtîvîstekî mekanîk e. Têkîliya moral û zanistê ya jîndar di civaknasiya wî de berbiçav e. Rêgeza ku weke bingeha mafên mirovan a gerdûnî tê hesibandin: "*tu çawa dixwazî kesên din li hember te tevbigerin, li hember kesên din wisa tevbigere*" rêbaza wî ya pirsiyariyê ye. Di vî warî de jî nêzîkî rêbaza "Kategorischer Imperativ"a Kant e. Kirûyên ku Beşîkçî weke kahînekî haya me jê çêkir îroj xwe bi xwe dipeyitînin. Beşîkçî teza "*Dadgeh, zanîngeh û partiyên Turkan xizmetê ji etnîsîteya Turkan re dikin û ji bo înkara Kurdan dixebitin.*" diparêze. Weke mînak; biryarên Dadgeha Zagona Bingehîn û Dadgeha Bilind ve, di derxistina tezkereyê de lihevkirina CHP, MHP û AKP'yê an jî meşa Turkan Saylan û hevalên wê û gotinên Mumtaz Soysal û gelek mînakên ku nikarin li vê derê bên rêzkirin, dikin ku Beşîkçî teza xwe bipeyitîne. Li Turkiyeya ku xwedî çandeke tahmsarkî ya zanîn û rewşenbîran e Beşîkçî di testkirina helwêsta zanistî û entellektuelî de Pirsgirêka Kurdan weke guherbarê kontrolê bi kar tîne, ango bi gotina wî "Kaxiza Turnosolê" ye. Ev rêbaz nîşan dide ku Beşîkçî laboratûwarên xwe herî hindik bi qasî laboratûwarên zanînên fennî qenc bi kar tîne.

**Entellektuelê Organîk û Estetîka Wî**

Di pênasa rewşenbîran de Gramscî behsa du kategoriyan dike; rewşenbîrên kevneşopîk û yên jîndar. Beşîkçî gellekî nêzî katagoriya duyem e. Weke ku li jorê hatiye diyarkirin, Beşîkçî çawa hesabê têkiliya "Zanîn û Axlaq"ê kiribe, xwe nade ber lihevkirinê, bi qasî ku dev ji Serokatiya Beşa Zanîngehê berde û hucreyeke girtîgehê ji xwe re bike kursî bi ramanên xwe re dilsoz e. Ewqasî dilsoz e ku roja ku tê berdan ramanên xwe li ber deriyê girtîgehê weke mêran dibêje. Li devera ku nivîskarên bi nav û deng û entellektuel xelatên dewletê distînin, ew bi awayekî sîstematîk xelatan red dike û di binê vê redkirina wî de nirxên wî yên rewşenbîriyê hene. Korîdorên fetisokî yên zanîngeh/perestgehên tije bustên Ataturk, sempozyûm û zimanê ku bi tenê entellektuel di nav xwe de bi kar tînin dûrî wî ne.

Zimanê wî yê civaknasiyê pirr xwerû ye. Şivanê serê çiyê, gundî, karker an jî girtiyên girtîgehan û xwendekarên zanîngehê jî dikarin bi hêsanî ji ramanê wî fahm bikin. Beşîkçî li cem xwe biînsîcam e û deriyê wî ji hemû rexneyan re vekirî ye. Dikare rexneyên herî giran li kesên ku xwedî li wî derdikevin jî bike. Berî her tiştî ji xêliya spî û tenik a ku bi rûyê rewşenbîrên kurd ve zeliqiye gellekî aciz dibe. Bê sekin û hedin sedema ku rewşenbîrên kurd bi zimanê kurdî nanivîsin û digel ku ew bi xwe bi kurdî diaxivin kelecahda wan a turkiyeke baştir hînî zarokên xwe bikin li nav çavên wan dixe.

Beşîkçî vê rewşê bi tespîtên Fanon xurttir dike. Fanon weke bijîşk û psîkologekî gelekî baş çavdêriya psîkolojiya bindestan dike. Tespîta Fanon ev e: "Dema baweriya koleyan bi wan nemîne, tiştekî wan namîne". Gotina Fanon a "lanêtiyên ser rûyê erdê" belkî herî zêde li Kurdan dike. Beşîkçî vê tespîta Fanon ji bo Kurdan weha şîrove dike. "Statuya Kurdan hê ne statuya koleyan e jî". Ji ber vê yekê, Kurdan lêpirsîn/nîqaş û bixwebaweriya xwe wenda kiriye. Vê yekê, bi nefspiçûkî û bi estetîkeke qedîfeyî û di helwesteke sergevez de dikin ku tînê dide kenê wan. Çawa aciz nabe ku bi bindestan re heman renzayê par ve bike, heke hucreya wî ya girtîgehê mişt kolera bibe jî hûn ê nebihîsin ku gazinan dike.

Li welatê wî kes li vî zanyarî bi xwedî dernakeve. Ji bo rastgir an çepgiran, ji ber ku wî nirxên "pîroz" deşîfre kirine, weke lanetiyekî ye. Lê di zimanê bindestan de gotinên Beşîkçî pîroz in. Girtîgeh, çiya û şantiye bi kenekî wî re weke roniyekê dixuyin. Axir, çinara Kurdan Apê Mûsa pêşniyar kiribû ku bustekî Beşîkçî li Amedê bê çêkirin. Zanyarekî ewqasî dildarê rastiyê, dev ji Turkiyeyê berdin, li cîhanê jî zû bi zû peyda nabe. Lê mixabin cîhana zanînê ya li derveyî Turkiyeyê jî têra xwe lê bi xwedî derneketiye. Ez bawer im ku ev jî ji ber wê ye ku ew civaknasiya lanetiyên ku hê ne di statûya koleyan de ne, dike. Lê ew, bi bêhna xwe ya fireh a pêxemberî, şovalyeyê cîhana zanînê yê natebite ye û welatê xwe yê ku bûye goristana rewşenbîran naterikîne.

Em ji zanyarên kevneşop dibihîsin ku Beşîkçî xwe tim dubare dike. Belê, rast e. Beşîkçî ne bi tenê zanyar e. Haya wî ji berpirsiyariyên wî yên civakî heye û ji ber ku ne "rewşenbîrê dewletê" ye, ew rewşenbîrekî weha ye ku hewl dide ku birîneke weha ku çareserî jê re nehatiye dîtin û xwîn dibe bi rêbazên zanistî vebêje. Rewşenbîrekî jîndar e, ji ber ku xwe li derveyî bûyerên civakî nahesibîne. Axir, Fanon jî weke bijîşkekî fransî çûbû Şerrê Cezayirê û li hember dîmena ku çav lê ketibû, alî guhertibû. Ango, bi tenê weke pisporekî nebûbû bînerê bûyeran. Sartre'ê fîlozof digel ku weke Fanon nedifikirî jî, bûye spasdarê tespîtên wî yên di derbarê mêtingehkariyê de. Ji bo ku em Beşîkçî ango "Fanonê Tirkan" fahm bikin, hewce ye ku em li hêviya Sartre'ê Turkan nemînin.

Wergera ji turkî:
Kejo Bajar

### Çavkanî:

Franz Fanon
*Die Verdammten dieser Erde*
Frankfurt 1981

Dymek, A
*„Kants hypothetische und kategorische Imperative"*, 2008

Immanuel Kant
*Kritik der reinen Vernunft*, 1788

Johan Galtung
*Imperialismus und strukturelle Gewalt*, Frankfurt 1972

Antonio Gramsci
*Zu Politik, Geschichte und Kultur*
Leipzig 1980

Ismail Besikçi
*Devletlerarasi Sömürge*, Kurdistan, 1990

Ismail Besikci
*Bilim Yöntemi*, Istanbul 1976

Ismail Besikci
*Dogu Anadolu`nun Düzeni, Sosyo-Ekonomik ve Etnik Temelleri*
Istanbul 1969

# Îran û Rûsya, di navbera hevkarî û xirecirê de

JACQUES LÉVESQUE*

Biryara Lijneya Ewlekariyê ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî (RNY) ya ku pêşbîniya mueyîdeyên nû li dijî Îranê dike, bi dengên 12 ji 15 endamên Lijneya Ewlekariyê ve di 9'ê hezîranê de hate qebûlkirin. Tirkiye û Brezîlyayê li dijî vê biryarê dengên xwe dan. Tevî ku herkesî texmîn dikir ku dê bandoreke berbiçav a vê biryarê nebe jî, ew rêya mueyîdeyên dualî yên ku YE û DYA dixwazin pêk bînin vedike. Ev dengdan di heman demê de dibe sedema têkçûyina baweriya di navbera Tehran û Moskovayê de.

Tevlîheviyek di têkiliyên Rûs û Îraniyan de heye. Piştî ku Amerîkiyan bernameya mueyîdeyan anî Lijneya Ewlekariyê, Mahmûd Ahmedînecad vê tesbîtê dike: "Gelê me êdî nizane ka Rûs dostên me ne yan na." Lê, balyozê kevn yê Dewletên Yekbûyî yê li Rêxistina Neteweyên Yekbûyî (RNY), John Bolton, dibêje ku li gorî texmîna wî piştî ku Barack Obama di meseleya mertalê li dijî fuzeyan de li Polonya û Komara Çekî "stuyê xwe xwar kir" û li hemberî dagîrkirina beşeke axa Gurcistanê ya ji aliyê Rûsan ve bêdeng ma, îcar di derbarê dosyaya Îranê de jî dê nikaribe ji serokê berê George W. Bushê berî xwe tiştekî zêdetir ji Moskovayê bi dest bixe.

Lê belê, du azmûnên girîng divê hîn vekirîtir diyar bikin ka têkiliyên navbera Rûsya û Îranê ber bi ku ve diçin. Pêşî, vekirina santrala nukler a Bûşehrê, li başûrê rojavayê Îranê, gellek caran helwesta Moskovayê guherand ku tesîrê li Tehranê bike da ku ew jî Ajansa Navneteweyî ya Enerjiya Nukleer (AIEN) memnûn bike. Wezîrê karê derve yê Rûsyayê Sergei Lavrov bi rastî jî li Moskovayê, 18'ê adara bihurî, diyar kir ku ev santral dê havînê bikeve fealiyetê; Wezîra karê derve ya Amerîkayê Hillary Clinton'a ku wê gavê amade bû, xwe aciz kir.

Tecrûbeya duyem: dayin – an nedayina – fuzeyên parastina hewayî S-300'ên kurtavêj e ku Îranê kirrîne; peymaneke heyşt sed milyon dolarî ye ku di çileya pêşîn a 2007'an de û di navbera herdu aliyan de hatibû îmzekirin. Şandina van fuzeyan ji havînî ve li ser israra Washingtonê hatiye texîrkirin. Hebûna van fuzeyan di destê Tehranê de, dê bombardimaneke Îsrailiyan ya muhtemel jî dijwartir û hîn buhatir bike; lê belê, digel ku di çekên din de ne weha ye, bi saya israra Rûsyayê ve ev çek nakevin ber mueyîdeyan. Dîsa jî, karbidestên Wezareta karê derve ya Amerîkayê di wê baweriyê de ne ku "sozên ku hatiye dayin dê bên girtin [1]" û ew fuze dê neyên şandin. Ew ê wek wan bibe gelo?

Berî pêşkêşkirina rapora mueyîdeyan, me li Tehranê ji devê piraniya mixatabên xwe ve şika li hemberî Moskovayê dibihîst. Heta ev helwest li bal hinan li gel kêmîxwedîtineke kevn a Rûsan diyar dibû, ji ber ku hestê xwemezindîtineke ku ji şaristaniya kevnar a farisan tê hîn jî li cem wan heye. Pisporekî karên Rûsyayê ku ji alî Dewletê ve weke berpirsiyarê avakirina civateke hevalbendên Rûsya û Îranê hatibû tayinkirin li têkçûyina xwe mikur hat; li gora wî, sedema wê ew e ku di nava rewşenbîran de jî û di nava xelkê de jî, kes ji binî ve guh nade Rûsyayê. Ev lêkolîner hevalbendiya îroj ya di navbera Îran û Rûsyayê de bi rêya dijminahiya Dewletên Yekbûyî û hevalbendên wê yên li dijî Komara îslamî ve dinirxîne û dibêje: *"Çi di warê aborî û teknolojiyê, çi jî di yê çandî de be, em ê çi ji vî welatî hîn bibin? Gava ku hûn çend kilometreyan derkevin derveyî Moskovayê, hûn ê bibînin ku cîhana-sêyem li wira ye, lê ne li vira ye. Bi welatên Ewropayê re hîn bêtir hêlên me yên hevbeş hene."* Hinekên din jî ji xwe re dibêjin *"em baş dizanin ku Îran di lîstika Moskovayê ya siyasî ya li gel Washingtonê de ji kaxezekê pê ve ne tiştekî din e"*, û baweriya wan pê heye ku aligirên têkiliyeke xurt ya bi Kremlînê re di nava civata herî bilind a desthilata îranî de jî hindikayî ne.




BIASIO 2010

Cîgirekî Wezîrê karê derve yê kevn bêtir bi tolerans dibêje: *"Em tê digihên ku [Rûsya] divê bi Dewletên Yekbûyî re têkiliyên baş girê bide û divê em tim li cem xwe encaman ji wan derxin û binirxînin."* Ew niyeta Îraniyan a ku dixwaze di nava Rêxistina Şangayê ya Hevkariyê (RŞH [2]) de ji asta çavdêriyê derbasî ya endameke daîmî bibe, helbet, ji aliyê Rûsya û Çînê ve hate redkirin, ji bo ku Washington xwe aciz neke, lê *"di eslê xwe de, li hember Îranê weke ku endameke bi temamî cihê be hat tevgerrîn û Îran beşdarî hemû hevdîtinên Rêxistinê yên navxweyî bû"* – Ahmedînecad, tevî vê jî, nerazîbûna xwe ya ji zîrweya ku di 10-11'yê hezîrana 2010'an li Taşkentê (Kazakistan) çêbûbû diyar kir, da ku dengdana Rûsya û Çînê ya Lijneya Ewlekariyê protesto bike. Digel vê jî, wezîrê kevn asta hevkariya di navbera Moskova û Tehranê de ya li Asya navîn a piştî hilweşîna Sovyetê û Transkafkasyaya kevn destnîşan dike û dibêje ku ew ji paşerojê bi hêvî ye:

***"Bi xurtbûna bandora Îranê ya li Rojhilata nêzîk, Rûsya dê bêtir qiymetê me zanibe û rêza me hîn bêtir bigire. Ew ê baştir bibîne ku bandora me dê li dijî berjewendiyên Dewletên Yekbûyî be, lê ne li dijî yê wê be."***

Li Moskovayê, înada Tehranê ya di derbarê dosyaya nukleer de di heman demê de him dibe sedema nerazîbûnê û him jî ya tirsê. Hinek lêkolîner Îranê weke belayeke ku divê mirov jê bi dûr bikeve dibînin û -bêyî ku pê bawer bin- mueyîdeyên giran li dijî wê pêşniyar dikin. Yên mayî, ku pirrtir in, bêyî ku sempatiyeke wan ya ji bo Komara îslamî hebe, berevajiya wê, ji beşdariya Rûsyayê ya di berfirehkirina tevdîrên cezayî yên nû de ditirsin.

Weke Fedor Lukyanov'ê sernivîskarê kovara navneteweyî *Russia in Global Affairs*, dibêje ku ew ditirsin ku "ji mueyîdeyên bêbandor heta bi yên ku dê negihên encamên xwestî, Rûsya xwe di nava pêvajoyeke weha de asê kiriye ku ber bi meşrûkirina bikaranîna hêzeke leşkerî ve diçe." Helwêsta wan çi dibe bila bibe, hemû birêvebirên siyasî û analîst ditirsin ku li wan herêmên cîhana misilman ku cîranên Rûsya ne encamên karesatî ku ji rêyeke weha derkevin û bandora wê bigihije nava axa Rûsyayê jî. Ji aliyê din ve karbidestên rûs, digel ku ji hevkarên xwe yên îranî dixwazin ku ew rêza biryarên AIEN'ê bigirin, ji Îranê re dibêjin ku qebûlkirina mueyîdeyan li gora wan rêyeke weha ye dikare rêyê li ber darê zorê bigire.

Ji nîsana 2010'an û bi vir ve, him li Moskovayê û him li Washingtonê herkes dizane ku weke Clinton ji serî de jî hêvî kiribû ev mueyîde dê kesî "felc" nekin: Çînê – piştî ku beşdariya hevdîtinan li gel endamên din yên Lijneya Ewlekariyê yên daîmî red kir, axir biryara xwe guhert û tev lê bû– bi vê helwêsta xwê ya navberkar ve piştgiriya Rûsyayê kir.

Alexandre Choumiline'ê ku birêvebirê navendeke lêkolînên li ser Rojhilata-nêzîk li Akademiya zanyariyan a Moskovayê ye, bi awayekî pirr vekirî diyar kir ku ji nuha ve xuya ye ku mueyîdeyên ku dixwazin Îranê bînin ser rêyê, *"herî dereng dê di dawiya çiriya pêşîn de bibe sedema bombardimanên israîlîyan yên bi ser dezgehên Îranê yên nukler de, û Obama jî dê ji bo rê li ber wan bigire nema bikare tiştekî bike"*. Ew jî weke analîstên rûs yên din teyid dike ku ji bo dosyaya Îranê *"yek ji wan dosyayan e Pûtîn bi xwe li ser dixebite"* û *"ew bi xwe hemû biryaran li ser dide"*. Wî destnîşan kir ku meha çûyî, serokkomar Dimitri Medvedev eşkere diyar kir ku êdî ji mueyîdeyan pê ve rêyeke din nemaye, lê serokwezîr Pûtîn carekê bi tenê û bi awayekî ku kes jê tênegihê ka çi dibêje bahsa vê yekê kiriye.



SERHAD BAPIR, *Operasyonên Enfal*, Grafîka li ser bleksîglass û dar

Bi rastî jî, Pûtîn dixwaze ku têkiliyên wan yên bi Dewletên Yekbûyî re baştir bibin û naxwaze di vî warî de berdeleke ewçend mezin jî bide. Ji bo wî, heger Washington ji niha û pê ve rêza berjewendiyên Rûsan di çarçoveya bandora sovyeta kevn de bigire, ev yek ne girêdayî daxwaza ji dil a birêvebiriya Obama ye, lê bi saya têkoşîna dijwar a bi salan ku Rûsyayê daye û bi taybetî jî sedem ew e ku rê li ber girtiye ku Ukrayna û Gurcistan jî bikevin nava Rêxistina peymana Atlantîka bakur (NATO). Gellek şirovekarên nêzîkî Pûtîn, bi çorsiyeke berbiçav îddia dikin ku, Dewletên Yekbûyî dê li Afganîstan û Îranê têkevin herrî û çiraveke weha ku nikaribin jê derkevin, û ji bo wê jî berevajiya ku wê ji xwe bi dûr bixin, pêdiviya wan dê hîn bêtir bi Rûsyayê hebe. Tevî ku tê xwestin jî, wê gavê divê başbûna têkiliyên Moskova û Washingtonê pê bi pê pêk bên: êdî ew ê weke ku sala 2001'ê roja piştî 11'ê îlonê hemû çûn hawara George Bush û bi dû re destvala jê vegerriyan nekin.

Li ser biryara 9'ê hezîranê şewqa vê niherînê heye: mueyîdeyên nuha ji yên berê hîn bi wêdetir in –bi rastî jî ji bo ku Tehranê bi awayekî ciddî aciz bikin têra xwe hene– lê dîsa jî hîn di bin yên ku Washington dixwaze re dimînin. 27'ê gulanê, birêz Mihaîl Margelov, serokê komisyona karên navneteweyî li Meclîsa Bilind a Meclisa Federal a Rusyayê, destnîşan dike ku *"mueyîdeyên nû yên li hemberî Îranê dê zirarê nedin bazirganiyê û peymanên aborî» yên di navbera Rûsya û Îranê de"* [3]. Sala 2008'an, îxracata Rûsyayê ya ber bi Îranê ve gihîşt 3,34 milyar dolaran, ku piçekî ji % 1 kêmî îxracata wê ya giştî dike– û firotina çekan bi tenê jî 14 milyon dolaran dike (bist carî kêmî firotina sala berî wê ye). Dîsa jî, Îran, li Rojhilata nêzîk ji bo Rûsyayê hevalbenda aborî ya yekem e. Di bin destê herduyan de jî, nêviyê rezervên gazê yên dunyayê hene. Ji xeynî vê jî di gel karê Gazpromê li Îranê, ku nuha girîngiya wê nemaye, niyeta Moskovayê heye ku gotûbêjekê li gel birêvebirên îranî bike da ku bazara petrolê ya nearam têxe duzanekê.

Danîna pêşnûmaya biryara nû ya ber Lijneya Ewlekariyê ku ji bo mueyîdeyan hatibû amadekirin bi awayekî nedîtî û dramatîk pir hate eceleyê: piştî hijdeh saetên gotûbêjan, lihevkirina Ahmedînecad ya digel serokê brezîlî Luiz Inacio Lula da Silva û serokwezîrê turk Erdogan, 16'ê gulana 2010'an bi zorê pêk hat. Kêm zêde, ev lihevkirin weke ya DYA û hevalbendên wê ye ku çiriya 2009'an hatibû pêşniyarkirin, lê îroj ew dibêjin ku wexta wê derbas bûye: guhaztineke hemdem, li ser xaka Turkiyeyê, di navbera du sed kîlogram uranyuma îranî ya kêmmeyandî û sed û bîst kilo sûtemeniya ji % 20 zengînkirî ya ji bo reaktorên lêkolîna tibbî ya Tehranê – projeya çiriya pêşîn a 2009'an a AIEN'ê pêşbîniyê dike ku Tehran dê ûranyûma xwe bişîne Rûsyayê û paşê jî, sed û bîst kilo cewherê kartêkirî û zengînkirî, dê ji Îranê re bê şandin. Ev gotina "paşê" Komara îslamî ya ku ji bazareke xapînok bişil e aciz dike.

Aciziya Washîngtonê gellekî eşkere ye: kesên ku ji adetî "rêlibergirên bêencamiyê" ne û bi îtirazên li hemberî hemû tevdîrên anîna ser rêyê yên li dijî Îranê mudaxeleyî Lijneya Ewlekariyê dikin – Rûsya û Çîn – ku niha endamên Lijneyê Brezîlya û Turkiyeyê şûna wan girtiye. Lula da Silva, serokê Dewleta herî mezin û demokratîk a Amerîkaya Latîn, ku niha ne tenê li nav cîhana sêyem, lê herweha li cîhana rojavayî jî xwedî navûdengekî giran e. Û Turkiye, dewleteka din a demokratîk e, ku hîn ji wê jî bi wêdetir, endama Rêxistina peymana Atlantîka bakur (NATO) e. Dengdana neyînî ya van herdu hêzên herêmî kêmasiyê dixe ser meşrûiyeta ku birêvebiriya Obama dixwaze pê mueyîdeyan serpûş bike û wê leke dike.

Rûsya û Çîn, hema hema bi qasî Amerîkayê mahcûb bûne, lewre herdu jî xwe weke dostê Îranê dihesibînin. Bi mehan, Moskovayê xwe li ser sehneya navneteweyî weke navberkareke ku beyî wê nabe nîşan da û xwast rêyeke qanekirina Îranê peyda bike Tehranê. Helbet Îran welatekî girîng e, ku divê mirov wê tercîh bike, ji bo *"hevalê xwe yê niha yê telebkar"*, Brezîlya û Turkiyeya ku ne ji alî siyasî û ne jî aborî ve qet jî ne deyndarê wan e.

Ji aliyê din ve, Washîngtona ku ji bi şûn de gavavêtina Moskova û Pekînê ya ji pakêta mueyîdeyên ku bi awayekî dijwar hatibûn gotûbêjkirin tirsiya, piştî daxuyaniya giştî ya serok Medvedev ku li gor wê diviya lihevkirina sêalî bi awayekî ciddî bihataya tetkîk kirin bi çend saetan, û ya Lavrov ku mixabiniya xwe anî zimên ka çima lihevkirineke zûtir nebûye, biryar anî û xist rojeva Lijneya Ewlekariyê. Rûsya û Çînê îşaretên nerazîbûnê dan û Rojavayî deh rojan tirsiyan ku ev herdu welat dîsa astengiyan derxin. Erê, wan di encamê de dev ji vê yekê berda, ji ber ku aciziya wan ya ji Îranê jê xurtir e.

* Profesorê zanyariya siyasî li Unîversîteya Quebecê, li Montrealê

Wergera ji fransî:
Yakûb Karademîr

1- *The New York Times* û *The Washington Times*, 21-ê gulanê, 2010

2- Di 2001'ê de ava bû, endamên wê Rûsya, Çîn, Kazakistan, Ozbekistan, Tacikistan, Kirgizistan. Çavdêrên wê jî : Îran, Hîndistan, Moxolistan û Pakistan in

3- *RIA Novosti*, Moskova, 27'ê gulana 2010'an

## HEVPEYVÎN

# Diyalogeke banal di navbera Chomsky û guhdarên wî de

Zimannas û çalakvanê amerîkî Noam Chomsky, li ser vexwendina *Le Monde Diplomatique'ê* di navbera 28'ê gulanê û 1'ê hezîranê de li Parîsê bû. Chomsky, li Théâtre de la Mutualité û li Collège de France, di salonên heta ber dev tije de, hin koferans dan. Di encama axaftinên wî de, nîqaşên bi guhdaran re rê li ber danûstandineke fikiran ya rengîn û dewlemend vekir ku li ser mijarên îro bû. Vane hin beşên wan axaftinan.



Wêne: *Libertas Electronic Newsletter*

***Beşdarek pirsa nebûna aliyê civakî ya di siyaseta ewropî ya aboriyê ya nuha de ji xwe dike. Chomsky analîzeke cuda ya vê rewşê peşniyarî wî dike.***

Di pratîkê de, polîtîkaya ekonomîk a ewropî li gorî projeyeke civakî tev digere. Weke hemû projeyên civakî, armanca yên ku Ewropa li pey wan diçe, ew e ku îmtiyazan bidin hin kesan. Bi vê yekê jî hinên din mexdur dike. Ya ku Martin Wolf [1], aborîzanekî lîberal e, dîtî jî ev e: Ev bername bi kêrî bankayan tê û zirarê li xelkê dike. Tevî vê yekê, divê mirov bi tenê di warê aboriyê de, li ser vê mijarê pirsan ji xwe bike. Em li ser aboriyê bi pir hindik tiştan dizanin, lê qet nebe em bi nimûneya Keynes dizanin: Dema ku daxwaz kêm bibe û sektora şexsî pereyan lê ranezîne, ji bo hewildana mezinbûna aborî bi tenê rêyek dimîne, ew jî (zêdekirina ) mesrefên giştî ye. Divê ji nû ve aboriyê bilind bikin, da ku kar bidin xelqê û qebûl bikin ku ji bo demeke kurt budce li hev dernekeve. Ev tişt ji wan re baş e, ji aboriyê re baş e, û di dawiyê de lihevderneketina budceyê ya destpêkê jî telafî dike. Digel ku banqe hez ji enflasyonê nakin, lewre bêguman riskeke enflasyonê heye. Enflasyon weke îroj hindik be jî û encama wê hêdîkirina mezinbûna aboriyê û mexdûrkirina gel be jî, banqe dixwazin heta ku karibin enflasyonê kêm bikin. Lê belê ev tiştên behskirî hemû ya rastî projeyeke civakî pêk tînin. Welatekî weke Yûnanistanê ji bo çareseriyê dayina deynê xwe red kir. Carinan behsa 'deynên kirêt' dibe, bi wateya ku tu meşrûbûna wan tunebe. Balê dikşînin ser rastiya ku ev deyn ne ji aliyê gel ve hatine kirin. Ev pere ji aliyê çeteyeke piçûk ve û ji bo yên herî dewlemend hatin deynkirin: Bi awayekî mentiqî, yên bacê nadin bi xwe divê deynan bidin.

***Li ser pirseke di derbarê bikaranîna şîddetê ya ji bo tekoşîna siyasî de, Chomsky bi analîzkirina sedemên çalakiyên bi vî rengî, bersivê dide.***

Em kêliyekê prensîpan ji bîr bikin û bala xwe bidin ser taktîkê. Divê hûn taktîkeke weha hilbijêrin ku îhtimala wê ya serkeftinê hebe, yan na her tiştê ku hûnê bikin dê pûç û vala be. Heger hûn li taktîkeke weha ku we bi ser bixe digerin, divê hûn, şiklê şerrî ku dijmin tercîh dike, qebûl nekin. Desthilatdariya dewletê bi xwe gelekî ji şîddetê hez dike: Di vî warî de hevgirtî ye. Di nava xwepêşanderan de qada şîddetê çi dibe bila bibe, Dewlet dê şîddeteke mezintir bi kar bîne.

Ji ber vê yekê ji salên 1960'î û vir ve, wexta ku bi xwendekarên çalakvan re diaxivîm, min peşniyarî wan dikir ku kumê parastinê di xwepêşandanan de nedin serê xwe. Rast e ku polîs hov in lê eger hûn kumê parastinê bidin serê xwe, polîs dê hovtir bibin. Eger hûn ê bi tivingê werin, ew ê bi tankan bên, eger hûn bi tankan werin, ew ê bi B-52'an bên: Di vî şerrî de hûn neçar in têk biçin. Her cara ku hûn biryarekê li ser taktîkê bidin, divê vê pirsê ji xwe bikin: *"Ez hewl didim alikariya kê bikim?"*. Gelo hûn ji bo ku dilê we rehet bibe, vê alikariyê didin? Yan hûn dixwazin alikariya hin kesên din bikin, tiştekî ji bo wan çêbikin? Li gorî bersiva vê pirsê hûn ê taktîkên cuda hilbijêrin. Weke nimûne, boykotkirina zanîngeha Hayfayê [2]. Bi çalakiyên bi vî rengî, hûn diyariyekê didin tûndrewan. Ew ê hema bibêjin, û xebera wan e jî, ku hûn durûtiyeke pirr mezin dikin: *"Çima hûn Sorbonne, Harvard an jî Oxfordê boykot nakin? Destên welatên wan bi hovîtiyên xirabtir qirêj bûne! Naxwe çima hûn zanîngeha Hayfayê boykot dikin?"* Lewre, çalakiya we ji bo tûndrewan dibe diyariyek ku dikarin wê ji wateya wê ya îdeolojîk vala bikin. Weke encama vê rewşê, dibe ku vê çalakiyê dilê yên ku ew li dar xistiye rehet kiribe, lê di dawiyê de ziyanê li Filistîniyan dike. Di dema şerê Vîetnamê de, nerazîbûna xelkê Vîetnamê bi çalakiyên weke yê Weathermen'ê [3] gellekî tesîr li min kir. Ew ciwanên sempatîk bûn, ez heyranê wan bûm û min xwe nêzîkî fikrên wan hîs dikir. Ji bo ku nerazîbûna xwe ya ji şerrî diyar bikin, dadiketin kolanan û vîtrînên dikanan dişikandin. Gelê Vîetnamê li dijî tiştên wisa radibû. Armanca Vîetnamiyan ew bû ku ji şerrî sax bifilitiyana: ne xema wan bû ku xwendekarên amerîkî dilê xwe bi çalakiyên bi vî rengî rehet dikir. Wan zû fahm kir ku bi hilgirtina pankartan û daketina kolanan a wan ciwanan û şikandina vîtrînan, doza yên ku şerr dixwest xurttir dibû. Ji xwe weha pêk hat. Taktîka ku aşkirina dilê nerazîbûnê dide ber xwe, dikare ziyanê li mazlûman bike. Berovajiyê vê rewşê jî, Vîetnamî heyranên xwepeşandanên jinan yên bêdeng bûn ku diçûn ser gorên miriyên xwe. Li gorî wan, diviya ku me jî çalakiyên bi vî rengî li dar bixistana. Îro jî heman rewş heye: heger hûn bixwazin alikariya Filistîniyan bikin, li encamên taktîka ku we hilbijartiye baş bifikirin.

***Li ser pirsa lawazbûna seferberkirina gel ya li dora bernameyeke çepgiran, Chomsky behsa tevgera amerîkî a rastgir û tûndrew dike ku navê wê "Tea Party [4]" ye.***

Xelk henekê xwe bi tevgera "tea party" dikin. Hin tiştên wan hene ku mirov dikare henekê xwe pê bike, lê ev mirov pirsgirêkên rastîn li ber çavan radixin. Mirov henekê xwe bi ditînên wan bike jî bi kêrî tiştekî nayê. Belkî em bikarin henekê xwe bi serkêşên wan bikin: Weke nimûne bi Sarah Palin bikin. Lê di nava van sîh salên dawîn de, kesên ku tev li vê tevgerê bûne, pir êş kişandine. Ew baş fahm nakin, ka çima û çi qewimî. Eger hûn li radyoyên ku ew tê de niherînên xwe dibêjin guhdarî bikin, hûn ê pirr caran van tiştan bibihîsin: *"Herçî tiştên ku diviya min bikirana, min ew pêk anîne. Ez karkerekî spî me, xirîstiyanekî baş im. Min eskeriya welatê xwe kiriye. Min herçî tiştê ku ji min dihat hêvî kirin, bi cih aniye. Ma çima jiyana min ji hev dikeve? Çima hin kes welatê min diguherînin? Çima dihêlin ku nirxên ku ji min re hêja ne, bên binpêkirin? Çima banqedar di nav dolaran de dixeniqin, lê yê min, karê min tuneye?"* Ev ramanên otantîk in. Belkî baş nehatibin bilêvkirin lê dîsa jî rast in. Mirov henekê xwe bi wan bike, bi kêrî tu tiştî nayê. Lazim e ku çepgir van kesan bi rêxistin bikin, lê wisa nakin.

***Beşdarek li dijî niherînêke Chomsky ya ku ew pir caran dibêje radibe. Chomsky pir caran îddîa dike ku şiklekî analîzkirina siyasetê ya mentiqî heye, lê gava ku weke mînak li rojhilatê Qudsê dagirkirina erda Filîstînê dewam dike, kirinên Îsraîlê ne li gorî mentiqê ne. Tevî ku di axaftinên xwe de Amerîka li dijî vê dagirkirinê ye jî, di pratîkê de piştgiriya wê dike. Tu mentiqa vê yekê tuneye, ji ber ku tiştekî wisa zirarê li têkiliyên Amerika û cîhana Ereb dike.***

Piştgiriya Îsraîlê ji aliyê Amerîkayê ve tiştekî mentiqî ye. Vê piştgiriyê di

salên 1967'an de dema ku Dewletên Yekbûyî şûna Fransayê girt dest pê kir. Wê demê, di navbera du hêzên cîhana ereb de şerrek diqewimî: Muhafezekariya misilman, ku amerîkayê destek didayê û neteweperestiya laîk ku weke dijminê hêzên rojava yê sereke bû. Bi kurtasî, Erebîstana Suûdî li dijî Nasirî bû. Îsraîlê neteweperestiya laîk têk bir, piştgiriya muhafezekariya misilman kir ku hevgirê Amerîkayê bû û ew xurt kir. Washingtonê desteka eskerî da Îsraîlê; dewleta cihû bû weke dewleteke pîroz, lê berê bi vî rengî nebû.

Di salên 1970'î de, diyariyeke din a girîng danê. Weke ku Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û Israîlê dixwest, Urdunê di pêvajoya ku jêrê dibêjin "îlona reş" de berxwedana filistînî çewisand û pelixand. Sûriyê di daxuyaniyekê de gotibû ku îhtîmal e ku ew ji bo parastina Filistîniyan mudaxaleyê biker. Hingê, cihê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê li başûrê rojavayê Asyayê hê xweş bû. Lewre bang li Îsraîlê kir da ku eskerên xwe seferber bike û rêyê li ber îhtîmala destwerdaneke Sûriyê ya ji bo parastina Filistîniyan bigire. Û Sûriyê bi paş ve gav avêt. Desthilatdariya Melîkiya Haşemî (Urdin) ku hevgirê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê bû hat zexmkirin û Erebîstana Suûdî jî pê re xurt bû. Lewra alîkariya ku Amerîkayê dida Îsraîlê, li gora berê, çar qatan hat zêdekirin û dewama wê jî êdî bi vî awayî bû.

Çarçoveya xebata Amerîkayê ya stratejîk, ku navê hevgirtina dorhêlê lê hat kirin, li ser hîmê alîkariya birêvebirên ereb, yanî dîktatoran, ava dibe. Di vê stratejiyê de Amerîka welatê wan û petrolê kontrol dike. Divê ew ji gelên xwe bi xwe bên parastin. Da ku bigihîje vê armanca xwe, Washington komeke cendirmeyan bi kar tîne û tercîh dike ev cendirme ne ereb bin, lewre ew di kuştina Ereban de jêhatîtir in. Di destpêkê de, ev kom ji Îrana ku hingê Şahî bi rê ve dibir, ji Tirkiye û ji Pakistanê dihat peydakirin. Di destpêka salên 1970'î de, Îsraîlê xwe li vê komê zêde kir û bû endamê rêxistina cendirmeyan. Nîkson navê wan kiribû "polîsên dewriye" ("cops on the beat"). Komîsêrên heremî hatin bicîhkirin û navenda polîsan li Washingtonê hat damezrandin: avahiya ku diviyabû herem kontrol bikiraya jî ev bû.

Sala 1979'an Şah têk diçe, rewşa Îranê "pir xirab e". Rola ku Îsraîl pê radibe ji nû ve xurtir dibe. Wê demê, Îsraîl xizmetên cihêreng li tevahiya cîhanê dikirin. Kongreya Amerîkayê li Guatemala, Efrîkaya Başûr û li hin deverên din piştgiriyeke yekser a terorîzma dewletê asteng dikir. Lewma Amerîkayê ji bo pêkanîna tevna welatên dost bangek kir ku di nava wan welatan de Taywan, Îsraîl, Ingilistan (û bi îhtîmaleke mezin Fransa jî) hebûn, da ku karên qirêj bi wan bidana kirin.

Di vî warî de Îsraîl gelekî bikêrhatî ye. Civaka wê pîşesaziya xwe temam kiriye û dewlemend e, xwedî teknolojîya herî dawîn e. Karkerên wê yên baş gihiştî hene. Bi van herdû tiştan, dewleta cihû bala projeyên pererazandinê yên fîrmayên amerîkî ku di warê teknolojîya bilind de dixebitin, dikşîne ser xwe. Hin pîşesaziyên îsraîlî yên leşkerî têkiliyên xurt bi Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê re danîn û beşeke lojîstîka xwe bar kirin wira. Ji salên 1950'î û vir ve, rêxistinên herdû welatan yên îstixbaratê bi awayekî baş hevkariya hev dikin. Ji pîşesazîya amerîkî ya leşkerî re Îsraîl çavkaniyeke aboriyê ye: Dema ku Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê bi milyaran dolar alikariyê bi Tel-Avîvê dikin, pareke vî pereyî dikeve bêrîka Lockheed Martin. Û dema ku Lockheed Martin balafirên leşkerî yên teknolojiya dawîn difiroşe Îsraîlê, hingê Erebîstana Suûdî radibe û dibêje: "Em jî ji wan dixwazin". Wê gavê, Lockheed Martin hacetên bi kalîteyeke kêmtir difiroşe Erebîstana Suûdî. Erebîstana Suûdî ya ku hê nizane ka çawa divê wan bikar bîne, dîsa jî bi tonan hacet dikirre. Yanî tê de karê Amerîkiyan dibe du qat. Lê ma gelo Filistînî dikarin çi bidin Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê? Lawaz in, belavbûyî ne, tu çavkaniya wan a bi nirx nîne û di cîhana ereb de hema bibêjin ku tu piştgirtîya wan nîne. Îsraîl welatekî bi hêz e, ev yek hin avantajan didiyê; lewma mafên wê jî hene. Piştgiriya hêzdaran û siyaseteke li gorî berjewendiyên xwe yên rastîn tiştekî pir mentiqî ye. Em dikarin li dijî vê yekê rabin û bibêjin ku piştgiriya Îsraîlê dibe sedema dijayetî û xwepêşandanên li welatên ereb. Lê ev tişt tu carî weke pirsgirêkekê nehatiye dîtin. Ji bo ku gelan biperçiqînin, em baweriyê bi dîktartoran tînin û çekan didin wan da ku bigihîjin vê armancê. Dibe ku hûn rast bin dema ku hûn bibêjin ku ev ne biryareke baş e, lê hûn nikarin bibêjin ku ne mentiqî ye. Ji aliyê din ve jî, siyasetên ku li deverên din ên weke li Amerîkaya Latîn, li başûrê rojhilatê Asyayê û li warên din ên cîhanê hatin meşandin, bi vê biryar û mentiqê re li hev dikin. Carinan jî ev mentiq baş nameşe, plansaziya emperyalîst bêqisûr nîne. Îroj rewş piçekî cuda ye, ne ji ber hatina Obama lê ji ber alîguhertina Îsraîlê ku xwe gelekî nêzîkî hêla rastê kiriye. Pêleke bayê paranoyayê, neteweperestiyeke tûndrew, hîsterî û hwd… lê dide ku ev yek di giştîkirina kirinên xirabxwaz û bêmentiq de xwedî roleke mezin e. Wekî din jî, êdî arteşên amerîkî li wira, li Iraq û Afganîstanê hene. Bêmentiqiya kirinên dewleta Îsraîlê van artêşan dixe nava xetereyê. General David Petraeus li ser pozîsyona Îsraîlê ya hişk û lihevneker bal kişand ser ku ev helwesta Îsraîlê leşkerên amerîkî dixe nava rîskeke nû. Edî îhtîmala guhertineke radîkal di siyaseta amerîkî de heye. Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê welatekî pirr şovenîst e, heger hinek tiştekî xirab bînin serê leşkerên wê, ew amade ye ku qira wan bîne. Lîstika Îsraîlê, lîstikeke pirr xeternak e.

Wergera ji fransî:
Bedran Dere


**Li ser Înternetê**
Hûn dikarin nivîs û qeydên axaftinên Noam Chomsky li ser malpera Chomsky.fr û her weha ya Le Monde diplomatique'ê www.monde-diplomatique.fr/carnet/2010-05-31-Chomsky bibînin.

1- Edîtorê *Financial Times*'ê ye.

2- Dema axaftina bi beşdarên konferansê re, pirsa bikêrhatina protestokirina polîtîkaya Îsraîlê ya li ser erdên dagirkirî, bi boykota zanîngeha Hayfayê hê nû hatibû kirin. Zanîngeh bi cihêkariya li dijî xwendekarên filistînî ve dihat sûcdar kirin.

3- Komeleyeke xwendekaran e ku bi destpêka şerê Vîetnamê re di sala 1969'an de bi armanca pêkanîna "çepeke nû" hatiye avakirin.

4- Wateya TEA *Taxed Enough Already* ye: "yên ku ji xwe têra xwe bacê didin."









REBWAR SAEED
30 x 30 cm, Akrîlîka ser tûwalê









# Li Amerîkayê, peywendiya parêzerî û siyasetmedariyê

ALAIN AUDI *

*"Arîstokrasiya amerîkî li dadgehê him parêzer e, him dadger e."* Ev tesbît yek ji çavdêriyên Alexis de Tocqueville e ku ji rastiya xwe tu tişt wenda nekiriye. Li Fransayê parêzerekî derdorên kar û bazirganiyê weke serokkomar hat hilbijartin. Ev yek dikare weke nimûneyeke îstisnaî were qebûlkirin. Lê belê li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê zêdehiya parêzeran ya di ast û qedemeyên desthilatdariyê yên herî bilind de pirr balkêş e.

Beşekî giring ji kesên ku li derdora serok Barack Obama (ku ew bi xwe jî kevneprofesorê hiqûqê ye) ne, ji hiqûqnas û parêzeran pêk tê; weke minak: Hillary Clinton (sekretera dewletê), Janet Napolitano (wezîra ewlekariya navxweyî), Valerie Jarrett (şêwirmendeke payebilind), Joseph Biden (alîkarê serokî), Leon Panetta (Birêvebirê Ajansa navendî ya agahdariyê, CIA), Eric Holder (wezîrê dadê), Ken Salazar (wezîrê wargehê) … û gelek siyasetmedarên din. Pirr caran hatiye bibîrxistin ku fakulteya hiqûqê ya zanîngeha Harvardê (Harvard Law School) bûye weke çavkaniyek yan jî tevneke weha ku serok Obama qismekî ekîba xwe yê mezin ji wê derê hilbijartiye. Ne tenê ji bo birêvebiriya desthilatdariyê, lê herwiha ji bo endametî û birêvebiriya saziyên din jî, ew bêtir parêzer û hiqûqnasan tercîh dike. Weke mînak % 59'ê senatoyê û % 40'ê meclîsa nûneran [1], ji hiqûqnasan pêk hatiye.

Ev rola hiqûqnasan ya bi bandor herî zêde li wan welatan pêk tê ku xwedî hiqûqa hevbeş (*common law* [2]) û xwedî prensîba "emsal" in. Li gorî vê prensîbê, di nava pêvajoya dadgeriyê de, parêzerên ku dikarin derbixin holê ka "qanûn û zagon çi dibêjin" tên wezîfedarkirin.

Di vê derê de jî Tocqueville rastî dîtiye: *"Zagonên me yên nivîskî, pirr bi zehmetî tên fahmkirin, lê herkes bi hêsanî dikare wan bixwîne; ji bo kesekî ji rêzê û di pêkanîna jiyana rojane de, ev zagonên nivîskî him şolî û tevlihev in û him jî ji wateya xwe ya ku li ser bingehê emsalê hatiye avakirin, bi dûr ketine. Ji bo fahmkirina naverokа zagonan, bi taybetî jî li Amerîka û Brîtanya'yê pêdivî û hewcedariyeke ciddî bi pisporên hiquqê ve heye. Ev derdorên pispor ku gel qaşo feyde ji ronahiya wan dibîne, bi vê rola xwe ve her ku diçe, ji gel û ji jiyana rojane bi dûr dikevin û di nava xwe de çîneke cuda diafirînin. Pisporên hiqûqê yên fransî weke zanyaran karên xwe dimeşînin, lê belê yên îngilîz û amerîkî bi şiklekî dişibin rahîbên Misir'ê; weke wan, ew jî dikarin bi tenê sembol û şîfreyên zanyariyeke veşartî û dizî eşkere bikin û wergerînin zimanê me yê îroj"* [3]
Deriyek bi tenê heye ku mirovan dibe cihana vê "çîna cuda" û ew jî fakulteya hiqûqê ye, (*law school*). Li vê derê xwendevan weke xebata stajê, qanûnên dadgeha bilind hûr dikolin û giraniyê didin ser dozên ku heta niha weke emsal pêk hatine. Dibistanên amerîkî yên hiqûqê (*law schools*) ji bo ku qeyda xwendevanekî qebûl bikin, weke şert ji wan dixwazin ku herî kêm du qedemeyên zanîngehê qedandibin. Ji bo destpêka sala yekem ya perwerdeya hiqûqê, pêdivî bi perwerdeyeke xurt ya berî wê heye. Piştî perwerdeyeke sê salan, xwendevan dikarin diplomayeke "*juris doctor*" bi dest bixin, ku bi vê belgeyê dikarin di buroyên dewletê de di warê xwe de dest bi kar bikin. Şagirtên herî serkeftî yên fakulteyên herî baş – Yale, Harvard, Stanford yan jî Columbia – heger jêhatî bin, xwedan wê şensê ne ku salekê an jî du salan li ber destê dadgeran stajê bikin û derbasî kabîneyên mezin yên bi nav û deng û qadên birêvebiriyên bilind bibin (wezareta dad û edaletê, wezareta dewletê û li Qesra Spî… ). Şagirtên din ji bo ku rêwîtiya xwe ya di qada hiquqê de dewam bikin, neçarin ku biçin dibistaneke hiqûqê *law school'ê*. Lê belê, ev rê buhêrkeke asê ye ku meşa wê dikare pirr zehmet be.

Buhayê perwerdeyeke heft salan ewqasî giran e ku piraniya şagirtan neçar dimînin ku dev ji beşê hiqûqê berdin. Ji sê şagirtan yek perwerdehiya xwe diqedîne yek û di dawiyê de jî heryek ji wan dibe xwediyê deynekî bi qasî 120 000 dolaran (100 000 €). Lewma jî ciwanên ku dîplomayên xwe, nû bi dest dixin, dixwazin karekî wisa bikin ku bikarin di demeke kin de deynê xwe bidin . Hiqûqnasên ciwan divê biryara xwe bidin [4], yan divê di saziyên dewletê [5] de yan jî di kabîneyeke taybetî de dest bi kariyera xwe bikin. Lê ji ber ku saziyên taybetî sê an jî çar caran ji saziyên dewletê zêdetir heqdestî didin [6], ciwan zêde nakevin nava dudiliyan û xebata li cem saziyên taybetî tercîh dikin

Li Fransayê parêzerek dikare serbixwe buroyekê veke û dosyayên herî nazik jî werbigire, lê li Amerîkayê rewş berovajiyê wê ye : Tu parêzer û hiqûqnasê amerîkî beyî ku bi "kabîneyên mezin" re hevkariyê bike, nikare hesabê serkeftinê bike. Di her kabîneyekê de, ji dusedî bigire heta hezaran, parêzer kar dikin. Hiqûqnasên herî bi bandor, yên weke H. Rodgin Cohen (parêzerê Wall Street'ê yê navdar) û Robert S. Bennett — ku parêzeriya William Clinton, Paul Wolfowitz (sekreterê dewletê yê dema birêvebiriya George W. Bush), John McCain û Caspar Weinberger (wezîrê parastinê yê dema birêvebiriya Reagan) kiribû — hemûyan di saziyên weke van kabineyan de dest bi kariyera xwe kiriye.

Kabîneyên ku bi pirsgirêkên derdorên bazirgan û karsazan ve mijûl dibin, soza heqdestekî bilind didin, – di nava parêzerên hevkar de, yên herî xwedî prestij salê dikarin bi qasî milyonek dolar bi dest bixin – parêzerên ku berê xwe didin polîtîkayê bi pirranî armanca wan ew e ku bibin xwedî kariyereke dozgeriyê (*prosecutor*). Bi dehan nimûne hene : Rudolph Giuliani, şaredarê berê yê New York'ê, û John Kerry, senatorê demokratan yê Massachusetts û kevnenamzetê serokatiyq dewletê. Çi dibe bila bibe, ev rewşa wan di dema hilbijartinan de, ji ber îmaja wan ya hiqûqnasiyê bi kêrî wan hat. Di rêzefilmên televizyonan yên weke « Law and Order » de modeleke xeyalî li ser dozger û parêzeran hatiye avakirin ku tê de dozger mîna ku serkeftineke mezin bi dest xistibe, bi awayekî bixwebawer daxuyaniyê dide çapemeniyê û gotinên wî jî, ji aliyê medya û çapemeniyê ve bi awayekî sansasyonel tê nepixandin. Ew bi piranî bi parêzerên dewletê re (*public defenders*) rû bi rû dimînin. Parêzerên dewletê bi giranî derdorên xizan diparêzin ku derfetên wan yên ku karibin ji xwe re parêzerekî taybetî bigirin tuneye.

Rewşa parêzeran li Amerikayê pir xweser û taybetî ye. Dema ku mirov behsa rola hiqûqnasan ya di siyasetê de dike, ne mumkun e ku mirov behsa kategoriya binî ya parêzerên dadgehê neke. Parêzerên ku di dozekê de dibin xwedî îdia li hemberî xwe parêzerên derdorên karsazan dibînin ku ew jî bi wan re dikeve nava bazarê. Dema ku pêdivî çêbibe ku ji bo parastina mafê hemwelatiyan li dijî şîrketan, li dijî berpirsiyariya kargehan, li dijî şaşitiyên tibî yên li cem doxtor û nexweşxaneyan doz werin vekirin, hêjmara parêzerên pispor têrê nake, lewma jî ji ber neçariyê, gellek doz li ser hev û di nava dosyayek de tên civandin. (*class actions*).

Rewşa kevnenamzetê serokatiyê John Edwards nimûneyeke baş e. Ma, li cîhanê, wekî din li kîjan welatî, sîyasetmedarek beyî ku nakokiyên xwe nîşan bide, daxwaz dike ku parêzer tim di xizmeta hewcedariyên hiqûqê de bin, lê li aliyê din, wî bi xwe jî, ji vî karî bi dehan milyon dolar sermaye bi dest xistiye?

Di hin dozan de îmkan heye ku weke cezayê tazmînatê, pere were dayîn (*punitive damages*) û ew jî dikeve şûna ziyana ku yê maxdûr dîtiye (di hiqûqa fransî de jî heman tişt heye) û bi vî awayî, bi berdêla tazmînatê ve çewtî û şaşitiyên sûcdaran tê telafîkirin. (hiqûqa perpirsiyariya ferdî ya amerîkî). Lê, sînorê van tazmînatan tuneye, heta bi milyon dolaran ve jî dikarin bilind bibin û maye ser wijdana dadgerî. Li Amerîkayê parêzerên xwediyê dozan bi piranî dixwazin belaş kar bikin, lê bi şertê ku ji tazmînatên ku di encama dadgehê de tên bidestxistin beşek bi wan re were parvekirin (bi pirranî ji sê paran parekê werdigirin). Partiya komarparêz û derdorên kar û karsazan, li dijî vê sîstemê ne. Lê belê partiya demokrat sîstemê diparêze. Di vê derê de tiştekî ku mirov lê ecêb bimîne tuneye, ji ber ku namzetên vê partiyê % 96'ê alikariya aborî ji American Association for Justice [7] bi dest xistiye (di salên 2009-2010 [8] an de)…

Fînansoriya taybetî ya di dema hilbijartinan de, ji parêzeran û siyasetmedaran re deriyên nû yên qezencê vedike, ji xwe ew jî pir bi hostatî dizanin ji vê rewşê sûdê werbigirin. Bajarekî li Massachusetts'ê dema ku ji ber têkçûyina borsayê fona wê ya teqawîtiyê kêm bû, serî li rêbazeke nû da: bi qasî diwanzdeh (12) hîsseyên dadê xistin bazarê. Di vê derê de jî tiştekî ku mirov lê ecêb bimîne tuneye… Di dema hilbijartinên ji bo hesabgeriya bajêr de, tenê parêzerên kabîneyekê 68 alikariyên cuda yên aborî xistine xizmeta hilbijartinan. Ev yek li Amerîkayê bûyereke adetî ye ku di dawiyê de [9], bû mijara gotareke rojnamenivîs Michael Kinsley: Li Washingtonê bûyerên skandal ne îllegal in, lê qanûnî ne.

Li Amerîkayê dozger û dadger ji aliyê raya giştî ve bi hêsanî tên hilbijartin,



RIZA TOPAL
30 x 30 cm, Akrîlîka ser tûwalê

lewma jî tevlêbûna wan ya nava siyasetê jî tê tercîhkirin.

Alexis de Tocqueville ji berê ve bal kişandibû ser xetereyên xwezayî yên awayê tayînkirina mirovên hiqûqê: *”Ez dikarim bibêjim ku ev nûbûn û ev awayê xebata hiqûqnasan dê rojekê bibe sedemê encamên xirab û hilweşînê jî. Her ku serxwebûn û bêalîbûna dadgeran kêm dibe, mirov lê wardiqile dike ku yê ku ziyanê dibîne ne bi tenê desthilatdariya dadî ye, lê herwiha komara demokratîk bi xwe ye jî.”* Meseleya dadger Brent Benjamin’ê serokê dadgeha Virginyaya rojavayê ya bilind nimûneyeke berbiçav e. Benjamin xwe jî doza şîrketa ku di hilbijartinan de jê re fînansorî kiribû bi şûn ve nekişand. Di hezîrana 2009’an de dadgeha bilind gîhîşt wê biryarê ku ew neheq e. Sedema neheqiyê jî weke newekheviya alikariya ku hatiye girtin hat nîşandan. Ji ber ku vî dozgerî ji kesên din zêdetir alîkariya aborî bi dest xistiye (nêzî 3 milyon dolaran) . Ev rewş nîşan dide ku li gorî dozgerên pispor dema ku alikariyeke piçûk yan jî alikariyeke veşartî were girtin, pirsgirêk dernakeve.

* Parêzerê amerîkî, birêvebir

Wergera ji fransî:
Bedran Dere

1- Liste li vê adresa elektronik dikare were dîtin: www.abanet.org/poladv/documents/lawyerleg110thhouse_nofooter.pdf

2- Di şîrovekirina zagonan de, dadger dikare dozeke kevn weke emsal nîşan bide

3- Alexis de Tocqueville, *De la démocratie en Amérique*, Flammarion-Poche, Paris, 1999, beşê 8’an, xala 2

4- Binerin: «Lifting the Burden: Law Student Debt as a Barrier to Public Service», American bankers association (ABA) Commission on Loan Repayment and Forgiveness, Washington, 2003

5- Vê rêyê di salên 1970’î de, bala bi sedan cîwanî dikişand. Tercîha wan ew bû ku bikarin bibin parêzerên dewletê

6- Binêre; Association for legal career professionals (NALP), «New Findings on Salaries for Public Interest Attorneys», NALP Bulletin, îlon 2008, www.nalp.org/2008sepnewfindings

7- Navê wê yê berê *Association of Trial Lawyers of America* bû

8- www.opensecrets.org/orgs/summary.php?id=D000000065

9- Bixwîne: Mark Maremont, Tom McGinty et Nathan Koppel, «Trial Lawyers Contribute, Shareholder Suits Follow», Wall Street Journal, 3 sibat 2010


### PERWERDEYA LEZGÎN YA FRANSÎ

Li Fransa’yê, zagona sala 1971’ê bi biryareke nû di sala 2008’an de hat guherandin. Li gorî vê yekê karmendên payebilind û kesên hilbijartî dikarin bibin parêzer… tenê divê îspat bikin ku bi kêmanî perwerdeyeke normal dîtibin. Di nava kesên ku ji vê guherîna nû îstifade kiriye de Ségolène Royal û Rachida Dati, François Hollande, Jean-François Copé, Frédéric Lefebvre, François Baroin, Manuel Aeschliman, Pascal Clément, Dominique de Villepin, Noël Mamère, Christophe Caresche, Jean Glavany, Hervé de Charette, Hervé Gaymard û Georges Tron hene.

# Destana şerrê Îspanyayê

## HÉLÈNE ANGER

Ev berhem ji wan pirtûkan e ku tê de serpêhatiyên eşqiyatî û drama, çîrokên xeyalî û dîroka rastîn bi hostatî li hev hatine hûnandin û, bi giştî, bûye weke tabloyeke humanîst ya tijî macera. Em behsa pirtûka Ramon Chao ya bi navê Odysseya Winnipegê dikin. Bi tenê kêmasiyeke piçûk heye : sernivîs yan jî navê pirtûkê yê fransî mixabin bi têra dewlemendiya naveroka romanê nake. Ya rastî, serpêhatî û rêwîtîya Pablo Neruda ya tebaxa 1939’an ku bi keştiyê ji bajarê Kanadayê Winnipegê dest pê dike û heta Şîliyê diçe û ji wê derê jî derbasî welatên Amerikaya latîn ya îspanyolî dibe, bi tenê di beşê vê pirtûkê yê dawîn de hatiye vegotin. Lê pirraniya berhemê li ser Odysseyê, bi gotineke din, li ser serpêhatiyên lehengî yên trajî-komîk yên xortê bi navê Luis Gontan e ku bêyî hemdê xwe tev lî dînîtiya şerrê Îspanyayê dibe.




*L’Odyssée du Winnipeg*
(Odysseya Winnipegê)
RAMON CHAO
Buchet Chastel, Paris, 2010
264 rûpel, 20,00 €

Kodnavê wî Kilowatt e, kesekî nîv-diz e, nîv-maqûl e, xwedî terbiyeyeke nîvco ye. Heta ku şerr tê nava gundê wî Galice jî ew tim bi zexeliyan dijî, jiyana wî tijî dek û dolab e: “*şerr bi hemû dijwariya xwe ve, hêdî hêdî ber bi gundî ve dihat, weke pizota êgir ya bi şewat, xwe dabû ber deriyê malan, him jî di demeke wisa de ku kesî hatina wî hêvî nedikir*”.

Ji wê demê û pê ve, êdî jiyan li wî û hezkiriya wî Maruxayê dibe dojeh. Diviyabû ji herêmê bi dûr biketaya, lê bi carekê ve xwe di nava şerrî de dibîne û ji neçarî tev li refên komarparêzan dibe. Di destpêkê de ji baweriyê bêtir ji ber berjewendiyên xwe tev li şerrî dibe. Piştî demekê, di nava pevçûnan de, êdî ew ne bi tenê temaşevan û şahidê bûyeran e, lê herweha dibe aktor û bi dilsozî yan jî ji neçarî hema hema her cure rolan qebûl dike û dilîze. Weke mînak: rola keşîşê parsek, rola şerrvanê fransî ku piştî kuştina wî nasname û herwisa karta wî ya endametiya partiya komunîst bi dest dixe û bi wan ji nav lepên gerîllayê bi nav û deng Foucellas difilite, hinekan jî ew bi vî gerîlayî re tev li hev dikirin. Herweha, dema ku dixwaze biçe Winnipegê jî, dîsa nasnameya leşkerê fransî bi kar tîne.

Di dema bikaranîna nasnameyên sexte de û herweha di dema guftogoyên di navbera nûnerê hikumeta komarger û Stalîn de ya ji bo alikariya çekan û alavên şer bide espanyolan, nivîskar bi hostatî ji zimanekî komîk û mîzahî derbasî trajediyê dibe, ji gotinên ciddî derbasî yên vala û yên beradayî dibe, ji çîrokên xeyalî derbasî dîroka rastîn dibe. Beşê pirtûkê yê li ser şertên penaberên espanyolî yên dijwar ku weke heywanan di kampen fransî de hatine komkirin, bi zimanekî giran û bi bandor hatiye nivîsandin: “*dev û lêvên me hatibûn mixkirin, em di rewşeke wisa de bûn ku me spasî wan dikir, ji ber ku em heta nuha nedane ber guleyan û nekuştine*”.

Di rewşeke ewqas trajîk de bûyerediqewime ku hewaya hawîrdorê hinekî nerm dike. Hevdîtina bi jinan re, bilindbûna hestên cinsî di vê cîhana kaosî de, dibe weke parantêzeke kêf û eşqê. Lehengê pirtûkê, Luis, ne ji wan kesan e ku ji destpêkê ve tev li bûyeran bûne û, bi rêya îdealan de, bûne xwedî prensîbên polîtîk. Ew dixwaze xwe piçûk nîşan bide, lê ji nişka ve xwe wisa di nava bûyer û pêşketinan de dibîne ku ew jî tu wateyê nade vê rewşê û tiştekî jê fahm nake : “*zarokek heta qirikê ketiye nava tevliheviyeke beradayî û bêwate ku redkirina wê ne gengaz e*” weke hemû kesên din ku li ser rêya şerrê birakujîyê weke mertal hatine bikaranîn.

Tevliheviya rolên ku dilîîze û tevliheviya nasnameyan, bêwatebûna bûyeran gellek tiştan tîne serê lehengê romanê : du caran ew mevziyên aliyên şer tev li hev dike, carekê bêyî hemdê xwe derbasî aliyê faşîstan dibe û carekê jî ji aliyê heval û koma xwe ve bi cezayê kuştinê ve tê mehkûmkirin! Lê di nava vê mij û dûmana bûyerên tevlihev de, ew kontrola çarenûsa xwe digire dest. Hemû rê û buhêrkên ku tê re derbas dibe (Las travesias – buhêrk– navê pirtûkê yê orjînal) tev ber bi eynî armanc û îstiqametê ve diçin. Armanc: redkirina desthilatdariyeke totalîter û zalim û bidestxistina kesayetiyeke serbixwe û azad.

Ew vê yekê ancax li bajarê Winnipegê dibîne. “*Ev der weke gerr û rêwitiyeke weha ye ku mirov di dawiyê de xwe digihînê. Her ku çû, min ferq kir ku koçberî ji bo min bûye parçeyekî jiyanê. […] Ev der weke niştiman û xaka min e, herêmeke veşartî ye, weke xezîneyeke ku mirov keşif bike û bi dû re tû caran nikaribe dev jê berde.*”

Wergera ji fransî: Bedran Dere

# Fatoreya salên Margaret Thatcher

## J. B.

Jim Doherty kesekî teqawîtbûyî yê ji derveyê norman e. 62 salî ye û li taxa Parkheadê ya li rojavayê Glasgowê ku li wê derê temenê mirovan, heger tu li navê bixî, li derdora 53,9 salan e. Li ser karî qeza derbas kiriye, lewma ew her mehê 560 sterlîn meaş werdigire û cixarê jî dikişîne. Ji me re dibêje «*mêze bikin*, di wê navberê de jî perdeyan vedike. *Li wê dera hanê, karxaneyeke hesinan (metalurjî) hebû. Di wê karxaneyê de 8.000 kesan kar dikir. Li paş wê, 3.000 karker di karxaneyeke erebeyan de dixebitîn. Li paş wê jî, di karxaneyeke hesinên polayî de 7.000 kesan kar dikir û ew nuha ji kar hatine derxistin. Van hemû karxaneyan, di salên 1970-1980’ê de, ji vir bar kir û çûn Asyaya Navîn û Rojhilatê Ewropayê.*» Doherty, di hemû jiyana xwe de weke karkerekî xebitiye û di cihê karê wî de qeyran tunebûye: karê xirabkirinê. «*Min gellekr tax û geto xirab kirine. Li wan deran karker diman, heman tax hatin valakirin, da ku şêniyên wan biçin deverên din û li getoyên din bijîn. Li cihên wan yên nû hemû zarokên wan bêkar man. Min pir karxane jî xirab kirine, karxaneyên ku yek bi yek hatine girtin Ev jiyana min bû.*»

Li dora mala wî zibara pîşesaziya modern li ser hev tov bûye. Li vê taxê dikanên ku hene bi hesinan hatine dorpêçkirin, narkotîk lê tê firotin û çete li her derê hene. Li Glasgowê, siyaseta têkbirina pîşesaziya ku ji aliyê hikumeta Margareth Thatcher (1979-1990) ve hatibû meşandin bi ser ketiye. Demeke dirêj beriya wê, Doherty komeleyek *Gallowgate Family Support Group* ava kiriye: derdorê sîh mîlîtanan, bi derfetên aborî û yên moralî, ji malbatên kesên ku narkotîkê bi kar tînin re alîkar dibûn. «*Di nava 10 salên dawîn de, me li vê derê pênc hezar ciwanên xwe bin ax kirin.*» Hemûyan bi doza narkotîkê û bi şîdetê jiyana xwe wenda kiriye. «*Îro, di nava karê sektora tendurustiyê de, ya tendurustiya psîkiyatrîk de, xercên ji bo karmendên girtîgehan, programên metadon û yên şiringayên wan, xercên xebatkarên sosyalê, yên xebatkarên taybet ku di warê narkotîkê de dixebitin, yên memûrên komeleyan, yên dermanxaneyan, yên girtîgehên ku penaber lê dimînin, bêyî ku em pereyê ku ji aliyê derên din yên cur be cur ve tê wergirtin bihesibînin, li Glasgowê, kara herî zêde ji sektora narkotîkê ye.*» Jim baş dizane bê ka, çi dibe bila bibe, bêkariya heyî dê bibe sedema çi. «*Du kurên min, bîst û pênc (25) salan hogirê eroînê bûn. Nuha, ez hewl didim ku herdu zarokên xwe ji vê xirabiyê xilas bikim*», ev gotin ji devê Ian Duncan Smith derdikevin ku destê wî di nava qutiya tûtinê de ye, di dema bihurî de berpirsiyariya muhafezakaran kiriye, niha slogana siyasî a «*Brîtanya xerab bûye*» diavêje. *Think tank*’a muhafezakaran *Centre for Social Justice* gellek caran Doherty kişandiye nava niqaşan.

Di 2007’an de, Smith hatiye taxa wî û tev li cenazeya ciwanekî bûye, piştre bang li vî kesê teqawîtbûyî kiriye. Bêyî ku agahiyê bide çapemeniyê, ew hatiye vê derê ji bo ku rewşa Brîtanyaya xirabbûyî fahm bike, jê dersê wergire û bingehekî ji bo afirandina exlaqî çêbike ku jê re dibêjin «*çanda alîkariya dewletê*». Doherty tîne bîra xwe ku “*rojekê Duncan Smith ji min pirsî ka çawa mirov dikare li taxa Parkheadê gengên muhafezakaran zêde bike. Min jê re got ku heya ku Margaret Thatcher bijî, partiya muhafezakar nikare ji van taxan dengekî jî werbigire. Ev rewş encama wan xebatên wê ye ku wê bi xwe, dema ku seroka partiya muhafezakar ya Brîranyayê bû, kirine. Heke cîhên şêniyan nehatibûna guhertin, karxane nehatibûna girtin, bi awayekî girseyî karker ji kar nehatibûna derxistin, em ê îroj di vê rewşê de nebûna. Çendî têkiliyên min bi Duncan Smith re hebin jî, ez çepgirekî orospî me. Dibe ku ew kesekî durust be jî, lê belê tu carî ez ê dengê xwe nedimê.*”

Wergera ji fransî: Ahmet Dere

1- Bixwîne: James Chapman, «Work or lose your benefits: Iain Duncan Smith heralds biggest shake-up of welfare state since the war», *Daily Mail*, London, 28 gulan 2010

## Belçîka: piştî serkeftina N-VA'yê di hilbijartinan de

# Nasyonalîzma flamanî ku ji motîfên nasnameyî bêtir xwedî bingehekî civakî ye

Serge Govaert *

«Nil volentibus arduum» (dilê mêrxas astengan nas nake): Bart De Weverê, serokê Nieuw-Vlaamse Alliantie (N-VA, Hevpeymaniya Nû ya Flamanî), şeva 13'ê Hezîranê, li Brûkselê, bi vê hevoka bi latînî dest bi beyana serkeftina xwe kir. Bi bîst û heft ji sed kursiyên parlamentoyê û neh ji çil kursiyên senatoyê ku wê rojê di parlamentoa federal a Belçîkayê de bi dest xistin, partiya wî bû girîngtirîn hêza siyasî a li vî welatî. Hevokeke weha ku tîpên pêşiyê yên peyvan pir bi zîrekî hatiye hilbijartin.

Çalakvanî û kampanyaya N-VA'yê ya heyama hilbijartinan, ku xwe li ser nasyonalîzma flamanî dide naskirin, qet nebe bi qasî rêya dûr a ku ew jê hatiye balkêş e. Partiya ku li ser kavilên Volksunie'yê (Yekîtiya Gelî) di 2001'ê de ava bû, wê çaxê bi tenê kursiyek hebû di Meclîsa temsîlkeran de -bi tenê û yek parlamenter-, Geert Bourgeois, ku du sal berî hingê li ser lîsteya partiya Volksunie'yê hatibû hilbijartin ku ew partî jî di nav heyameke kurt de belav bûbû. Geert Bourgeois'ê ku di 2003'an de careke din hate hilbijartin wek tenya nûnerê partiya nû ma di parlamentoya federal de. De Wever di 2004'an de dibe serokê wê, di demekê de ku Bourgeois wek wezîr bo hikumeta flaman tê destnîşankirin. Ne tenê wî karî partiya xwe ji marjînaliyê derxe belkî ser ket ku baştirîn dengên ku heta hingê nasyonalîstên flaman di hilbijartinên federal de bi dest nexistibûn bîne ji partiya xwe re.

1971'ê, kalikê partiya wî, anku Volksunie, gava di lûtkeya heyama xwe de bû, % 18,8'ê dengên flaman wergirtibûn. 13'ê Hezîranê N-VA'yê meydan bi wergirtina % 28'ê dengan ramalî. Hêj jî ew ne tenya fraksiyona nasyonalîst e ku li parlamentoya Belçîkayê tê temsîlkirin: digel Vlaams Belangê, ku di 1978'an de ji dubendiyeke rastgirên tûndrew û kzenofob ên ji Volksunie'ê cudabûyî saz bûbû, qet nebe % 40 ji hilbijêrên flamanî dengên xwe dane partiyên ku heta heyameke dirêj doza serxwebûna Flandrê dikin.

Seyr e, piştî duyem şerê cîhanî êdî nasyonalîzma flamanî li rûyê siyasî ve bi temamî miribû. Ji ber ku digel dagîrkeran hevkarî kiribûn, êdî li Belçîkayeke ku ketibû jêr tesîra reflekseke welatparêziyê li dû pênc salên desthelata Naziyan, nema dikarî dengê xwe bide bihîstin. 1954'ê, digel vê hindê jî, Volksunie'yê pê çêbû hilbijartiyekî bişîne parlamentoyê. Pişt re, pêşveçûn û tekamûla wê ya di hilbijartinan de pirr hêdî ye, lê belê di nav çarçoveya dubendiyên siyasî de, ku her mezintir dibin di navbera Wallon (û bi gotineke giştîtir, fransîaxêvan) û Flamanan de. Rêveberên wê daxwaz û merema xwe ya reformkirina saziyan ji bo pêkanîna dewleteke federal a Belçîkayê venedişartin. Dizanîn ku, ji bo gihiştina wê derê, pêwîst bû beşdariyê di rêveberî û îktîdarê de bikin û gava hat bizanin tawîzan jî bidin. Ne ku bêyî zehmetî, lê piştî hilbijartinên 1977'ê digihine wê armanca xwe.

Lê belê ev yekem beşdariya di hikumetê de ji bo wan bêtir dibe têkçûnek: reforma ragihandî bû sebebê nerihetiyê bi taybetî di nava tevger û pêkhateyên flamanî ên tûndrewtir û Volksunie'ê de. Lewre di hilbijartinên 1978'an de piştî bi lihevkirinê ketine nava refên birêveberiya Belçîkayê, nîvê hilbijêrên xwe ji dest dan ku ev yek jî li dû belavbûna Senatoyê çaverêkirî pêk hat. Herweha hingê pareke terefdarên xwe yên herî muhafezekar jî ji dest dide ku ew par jî bi rexê xwe ve hevpeymaniyeke digel şexsiyetên rasta tûndrew dadine û Vlaams Blok'ê -sala 2004'an dibe Vlaams Belang- ava dike.

Ji dawiya salên 1980'an ve, paşdeçûna bere bere ya Volksunie'yê hevterîb e digel bilindbûna hêza Vlaams Blok'ê. Bernameya wê pê de pê de bi cih bû -hinek caran digel, gelek caran jî bêyî wê. Belçîka di 1993'an de bi awayekî resmî bû dewleteke federal. Di çarçoveyeke komalayetî de ku koçberî her zêdetir dibû û parçeyê başûrî yê welatî (frensîaxêv) her bêtir feqîrtir lêdihat, teleb û daxwazên Vlaams Blokê yên serxwebûnxwaz û zenofob dibin xwedanê bandor û sîtaveke her mezintir li Flandrê. Vlaams Blok bi awayekî pirr aşkere doza xelasbûn û jibeynçûna Belçîkayê û avabûna komareke flamanî dike. Bi ya wê partiyê, «gelê flaman» heye ku bêpar e ji dewleteke, yekgirtî ye bi xêra nirxên çandî -hetta dînî- û bi zimanekî hevbeş (hollendî); gelekî ku homojeniya wî ji ber biserdehatin û zextên îslamê ketiye xeterê, û herweha dewlemendiya wî ketiye ber însafa transferên fînansî yên ku ber bi welatê Wallonê têne kirin. Xwe li sloganeke navdar a derdorên nasyonalîstên flaman ên navbera du şerên cîhanî dike xwedan: «Volk, wordt Staat!» (Gelo, bibe dewlet!).

Beramberî vê, sebebê hebûna Volksunie'yê -avakirina federasyonêdiyar e firriyabû û şûn lê nemabû. Encamên wê yên hilbijartinan jê re tabloyeke tirsnak derdixin; hilbijêr û mîlîtanên wê dev jê berdidin heta digihe wê dereceyê ku paşdeçûn û zeîfketina partiyê bi çavên rût jî tê dîtin. Sala 1992'an, serokê wê Jaak Gabriels, digel hejmareke din a rêveberan, digihe lîberalên flaman. Ji 1992 heta 1997'an, serokê partiyê Bert Anciaux hewl dide partiyê bixe ser rêyeke bêtir bi xeteke çepgir. Ev yek jî bi tu awayî kêmketina terefdarên wê çare nake di demekê de ku Vlaams Blok bi biryardarî dide ser rêya xwe û her ku diçe bihêztir dibe. Sala 2004'an, Blok digihe % 24'ê dengan li Flandre'ê. Axirî di 2000'an de, Anciaux cihê xwe dihêle bo Bourgeois, anku bo fikr û hizrên bêtir muhafizekar. Ji hemû caran zêdetir nerihetî û dubendiyên navxweyî zererê digihînine Volksunnie'yê.

Çawa N-VA'yê, mîratgirê vê partiya mirî, karî di nava kêmtir ji deh salan de bibe yekemîn partiya Flandre'ê li Belçîkayê? Diyar e ku ji aliyê taktîkan ve pêngava yekemîn di 2004'an de temam bû. Wê salê, anku sê salan berî hilbijartinên federal ên Belçîkayê, fraksiyoneke din, Partiya Demokratên Xrîstiyan (CD&V), ku ji 1999'ê ve ji koalîsyonên hikumetan hatibû vederkirin, biryarê digire helwêstên xwe yên hişk sist bike û bi vî rengî hevpeymaniyekê bi rêk dixe bi N-VA'yê re. Nexşeya wan digihe armanca xwe: ev hevpeymanî derfetê dide demokratên xrîstiyan ku piştî hilbijartinên 2007'an careke din para xwe ji desthilatê wergirin. Yves Leterme (CD&V) wek serokwezîr tê destnîşankirin.

Lê belê, bi îdiaya ku reforma saziyan tê astengkirin û rê li ber daxwaz û planên wê yên bidestxistina otonomiyeke firehtir ji bo Flandrê tê girtin, N-VA'yê di îlona 2008'an de piştgiriya xwe ji hikumetê kêşa. Axirî, koalîsyona heyî nema xwedanê pirraniyê ye di baskê flaman de. Koalîsyon li dû vê qewimînê jî dikarîbû berdewam bibûya (lewre hêj jî xwediyê pirraniyê ye di Meclisa Senatoran de), lê bi awayekî lawazketî. Ev yek daketin û belavbûna koalîsyonê bi lez dike û pê li pişka hilbijartinên çaverêkirî yên 13'ê hezîranê dike.

Serkeftina N-VA'yê qismen xwe dispêre hêvîşkestên ji realîteyekê derhatî: Flamanên ku ji bo nifûsa xwe pirranî ne, di navbera 2007 û 2010'an de qîma xwe pê anîn ku bi destê hikumeteke federal a weha bêne birêvebirin ku di bin serokwezîriya yekî flaman de bû (wekî ji 1978'an ve dibe) lê belê piştgiriya xwe zêdetir ji hûrdeparçeyên bakurê welatî werdigirt. Bi gotineke giştîtir, raya giştî ya flaman naxwaze qebûl bike ku daxwaz û dozên wê li vetoyan dialiqin, ku bi ya wan ev yek bi awayekî sîstematîk bi destê mînorîteya frensîaxêv tê kirin. Diyar e serokê N-VA'yê biryar daye ku li ser vê pêlê bilîze.

> ***Ji serxwebûna xwe ya di 1830'an de heta bi nîvê sedsala XX'an, Belçîka li jêr serdestiya bûrjûwaziyeke frensîaxêv jiya ku wê bûrjûwaziyê bo demeke dirêj, çi di zagonan de û çi di praktîkê de, bikaranîna frensiyê wek zimanê resmî da sepandin.***

Dûr ji nasyonalîzma flaman ku bi tenê li ser hestên dîrokî ava bûye, an jî li ser daxwazeke otonomiyê ku xwe dispêre hebûna pêleke «nasname»ya flamanî, De Wever gotarek [dîskûr] da pêş ku bêguman xwedanê karîgeriyeke bêhisab mezin bû: «*Belçîka*, wî bi zimanê fransî diyar ku li pêş çapemeniya navneteweyî, *bûye jûkstapozîsyona* [danana du objeyan li rex hev bêyî ku temaseke wan hebe] *du demokrasiyên cihê*» [1]; du rayên giştî ku hevdu xirab nas dikin, ku êdî nema hev fahm dikin û xwedanê bendewariyên siyasî yên ji hev cuda, hetta dijber in. Flandreke ku bara pirrtir dengê xwe dide partiyên rastgir û Walloneke ku berê dengên wê bi çepgiran ve ye.

Cuda ji Vlaams Belang, N-VA û De Wever paytextê welatî ku di resmiyetê de duzimanî ye, naxine jêr pirsyaran. Lê belê, ji ber ku Destûra Belçîkayê ji bo «herêma-paytext» statuyeke otonomiyê ya mîna Flandr û Wallonê terxan kiriye, ew dozê lê dikin ku di dahatûyê de bi destê Flaman û Wallonan ve bê rêvebirin, lewre bi ya wan, kêşeyên wê yên darayî ji bêtevgerî û bêjîndariya siyasî ya ji ber statuya wê ya taybet rû didin. Herweha, Brûksel bi tenê li ser kaxezan duzimanî ye. Di rastiyê de, zêdetir ji sed netewe û hind jî ziman tê hene, lê belê parte-siyasiyên frensîaxêv li wir, bo hejmara hilbijêran, pirraniyeke mutleq di destê xwe de digirin.

Qadeke din a şerrî ku serokê N-VA'yê xwe dide ber û naverokeke pirr dûr ji nasyonalîzma flamanî a klasîk dide mesaja wî ya siyasî ew e ku buhayê Belçîkayê giran e û pirr bedmesref e. De Wever xwe ji wê hindê baş diparêze ku berpirsiyariyê bixe stûyê Wallonan an jî frensîaxêvan: Ji bo wî bes sersebebek heye, ew jî bêkarîgeriya sazî û dezgehên federal e. N-VA bi hûrtir pê de diçe, «*sîstemeke konfederal a wisa pêwîst e ku navenda biryargirtinê ji Dewleta federal wergire û bide ber destên Dewletên federe* [2]».

Herweha, serok û partiya wî bêyî tu kompleksekê xwe di nava refên baskê rastgir de terîf dikin. De Wever bi xwe heyraniya xwe bo fîlozofê îrlandî Edmund Burke (1729-1797) diyar dike ku yek ji avakerên muhafezekariya modern û dijberê îdealên şoreşa frensî yê aşkere ye. Berevajî Volksunie'ya ku carinan li ser hinek meseleyan helwêst û pozîsyonên bêtir ber bi rexê çepê ve digirtin, N-VA berevajiyeke aborî û civakî ya bi aşkereyî lîberal dide ber xwe: herêmîkirin, daxistina bacên şirketan, wergirtina bacên serbixwe ji bo sîgorteya tendurustiyê, nedamezrandina karmendên nû li şûna yên ku teqawîd dibin an jî derdikevin, bisînorkirina alîkariyên bêkariyê bere bere, sext û zehmetkirina zagonên di derbarê biyaniyan de û hwd.

Pêwendiyên wê digel Vlaams Belangê bi xerabiya xwe navdar in. Derveyî baweriya nasyonalîst, N-VA'yê hîç alî û taybetiyeke muşterek nîne

digel vê partiya rastgirên tundrew. N-VA lîberal e; Vlaams Belang dijminê dexaleta dewletê di aboriyê de nîne bi şertê ku ew mudaxele xizmetê li parastina berjewendiyên xebatkarên flaman bike. Wekî pirraniya partiyên flaman, N-VA jî girîngiyeke pir mezin dide ser pêwîstiya entegrekirina koçberan; bi ya VB'yê îmkana vê entegrekirinê nîne, lewre bi ya wê hevahengiyeke civakî bi awayekî çêkirî durust nabe. VB dixwaze ku, li ser navê rêzgirtina li nirxên rojavayî, naskirina herêma îslamî ji layê dewletê ve bê betalkirin, û herweha doza wê hindê dike ku hindek ji grûbên koçberan bêne dersînorkirin. Dijminatiya Yekîtiya Ewropayê dike, herçî N-VA ye, ew piştgirê wê ye. Wekî xala dawî, di warê etîk û exlaqê de jî gelek muhafezekar e, bi taybetî dijminê fikra azadkirina kurtajê an jî zewaca homoseksuelan e. Du ji hilbijartiyên nû yên N-VA'yê bi rêzê ji binyadên fasî û tirk in, ku hema îmkana fikirîna tiştekî weha nabe di nava refên Vlaams Belangê de.

***Bi gotineke din, N-VA'ya îro, ku bi pragmatîkbûna xwe serbilind e, serê xwe ji cawê nasnameya hilbijêrê flamanî bêtir bi bêrîk û cuzdana wî re diêşîne. Serkeftina wê digel xwe rêzeke pirsiyaran jî tîne. Pêşî, hebûna vê partiyê serbixwe nîşaneya tekamûl û veguherîna nasyonalîzmê dike li ser zemînê Ewropayê.***

Diyar e ku qutbûna hevgirtinên dewletî û hevgirtinên di navbera dewletan de zêdetir terefdaran li dora xwe berhev dike, û ne tenê li Belçîkayê. Li Awûstûrya, li Lombardie (Italya), li Katalonyayê (Spanya) -carinan (lê ne hergav) li herêmên ku çep ji layê sazîbûnê ve lawaz e ji ber endustriyalîzasyoneke derengketî-, terefên cuda wisa difikirin ku erd û welatê wan di bin gefa paytextên dûr de ne ku bi ya wan ew paytext erd û samanê wan hişk dikin, ji wan distînin û didin herêmên feqîrtir ên heman welatî. Bi kurtî ew doza awayekî herêmî ya prensîba thatcheryen dikin «*I want my money back*» (Ez dixwazim pereyê min li min bê vegerandin).

Bi dû re, ev serkeftin tê wateya nerehetiyeke aşkere bermaber elîtên siyasî. De Wever terzeke «rastgotiniyê» anî meydanê û ev jî derfetê dide wî ku gava axaftineke bi prensîbên lîberal û asayîşparêz dagirtî jî dike jî, hilbijêrên herî ciwan cezb bike.

Divê em wê xalê jî lê zêde bikin ku tenya parlamenterê Ewropayê yê ji N-VA'yê, ku di 2009'an de hatiye hilbijartin, di parlamentoyê de di nava koma hilbijartiyên Kesk/ALE de rûdine, li rex temsîlkerên partiyên din ên serxwebûnxwaz ên wek SNP'ya skoçî an jî Plaid Cymru'ya Walesê, lê herweha ekolojîparêzên Belçîka û Fransayê.

Serkeftina N-VA'yê çepa flaman (li Flandrê, Kesk û sosyalîst herdu pêkve bi zor % 20'ê dengan werdigirin) vedixwîne kontrol û nirxandina nexşe û şiûra xwe. Çawa dibe ku, di heyama qeyrana aborî de, gava ku bêkarî zêde dibe li Flandrê (herçend rast be ku nagihe asta bêkariyê ya li Wallon û Brukselê), ku dewlet pirr bi giranî ketiye bin deynan û ferq û cudayiyên [ne-yeksanî] civakî her ku diçe zêdetir diyar in, û hikumeta Belçîkayê sê sal berê dirûvê şêlûbêl û aloziyeke giştî dabû, partiyeke xwedan qerektereke populîst dikare rabe û bibe navnîşana çareseriyê ji bo nerehetî û nerazîbûnên gelî?

* Rêveberê Centre de recherche et d'information socio-politiques (Crisp: Navenda lêkolîn û zanyariyên sosyo-polîtîk), Bruksel.

Wergera ji fransî:
Ergîn Opengîn

1- Pres-konferans, 8 hezîran 2010 li Brukselê

2- Heman pres-konferansa navhatî



Antonio Saura
*La Processionaire*, 1983

# Li gorî Mandela Incîl

ALAN GRESH

"Qehremanekî serdema me" sernavê hejmareke taybet a *Courier International* (Hezîran-Tebax 2010) bû. *Le Nouvel Observateur* (hejmara 27'ê Gulana 2010'an) bi sernavê "wî dîrok guherî" li wê zêde kir. Herduyan jî portreyê Nelson Mandelayê dibeşişe di rûpela serî de bi sernivîsên xwe re weşandin; ev herdu serrûpel şahidiya heyraniya yekdengî dikin ku filmê *Invictus* yê ku Clint Eastwood derhêneriya wî kiriye asta wê ya herî jor bû. Bi Kûpaya Cîhanê ya futbolê re tevahiya dunyayê ketiye nava kulta pêxemberê vîzyoner yê ku şiddet red kiriye, yê ku ber bi welatekî soza wî dayî ve pêşengiya gelê xwe kiriye, li wî erdî reş, melez û spî di nava hevdengiyê de dijîn. Girava cezayan ya Robben Islandê, cihê ku ew kesê hevalên wî jê re dibêjin Madîba, gelek salan lê girtî mabû û ji bo mêvanên biyanî cihê tewafê yê mecbûrî ye, "bêriyeke" hinekî zelûl tîne bîra mirov, a dema apartheida rûreş ku bi tenê dikare bibe sedema şermezarkirineke gerdûnî û di serî de ya demokrasiyên rojavayê.

Ev kêm zêde du hezar sal çêbûn ku Îsa di çarmixê de mir. Gelek lêkolîneran li ser lihevkirina Îsayê Incîlê û Îsayê dîrokî, lêkolîn kirin. Em di derbarê jiyana dunyewî ya "kurê Xwedê" de bi çi dizanin? Kîjan belgeyên me hene ku em dikarin pê weazên wî bişopînin? Bûyerên ku di Incîlê de cih girtine, gelo bawerî bi wan tê? Mirov dikare bawer bike ku hêsantir e "Mandelayê dîrokî" fahm bike, lewra li ber destê me, Incîleke bi destê wî hatiye nivîsîn heye [1] û her weha gelek şahidiyên yekser jî. Û dîsa jî efsaneya Mandela, eger ne bêhtir be, bi qasî ya Îsayê Incîlan, dûrî rastiyê xuya dike, ewqasî ku mirov gellekî bi zehmetî lê mikur tê ku Mesîhê nû "terorîstek" bû, "hevgirekî komunîstan" û Yekîtiya Sovyetan (yê "goulag"ê), şoreşgerekî biryardar bû.

Kongreya Neteweyî ya Afrîkî (ANC), hevgirê stratejîk yê partiya komunîst a Afrîkaya Başûr, piştî komkujiya li bajarê Sharpville ya 21'ê Adarê ku tê de bi dehan mirov hatin kuştin, sala 1960'î kete nav şerrê çekdarî; reşan li dijî sîstema pasaportan xwepêşandan li dar dixist (pasaporta hundirê welatî). Mandelayê ku heta hingê têkoşîna legal ji xwe re esas digirt, hingê bawerî bi vê anî: hindikahiya spî wê tu carî bi awayekî pasîf ji hêza xwe û îmtiyazên xwe gavan bi paş ve neavêje. Di dema pêşî de ANC'yê sabotaj li pêş girtin, ANC'yê sîleha "terorîzmê" jî bêguman bi kar anî, xwe jê neda alî ku hin bombeyan di kafeyan de bi cih bike.

Madîba sala 1962'an hat girtin û ceza lê hat birrîn. Ji sala 1985'an û pê ve gelek pêşniyarên berdana xwe yên bi berdêla terikandina şîddetê red kirin. Di bîranînên xwe de weha dinivîse "*hê jî ne bindest lê zordar şêwaza têkoşînê diyar dikin. Eger zordar şîddetê bi kar bîne, ji bilî bikaranîna şîddetê tu rêya din li pêşiya yê bindest nîne.*" Û bi tenê vê yekê seferberiyeke her çû zêdetir bû ya gel û desteka sîstemeke cezakirinê ya navneteweyî ya bi demê re zor li sîstema apertheid kir, kire dewrê ku karîbû pûçbûna sîstema zordar nîşan bide û kir ku desthilatdariya spî poşman bibe. Prensîpa "yek zilam, yek deng" a qebûlkirî, Mandela û ANC'yê diviya êdî nermbûna xwe di pêkanîna "civaka pirreng" de û di garantiyên bidin hindikahiya spî de, îspat bikira. Wan dewam kir tevî – lê belê ev meseleyeke din e – dûrketina ji projeya xwe ya veguherîna civakî.

Yekîtiya Sovyetan û "kampa sosyalîst" alîkariyeke maddî û manewî da stratejiya ANC'yê. Gelek kadroyên wê li Moskova an jî Hanoî hatin perwerdekirin. Şerr belavî tevahiya Afrîkaya Başûr bû. Artêşa Afrîkaya Başûr dixwest li vira hegamoniya xwe pêk bîaniyaya. Li Angolayê mudaxeleya artêşa Kubayê ya sala 1975'an û serkevtina vê mudaxeleyê, serkeftina li Cuito-Cuanavale ya di çileya paşîna 1988'an de bi xwe re anî ku vê bûyerê dê destek bidaya şikandina mekîneya şerrî ya desthilatdariya spiyan û piştrastkirina nederiya rêya ku ev desthilatdarî tê de ye. Li gorî Mandela şerrê Cuito-Cuanavale "*di azadiya parzemîna me û gelê min de werçerxek*" [2] bû. Diviyabû ew vê ji bîr neke û sala 1994'an wî serokê Kubayê Fidel Castro kire yek ji mêvanên rûmetê yê merasîma destpêkirina serokdewletiya xwe.


Di vê şokê de di navbera pirraniya gel û desthilatdariya spî de Dewletên Yekbûyî, Brîtanya, Îsraîl û Fransa (ew bi xwe heta 1981'ê) di şerrî de "aliyê xirab" girtin, li ser navê têkoşîna li dijî xetereya komunîst wan aliyê parêzvanên rejîma apartheidê girt. Di salên 1980'î de zilamê serokê DYA'yê Ronald Reagan yê kilîd ku di warê siyaseta "angajmana avaker" ya başûrê Afrîkayê de dixebitî, Chester Crocker bû. Crocker weha dinivîsî: "*Bi awayekî xwezayî û bi dîroka xwe ve, Afrîkaya Başûr parçeyek ji tecrûbeya rojavayê ye û ew bi tevahî parçeyekî ekonomiya rojavayê ye.*" (*Foreign Affairs*, zivistana 1980-1981). Washingtona ku sala 1975'an li Angolayê destek da Pretoria (paytexta birêvebeiya Afrîkaya Başûr), xwe jê veneda ku ambargoya sîlehan a li ser Afrîkaya Başûr binpê bike û bi awayekî fireh hevkariyê bi rêxistina îstîxbaratê ya Afrîkaya Başûr re bike û pê re jî her red kir ku tevdîra zorê li desthilatdariya spî bike. Li benda beridîneke bi demê re, bang li pirraniya reş hat kirin ku nerm be.

22'ê Hezîrana 1988'an, 18 mehan beriya azadkirina Mandela û legalbûna ANC'yê, musteşarê wezareta karê derve ya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê John C. Whitehead li pêşiya komîsyoneke senatoyê weha dipeyivî: "*Divê em qebûl bikin ku veguherîna ber bi demokrasiyeke ne nijadî ya li Afrîkaya Başûr, wê ji ya ku em hêvî dikin bêhtir wext lê biçe." Ew bi zanîn wisa nîşan dide ku kirinên cezayî wê tu "bandora bêmoralkirinê li elîtên spî*" neke û ev tedbîr di serî de dê welatiyên Afrîka Başûr ên reş ceza bikin.

Di sala dawî ya erka xwe ya serokatiyê de Ronald Reagan careke din bêyî ku bi ser bikeve hewl da pêşiyê lê bigire ku Kongreya Amerîkayê rejîma apartheid ceza bike. Ev, ew dem bû ku wî "şervanên azadiyê" yên afgan û nîkaraguwayî pîroz dikirin û terorîzma ANC û Rêxistina Rizgariya Filistînê (PLO) rûreş dikir.

Brîtanya jê kêmtir nedima; hikumeta Margaret Thatcher heta azadbûna Mandela ya di sibata 1990'î de hevdîtina bi ANC'yê re ji binî ve red dikir. Dema civîna bilind a li Commonwealth de Vancouver a Cotmeha 1987'an, Thatcher li ber qebûlkirina kirinên cezayî rabû. Dema ku li ser gefên ANC'yê yên derbkirina berjewendiyên brîtanî yên li Afrîkaya Başûr pirs jê hat kirin, wê ev bersiv da: "*Ev nîşan dide ka* (ANC) *çiqasî rêxistineke terorîst a besîd e*". Di vê serdemê de komeleya xwendekarên muhafezekar a girêdayî partiya Thatcher posterên li ser wan weha nivîsandî belav dikirin: "*Nelson Mandela û terorîstên ANC'yê hemûyan bi dar ve bikin! Ew qatil (qesab) in.*" Serokwezîrê nû yê muhafezekar David Cameron biryar da ku ji bo vê helwestê di sibata 2010'an de lêborînê bixwaze! Belê karê çapemeniyê hêsan bû, bi bîra wî ve xist ku ew bi xwe bû yê ku li ser vexwendina lobiya li dijî kirinên cezayî yên li dijî rejîma apartheidê, sala 1989'an çûbû Afrîkaya Başûr.

Îsraîl heta dawiyê weke hevgira dilsoz ya rejîma nijadperest a Pretoriayê ma. Sîleh dan rejîmê û alîkarî dayê da ku bernameyên xwe yên eskerî yên nukleer û fuzeyan bi pêş ve bixe. Di nîsana 1975'an de serokkomarê Îsraîlê yê nuha Shimon Peres, wê demê wezîrê parastinê bû, peymaneke ewlekariyê ya di navbera herdu welatan



de mohr kir. Salek bi şûn de, serokwezîrê Afrîkaya Başûr Balthazar J. Vorster, ku kevnesempatîzanekî naziyan e, bi rûmeteke mezin li Îsraîlê hat pêşwazîkirin. Rayedar û berpirsiyarên rêxistinên îstîxbaratê yên herdu welatan her sal li hev diciviyan û şerrê li dijî "terorîzma" ANC û PLO'yê kordîne dikirin.

Gelo Fransayê çi dikir? Fransaya General De Gaulle û rastgirên ku piştî wî hatin, têkiliyên ne tevlihev bi Pretoria re dewam kirin. Di hevpeyvînekê de ku ji aliyê hejmara *Nouvel Observateur* ya li jor behskirî hatiye weşandin, Jacques Chirac pesnê xwe dida ku ji berê ve piştgirî dida Mandela. Weke gelek kadroyên birêvebir ên rastgir, bîra wî jî lawaz û kurt e – û rojnamevanê ku hevpeyvînê dike jî bêyî ku bikeve dudiliyê bîrokebûna wî qebûl dike. Chirac di navbera 1974 û 1976'an de serokwezîr bû. Hezîrana 1976'an Chirac peymana bi Framatome re ya ji bo avakirina yekemîn santrala nukleer li Afrîkaya Başûr qebûl kir. Li ser vê bûyerê edîtoriya rojnameya *Le Monde*'ê ev dinivîsî: "*Di nava komeke piçûk a hevalbendan de hevalên Franseyê yên ecêb hene ku Pretoria wan weke "ewle" dibîne*" (1'ê Hezîrana 1976'an). Rojnameya Afrîkaya Başûr a gellekî tê firotin Sunday Times'ê di rûpela pêşî de bi tîpên mezin sernavê "Bijî Fransa. Afrîkaya Başûr dibe hêza atomî" bi kar dianî. Ji ber zexta dewletên afrîkî, Parîsê sala 1975'an biryar dabû ku êdî sîlehan yekser nefiroşe Afrîkaya Başûr, lê belê hê gelek salan rêz ji peymanên firotina sîlehan yên di meriyetê de re girt. Di heman demê de panzerên wê Panhard û helîkopterên wê Alouette û Puma dê bi lîsansê li Afrîkaya Başûr bihatana hilberîn.

Tevî nîqaşên fermî yên şermezarkirina rejîma apartheidê, Parîsê heta sala 1981'ê, ji kêmasî ve gellek şêwazên hevkariyê bi rejîma nijadperest re dewam kirin. Alexandre de Marenches di navbera salên 1970 û 1981'ê de daireya belgekirina karên derve û dijsîxurtiyê (SDECE) bi rê ve dibir. Wî bi kurtî felsefeya rastgirên fransî weha rave dikir: "*Apartheid bêguman sîstemeke weha ye ku giriyê mirov pê were, lê belê divê mirov bike ku bi nermî biberide.*"[3] Heger ANC'yê guh bidaya şîretên wan ên "nermbûnê" (yan jî şîretên Reaganê serokê DYA'yê), Mandela wê di girtîgehê de bimiraya, Afrîkaya Başûr wê noqî nav tarîtiya kaosê bibûya û dunyayê dê nikarîbûya efsaneya Mesîhê nû biafirandaya.

Wergera ji fransî:
Luqman Guldivê


1- *Un long chemin vers la liberté* (Rêyeke dirêj ber bi azadiyê ve), Fayard, Paris, 1995

2- Ronnie Kasrils, *Turning point at Cuito Cuanavale* (Li Cuito Cuanavale werçerx), 23'ê Adara 2008'an, http://www.iol.co.za/

3- Christine Ockrent, Alexandre de Marenches, *Dans le secret des princes* (di nava sirr û raza mîran de), Stock, Parîs, 1986, rûpel 228

# Gelo Afrîka bêyom e?

JEAN MICHEL DJIAN



YAHIA SILO, *Afrîkî*,100 x 120 cm, Boyaxa rûnî ya ser tûwalê

Nivîskarê Afrîkî Moussa Konaté di pirtûka xwe ya dawî de berê xwe dide serokên afrîkî û di rexneyên xwe de îddîa dike ku wan Afrîka zêde kirine ewropawarî û ev rewş jî bandoreke neyînî li parzemîna reş dike. Nivîskar ji bo ku balê bikişîne ser mijarê vê pirsa balkêş dike: «*ji bo ku qêrîn û hawara kesekî were bîhîstin an jî ji bo ku mirov were fahm kirin, ma hewce ye ku mirov kêrê bi dijwarî di birînê de bade?*» Michel le Bris (patronê festîvala St Malo) di wê baweriyê de ye ku ev pirs rast e. Lewma navê ku li mijara rojevê hatiye kirin "Lanet" e.

Nivîskarê ji Maliyê, bi zimanekî vekirî herweha balê dikişîne ser hin mijarên girîng û nazik yên herêmê. Weke durutiya (poligami) ferejinî, ango zewaca bi pir jinan re û karesatên civakî ku ji ber bandora olî û ji ber bertîlxwuriyê rû didin. Moussa Konaté ku yek ji nivîskarên Afrîka'yê yê herî xwedî tecrûbe ye, di hemû pirtûkên xwe de, çiqas jê tê, mijaran bi awayekî vekirî dikolê, berpirsiyaran destnişan dike û bi rexneyan diçe ser wan. Ew di wê baweriyê de ye ku êdî dem hatiye ku mirov her tiştî vekirî bîne ziman.

Nivîskarên afrîkî ku li parzemîna wan dawî li dagirkerî û mêtingeriyê nayê, herçend bifikirin ku tenê nivîsandina pirtûkan ji derdê wan re ne çareye jî, di çarçoveya karê xwe de hewl didin, balê bikişînin ser pirsgirêkên li welat û li parzemîna xwe. Ne tenê nivîskarên li hundur herwiha yên ku li her derê cîhanê belavbûne jî, bala wan tim li ser pêşketinên li welatê wan e û hew jî hewl didin bi nivîs û pirtûkên xwe neheqiyan bigînin rayagiştî ya navnetewî. Festîvala St-Malo bû wesîleyek ku nivîskarên ji Amerîka, Ewropa û Afrîkayê hatine vexwendin karibin li wê derê, hev bibînin, pirsgirêkan bi niherîna xwe par ve bikin.

Heta ku "bêyomiya"a li ser Afrîkayê dewam bike, qêrîn û hawara nivîskaran jî dê nesekine. Weke mînak: Eleonora Miano dibêje, "*pêdivî bi wîjdaneke nû ya polîtîk heye.*" Michel le Bris û Jean Rouaud'un ji pirtûkên weke «*Je est un autre*» (ez kesekî din e) re serkêşiyê dikin, ev jî nîşan dide ku ji bo perspektîvên nû, îmkan û derfetên wan ne kêm in".

Wergera ji fransî:
Bedran Dere



ISMET POLATLI, *Conega*
80 x 100 cm,
Teknîka tevlihev ya ser tûwalê

## GLASGOW

# Jiyana dewlemendan li bajarekî xizanan

JULIEN BRYGO

*«Hûn difikirin ku klûbên taybet ji derdorên elît re hatine veqetandin? Ji bo dewlemendan? Ji bo kesên xwedî îddîa? Bi awayekî giştî hûn mafdar in. Ev sedema hebûna me ye?»* Di navbera dikaneke fîstanên zewacê, leystokên ji bo derdorên dewlemend û buroyên xebata bazirganan de, Glasgow Art Club, di sîteya bazaran de, weke «*tiştekî Glasgowê yê veşartî û herî baş haiye parastin*» xwe dide pêş. Deriyê vê mala mezin a bi stîleke serkeftinê, bi ser sê odeyên fireh vedibe, ji van odeyan, mêvan derbasî salona mezin dibin. Her hefteyê, derdorên bijare, li vê klûbê hevdu dibînin.

Rotary Club'a Îskoçya'yê, ya herî kevin ku di sala 1912'an de hatiye damizirandin, li wê derê, bi armanca bipêşxistina niqaşên cur be cur û balkêş, civînekê li dar dixe ; li dereke weha hatiye sazkirin ku navê wê «artîstên amator» e û di nava demeke şoreşa pîşesaziyê de, ji aliyê ressameke ciwan hatiye avakirin, ku bazirganên qumaş, ên şekir û ên koleyan muşteriyê wî bûn. Li vî cîhê taybetî, ev derdor silavê li hevalên xwe, carinan jî, bi armanca dozeke baş ku bibe sedema niqaşan, kîsê pereyên xwe derdixin û xwe didin nîşandan.

Michael Guy'ê ku bi awayekî rehet li ser kursiya xwe rûniştiye, radibe, bi vir de û wê de xwe amade dike, milê xwe ên reş radike, bi awayekî nezan toqmaqî li zengilê zîv dixe. Vê roja 22'ê hezîrana 2010'an, saet 13 ye. Bi awayekî berbiçav xwarina nîvro dest pê dike. 40 mêvanên rojê -rayedarên bankeyan, xwediyê fîrmeyên sîgorteyan, parêzer û birêvebirên fîrmayên cur be cur - hemû bi hev re radibin ser xwe, li pêşiya Qralîçeyê xwe ditewînin, pişt re jî li pêşiya Guy'ê 67 salî ku ji ber qolyeya giran ku li ser wê navê 98 serokên beriya wî nivîsandî ye û heya ser zikê wî daketiye, nerihet e. Beriya ku ew kêra xwe di nava roast beef de bike, bi devkenî, wî weha digot «*Buhayê vê qolyeya zêr dike 38 000 sterlîn (46 000 euros). Ha ji wê re buhayekî ku vê demê ne hindik e*».

Digel ku qolyeyê ew nerihet dikir jî, Guy naxweze bide der û, di derbarê xizaniya ku li taxên rojhilatê vî bajarê mezin heye weha digot: «*Belê, em dizanin: li Glasgowê, hin tax hene ku li wan deveran jiyan di binê ya li Îraqê de ye! Rewşa jiyanê, gunehkarî… Em dizanin. Li bajarê Glasgowê tim xizan û dewlemend li kêleka hev dijîn. Bi tenê koçberên îrlandî heman ast hinekî berjêr xistiye. Lê belê, ev zêde girîng nîne. Glasgow tim weke sîteyeke hejiyayî maye û li wê derê bêrîka xizanan vala ye. Li vî bajarî muzeyên xweş, konserên pirr awarte û kesên taybet hene!*»

Di meha tebaxa 2008'an de, Rêxistina Tendirustiya Cihanê (RTC) raporek weşand. Di heman raporê de tê gotin ku, li Glasgowê, di derbarê hêviyên ji bo jiyana zarokên taxên dewlemendan û ên taxên xizanên de ferqeke mezin heye. Di navbera taxên dewlemendan– li başûr û li rojava– û taxên xizanan- li rojhilat- ferqa jiyana zarokan digihêje 28 salan [1]. Ev rastî weha tê binavkirin «di navbera jenerasyonekê de mezelek heye», ev rapora ku ji aliyê lêkolînerên zanistiya civakî, bijîşk û siyasetvanan ve hatiye amadekirin, diyar dike ku di nava welatên Ewropayê de, hin taxên Glasgowê di warê sînorê jiyanê de xwediyê rekora herî kêm in: Ji bo zilaman 54 sal, ji bo jinan 75 sal. Pêşniyarên ku ji bo têkbirina vê kêmasiyê weha hatine rêzkirin[2] – bidestxistina xwarina bingehîn, (av, xwarin, cihê mayinê, derfetên bidestxistina dermanan, enerjî), herweha perwerde, çand, hînbûna jiyana bi hev re û şertên karî yên baş… –, vê raporê bandora bombeyekê çêkir. Ew bû sedema avêtina hin gavên girîng. Li gorî Guy, Peter Steven, «*yek ji endamên vê klûbê yên dewlemend e*», bi zehmetî li gotinên xwe digere. Di odeya ku tê de panoyên daran, ên buhayên wan bilind in, û derî li odeyên din vedibin de, demekê ew difikire û weha dest bi axiftina xwe dike: «*Çima di navbera hêviyên di nava jiyana dewlemend û xizanên vî bajarî de ewqas ferq heye ? Ji ber ku xizan baş xwarinê naxwin û ji bapîrên xwe tiştên xerab hîn bûne. Ev jî jiber kêmaniya perwerdehiyê ye. Em, weke Rotary Club, pirr kêfxweş in ku, di dibistanên taxên bajêr xizan de, çalakiyên weke pêşbirka perwerdehiyê, pêk bînin. Pirr ji wan kesên ku hûn behsa wan dikin, bi alîkariya dewletê dijîn, wekî din tu derfetên wan nînin. Ji bo wan kirrîna Fish & Chips, ji ya xwarinê pirr girîngtir e*!» Guyê ku kêr di destê wî de ye, pirr baş behsa vê xwarina skoçî «*Fish Supper* [3]» dike.

Çend saetan beriya vê xwarina weha fermî, serokwezîrê Brîtanyayê, David Cameron, projeya kêmkirina xercan, ku ji şerrê cîhanê vir ve, ev cara yekem e ku li Brîtanya'yê pêk tê, aşkere dikir: Ji nuha heya 2015'an 110 mîlyar euro wê were qezenckirin [4]. Ji bo ku sekinandina karê dibistanên taxên xizan li derveyê vê projeyê bihêle – 4,1 mîlyar euro –, wezîrê perwerdeyê, («education secretary»), Michael Gove, 4,7 mîlyon euro pêşniyar kir. Ev pere wê bi rêya rêxistineke alîkariyê ve were dayin ku navê wê Teach First Charity ye û armanca wê «*qanekirina profesorên baş e*», da ku ew di dibistanên taxên xizanan de kar bikin [5]. Bi destê rastê şûr digire, bi yê çepê jî sedeqê belav dike. Gelo bi vî awayî mirov dikare rewşa Glasgowê rave bike?



SEAN GROUNDWATER, *Abandonnées*
2008

George Russelê ku ji şîrketeke telekomûnîkasyona navneteweyî teqawît bûye, li ser podyûmê ye, bi alîkariya xwarina xwe ya bi çîqolatayê, ew li ser xwe ye, weha bangê dike «*bi rêya alîkariyeke baş*» li dijî «*Êrişa koalîsyona li ser desthilatdariyê ku li dijî xizmeta gel e*» rawestin. «*Digel kêmkirina alîkariya dewletê, a ku hatiye îlankirin, David Cameron hejmarên xwe li ser alîkarxwaziyê çê dike. Ji bo ku em bibin civateke homojen, divê em hemû rola xwe bileyzin. Divê kesên weke me, ên dewlemend, zêdetir fedekariyê bikin, ev rastiyek e û baweriyê dide derdoran*». George Russel gotinên xwe, bi «ciwanên sosyalîst» qedand. Lê belê, serokî dixwest bala me bikişîne ser pirsgirêkeke bajêr a din ku xweş dihate guhê me. «*Hûn dizanin, pirr kar dikêşe Glasgowê. Navendên bangewaziyê, şîrketên sîgorteyan, navendên xizmeta aborî… Bi taybetî sektoreke otelan ya baş heye. Di van nêzîkan de oteleke 5 stêrkî jî vebû, li kêleka ava Clyde'ê. Oteleke pirr xweş e…*»

Di navbera salên 1980-1990'î de, gemareke mezin, a ku ji şewata febrîqeyan derdiket û li ser Glasgowê belav dibû, bi xurtkirina alîkariyê hate paqijkirin. Pîşesaziya deryayê, kanên komirê û karsaziya hesinî hatibû xitimandin. (*bixwîne: «Fatoreya salên Thatcherê»*). Ji bajarê Skoçyayê yê herî qerebalix, bajarekî huner, çand û cudakariyê hatiye çêkirin. Modelkirina ji nû ve, makyaj, xurandin. Ji vira û bi şûn de hemû afîş, di nava tevahiya sîteya bazarê de û herweha li derveyî wê, bi vî awayî diyar dikin «*Glasgow, Îskoçya xwedan stîl*». «*Feqîr di nava taxên bajêr de, kom bi kom hatibûn bicîhkirin, malên wan ên şexsî, bi xêra Margaret Thatcher, a ku ruhê wê ji xaniyên sosyalê diçû, hatibûn firotin.* "Kapuçînoîzayson" *a Glasgowê, weke pêvajoya hevalbendiya pêşxistina şexsiyetê, dikaribû êdî dest pê bikiraya*», ev analîz ji aliyê Bridget Fowler, sosyologa zanîngeha Glasgowê, ve hatiye kirin.

Bîst salan piştî ku ev bajar navê «paytexta çandê ya Ewropa'yê» bigire, di sala 1990'an de, bajarê muhendîs Charles Rennie Mackintosh xwe weke yek ji sê paytextên hunera Ewropayê ya hemdem nîşan dida. Ev bajar hertim xelatan digire, («bajarê brîtanî yê muhendisiyê û dîzaynê» di sala 1999'an de), bala çalakiyên mezin ên sportîf û tûrîstên dewlemend dikişîne ser xwe [6], bi taybetî bi xêra 7 golfên taybetî û 5 otelên 5 stêrkî, ku xwediyê hezar û sê sed û pêncî û heyşt odeyên luks in. Dikeve serê mirov ku ew hevpeyvînên pesindariyê ku di çapemeniya ewropî de derdikevin berhev bike. Çapemeniya ewropî bi awayekî sîstematîk ji bîr dike ku, di nava jiyana rojane de cur be cur hêviyên jiyanê hene [7].

Çendî li Glasgowê rêjeya bêkariyê, ya mirina ji ber narkotîkê, ya ji ber nexweşiya kansêrê, û kuştina bi kêran pirr li jor be jî, li vî bajarî pirr dewlemendî jî heye. Sala 2007'an, hejmara 11 288 Glasgowî xwedan «karta milyonerên brîtanî [8]» bûn, ev hejmar di nava Brîtanyayê de xwedî cihê heftemîn bû. Bûrjûvaziya mezin ya Edimbourgê, bi 9.738 milyonerên xwe ve, tenê dikaribû 5 xalan ji wê dûr cîh bigire.

Çawa di bajarekî xizan de mirov dikare jiyaneke dewlemend bijî ? «*Ez ji Hîndistan'ê têm, ez dikarim ji we re bibêjim ku, mirov li rojhilatê Glasgowê dikare ji hîndûyan baştir bijî. Rewşa aborî ya xizanên Glasgowê ji ya dewlemendên Malawiyê baştir e!*» William Haugheyê ku 53 salî ye û mûltî mîlyoner e, di qata çaremîn ya împaratoriya xwe de, City Refrigeration Holding – împaratoriya ku di sektora çêkirina xaniyan de hatiye naskirin û di tevahiya cîhanê de 12 000 xebatkarên wê hene – di derbarê encamên RCT'yê de weha digot. «*Pirsgirêka xizaniyê û her weha ya tendurustiyê di van taxan de nîne. Em nikarin bi encamên xizaniyê van hejmaran şîrove bikin. Her weha ne bi sedemên civakî jî. Ez bawer im ku ji mêj ve ev pirsgirêk hene.*»

Di odeyekê de ku tê de çend xelatên wî hatine rêzkirin («Karmendê salê», «Xelata bajarê Glasgowê», «Karsazê salê»…), serdaneke kurt li Hîndîstanê, serdaneke kurt li Qatarê û du hefte tehtîla li Las Vegasê, li wê derê ew tev lî tûrnûvaya pokerê jî bûye, Haughey di derbarê çîna xwe ya civakî de diaxife. Ev zarokê ku di nava malbateke karkerên pispor de û di taxeke gelêrî de mezin bûye, piştî ku bûye endamê vê klûba girtî û ya çêkirina pereyan, pirr baş dizane di derbarê dewlemendan de biaxife. «*Mirovên ku pereyên wan pirr in, naxwazin ku kes di warê bikaranîna pereyan de şîretan li wan bike. Zêdekirina bacê*

*dê bibe xeteriyek. Ez bawer im ku divê kesên serkeftî û ên ku pereyên wan heye, ên wekî min, werin qanekirin. Belê, divê ew werin qanekirin ku ew tev lî alîkariya ji bo têkbirina xizaniyê bibin.* » Haugneyê ku xwediyê 120 mîlyon euroyan e [9], naxwaze ku kes jê re bêje ka divê ew çi bike. Wî proje çêkiriye ku li Glasgowê «*mezintirîn mala Skoçyayê çêbike*» – lê belê wî nikariye destûra çêkirina vê malê bigire –. Ew difikire ku, nêzîkî % 8'ê dewlemendiya xwe ya navneteweyî, ji bo alîkariya têkbirina xizaniyê bide.

«*Di derbarê xebatên me ên xêrxwaziyê de, em pirr napeyivin. Min bi rêya wexfa xwe a City Charitable Trust, nêzîkê 10 mîlyon sterling* [12 mîlyon euro] *daye xebatên alîkariyê*» Alîkariya ji bo zarokên neçar, çêkirina kaniyan û nexweşxaneyan li Afrîkayê, alîkariya ji bo dibistanên xizanan… Haughey, li Glasgowê û li Malawiyê, ji xwe re xaleke rûmeta «vegera nava civakê» çêkiriye. Herweha ew diyar dike ku, mehê carekê, ew «memûrê mehê û malbata wî» li vîllaya xwe ya luks a li Florîdayê, dike mêvan. Di van salên dawî de, wî xwe bi alîkariya ji bo rêxistineke di nava tengasiyê de daye naskirin ku ew jî partiya karkeran e. Bi alîkariya xwe a ji 1,3 mîlyon euroyan zêdetir, wî xwe kiriye nava Skoçyayiyên ku herî zêde alîkariyê didin vê partiya ku nikarîbû tev li hilbijartinên dawîn bibe. Di sala 2009'an de, serokwezîrê berê Gordon Brown jî hatibû merasîma vekirina bûroya wî a navendî. Rojnameya brîtanîk ya *The Times* (14 Adar 2010) weha nivisandibû «*Dewlemendiya Glasgowê, weke ya birêz Haughey, di nava deh salên dawî de, bi awayekî berbiçav mezin bû. Alîkariya ku, bi rêya birêz Brown, ji bo dezgehên girseyî çêbû, ji wan re weke sedemekê dikare were dîtin*».

Li aliyê din yê çemê Clyde'ê, kolana Buchanan'ê ku li cîhanê di nava kolanên ku kirêya wan buha ye de di rêza heftan de ye. Kevin, Michael û William li kêleka rê dimeşiyan, di çenteyê wan de CV'yên wan, di destê wan de jî hamburger hebûn. Çeteyên taxên xizan ên Glasgowê, Castlemilk û Easterhouse, ku çapemenî ji van re dibêje « gangsters », ew jî hene. Ew ji vî navî nerihet nîn in. Ciwaneke 18 salî ku li herderê di derbarê kiryarên xwe ên lihevxistinê û brînên xwe de bêtirs diaxife, weha digot: «*Navê çeteyta min The Young Byre Fleeto ye. Navên me ên kurt ev in: YHF, YBF û HF* [Tîpa H bi ya F'yê re tevlihev dibe]». Li gorî çavkaniyên cur be cur, li taxên Glasgowê yên xizanan, di navbera 150 û 200 çete hene.

«*Ez bi bêkariyê mezin bûme; min bavê xwe nedît, diya min jî bêkar e*», ev gotin ji devê William derdikevin, ê ku naxweze CV ya xwe bide cihên kar ên weke bar û dikanan. Ew tim bi Kevin re digerre ku Kevin hê 18 salî ye û bavê du zarokan e. Wê rojê piştî nîvro du heb whisky-coca û çar qedeh jî bîra di destê wan de bû, vedixwarin. Piştî wê vexwarina wan, êdî xebatkarê wê bîraxaneyê nedixwest tiştekî din bide wan. Lê belê, wan ji xwe re çareyek dîtibû; ji dikanekê wan hebên Valium û şeraba tevlihev kirrîbûn. Li serçemê wan şopên brînan dixûyan: «*Me bi çar çeteyan re li hev xist. Li vê derê, li Glasgowê, em tenê vê nas dikin: kêr bi herkesî re heye, em tim li hev dixin*».

Li ser maseya bara Crystal Palace'ê ku du gavan ji çemê Clyde'ê dûr e, Michael weha digot «*Bidûrketina ji çanda çetetiyê?*». Wê navberê de bavê wî hat «*Di ciwaniya xwe de ez jî endamê çeteyekê bûm. Wê endametiyê ez kirim zindanê*». Di heman demê wî destê xwe li pişta kurê xwe dixist û ber bi cîhê polîsan ve dibir. Di heman demê de Michael di bin çavan de bû, li çavê me mêze dikir û dipirsî: «*Gelo tu bawer dikî ku em xirab in ? Ji ber cureyê axaftina me, cilên me û cureyê jiyana me, herkes me xirab dibîne…*» Dema me behsa Haughey kir, Michael ji cihê xwe rabû, ji ber ku wî ew nav nas dikir, çimkî Haughey patronê berê yê klûba fûtbolê ya Glasgow Celtics'ê bû, û weha got: «*Ew gangsterekî rastîn e!* »

Li Royal Exchange Square, li xwarinxaneya Roganoyê ku yek ji cihên bajêr ên bijare ye û du gavan ji klûba kesên bijare ên Glasgowê «Club 19» bi dûr e, Tom Hunter behnekê kûr kişand û di derbarê encamên serkeftina xwe de ji me re weha got ; «*Min pir pere qezenc kirin, (difikire) ji pêdiviyên min û ya malbata min zêdetir*» Di sala 1998'an de, berpirsiyarê zincîreke dikanên pêlavan e «*Bi hatina bayekî ve, bi tenê du heb çekên 5000 sterling* [10] *di destê me de hebûn*», ev zilamê ku ji xwe re dibêje «*kapîtalîstê bi macera*» û bawer dike ku ew ê «*neçar bimîne ku bibe xwediyê rewşeke guncav*», ev zilam para xwe difiroşe reqîbên xwe, JJB Sports. Ew ji 345 mîlyon euroyan 310 mîlyonî dixe bêrîka xwe. Deh salan pişt re, bi dewlemendiyeke 1.3 mîlyar euro, ew dibe mezinirîn mîlyarderê Skoçyayê.

Bê ku bizane bê ew ê çi pê bike, ew biryarê dide ku «xwe perwerde bike» û bi rastî diçe cem Vartan Gregorian, birêvebirê Carnegie Corporation'a New Yorkê. «*Wî, li ser slogana Carnegie'yê ku digot* "dewlemendên ku bi dewlemendiyê dimirin bêrûmet in" *ez girtim. Ev li gorî rastiya min bû û min ji xwe re got*: "*Çima ez bimirim, beriya ku ez pereyê xwe bixim dozeke bixêr?*" *Ev tiştekî weha ye ku pirr xweş e û mirov kêfxweş dike. Wê demê, çima ez ê bihêlim ku kesên din li ser hebûna min razên?*» [11] Tom Hunter herweha bi «baronê dizan» Andrew Carnegie re jî hin tiştan par ve dike. Andrew Carnegie, dewlemendê amerîkî ye ku bi rêhesinan tê naskirin, wî ji gelê xwe re du hezar û pênc sed pirtûkxane û saloneke konserê a pir baş hiştine. Weke damezirînerê fona razandinê (*Private Equity*) West Coast Capital, birêz Hunter, di sala 2009'an de, bi buhayê 4 mîlyarî operasyonên kirrîn-ji nû ve çêkirin-firotina fîrmeyên îflaskirî, pêk anî. «*Vê gavê, bi awayekî dîrekt, an jî endîrekt, 10 500 kesên bi meeş di bin emrên min de ne*».

Lê belê, «wendayiyên temînatan » ên razandinên wî– ji kar derxistin, guherbariya aboriyê û ji nû ve sazkirin–, ji bo vî zilamê ku di sala 2005'an de xelata qralîçeyê wergirtibû, dikevin plana duyem. Di derbarê karê xwe ên mezin de weha digot «*Bi rêya Hunter Foundation'ê, min nêzîkî 50 mîlyon sterlîn dane xebatên xêrxwaziyê, ên weke perwerdehî û geşbûna aboriyê.*» Nexweşxane an jî karxane li Malawî û li Rûwandayê, alîkariya ji bo dibistanên skoçî yên xizan, damezirandina weqfeke ji bo alîkariya fîrmeyên nû di zanîngeheke Glasgowê de, pêşxistina cihên çandê, di muzeyên bajêr de… «*Çawa ku ez ji bo fona xwe a Private Equity hêviyên baş dikim, ez ji xebatên xwe ên razandinê jî heman hêviyan dikim*» Hunter kesekî weha ye ku David Cameron lê digerre: multîmîlyonerekî ku dixwaze di qada perwerdehî û di qada tendirustiyê de alîkariyeke baş bike. 50 mîlyon pereyê ku wî da ji bo «*dozên baş*», bi qasî buhayê mala wî a Cap-Ferrat'ê ye ku beriya krîza aborî ya 2008'an, firotiye Rûsan.[12] Dibêje «*Em kesên parastî nînin*», herweha bi bîr tîne ku «*Ev hemû dikeve xizmeta zêdetir pêşxistina kapîtalîzmê*». Dewlemendiya «sir Tom» dike nêzîkî 300.000 xaniyan, wî hinek ji vê dewlemendiya xwe daye sekinandin – û yata xwe firot, herweha suita xwe ya luks ku li Londonê, li otela Metropolitanê ye.

Dewlemendên bedew, baldar, destvekirî; xizanên berdûş, ên ku narkotîkê bi kar tînin û alkolîk in: dêrên dema Vîktoryayê winda bûn. Lê belê kîjan hêza siyasî dikare belaya xwe di wan de bide? Li vê derê, niherîna ku dibêje, dewlemendiya hinan bi xizantiya hinine din ve girêdayî ye, nayê qebûlkirin. Xizanî mirovan xemgîn dike, lê belê heya sînorên çînên zana, divê em bingeha wê di nava xizanan de bigerrin. «*Çima em tim vedigerrin ser vê îmaja bajêrekî xerabe, bajêrekî xizan û cîwanên ku dimirin? Ev meteoya BBC'yê, ku her tim bi gotina "li Glasgowê baran dibare" dest pê dike, tîne bîra min!*» Li serê Byres Road'ê, di nava West-Endê de, di bin siya teraseke Oran Morê de, ku dêreke kevin e û niha kirine salona şanoyê û bar-restoranteke luks, Sean Scanlan û Barbara Rafferty ku herdu jî komedyenên profesyonel in, ji lîstika *Tartuffe* ya Molière derdikevin. Di stûyê wê aktrîsta navdar de kolyeya lûks û li ser wê jî cilên şevê, di destên wan de îskanên bîra û yên ava portakalan heye; hevalê wê jî milê xwe di ser paldankê re dirêj kiribû. Bi bûyera bîranîna nasîna OMS ve, hate dîtin ku xweşê van herdu kesan neçû. Wan xwe weke «*bûrjûvayên piçûk*» didan xûyan, digel ku vê gotinê hinekê rengê xanim Rafferty xerab jî dikir, ku bavê wî, weke bi sedan hezaran bajariyên Glasgowê, di salên 1970'ê de, di karxaneyên çêkirina gemiyan de dixebitî.

Bi destên xwe yên boyaxkirî, Barbara weke hêzeke «bêexlaq» disekinî. Sedema 28 salên ku mirov dibû xwediyê hêviyên cur be cur, di navbera şêniyên taxa Milngavie, taxa ku ew lê dijîn, û taxên heman bajêrî ên din ku din ên xizanan in, bi sê hevokan xwe îfade dike: alkol, eroîn, û «fish & chips». Barbara weha dibêje «*Ev kesên han tu carî fêkiyan naxwin. Ew xwe bi tiştên ku di karxaneyan de çê dibin û tu qewet tê de nîne xwedî dikin. Ev tiştekî weha ye ku hertim dibe. Di salên 1930'î de karker zêdetir dijiyan, ji ber ku wê demê wan şorbe vedixwar. Niha, tenê sosîs-patat û nanê bi rûn dixwin! » Ji bo ku Barbara û Sean xwe ji vê rewşê piçekî dûr bixin, ew hersal sê an jî çar caran diçin mala xwe ya li Nice'ê (Fransa), li wê derê ew « tiştekî nakin, di kêleka rêyên îngilîzî re dimeşin û fêkiyan dixwin*».

Birêz David Kelburn, di qesra xwe de weha dibêje «*Di nava civaka modern de, karmendên dewlemend weke lewend hatine naskirin, arîstokratên weke me, hêdî hêdî weke dijmin têne dîtin.*», Kurê Komtê Glasgowê yê 32 salî weha dibêje «*divê mirov nebe dewlemend*». «*Na, wê demê mirov nikare taştêya xwe bi şampanyayê bike û xulamê mirov yê otêlê jî nabe, herweha kesê ku li pêşiya mirov xwe çongan bide erdê û xizmetê bike jî çênabe!*» Ew xwediyê wan derfetan e ku ji bapîrên wî mane. Qesra wî ji 15 odeyan pêk tê, buhayê wê derdora 4 milyon sterlîn e, tevî 3,5 hektar ax. «*Ez tim û daîm ji xwe re dibêjim ku şensê min pir e*», di vê navberê de ew du caran bi iPhon a xwe mesajan dişîne.

Bi zorê li pêşbirkên televizyonan ku armanca wan xwerxwazî ye temaşe dikin, weke «Live 8»[13] an jî «*The Secret Millionaire*», leystoka telerealîtê ku armanca wê ew e ku bi dewlemendên milyoner jiyana kesên bê xanî bide jiyîn. Kurê komtê Glasgowê dibîne ku têkoşîna çînan roj bi roj ber bi deriyê wî ve tê. «*çîneke nû, a ku li ser pere û li ser serkeftinê çêbûye*» roj bi roj mezin dibe. « *Bê guman, em, arîstokrat, xwediyê hebûna bav û kalên xwe ne. Lê belê, dema ku karmend dewlemendiya xwe ji zarokên xwe re dihêlin, weke mînak a malên wan ên mezin, mekanîzma ewqasî jî ji ya arîstokratan cuda nîne!*» Xêrxwaz xwediyê tasa xwe a çayê nînin. «*Li her deverê ew xwe weha didin xuyanî ku mirov dibêje qey cîhanê diparêzin. Lê belê, ev hewldanên wan tenê pariyek ji dewlemendiya wan e. Ez vê weke tiştekî bê wate dibînim!*»

Kelburn xwe weke kesekî liberal humanîst dide xuyanî– ew piştgiriyê dide koalîsyona nû a li ser desthilatdariyê–, û hin deman pirr girîng dibîne. «*Bê guman, şêniyên taxên xizan ên Glasgowê nikarin, ji bo min, fêm bikin ku ev qesra hanê herweha sedema xemgîniyeke rojane ye jî, herweha giraniyek ji bo demeke dirêj e. Lê belê, bi awayekî giştî, ev qesreke mezin e û zivistanan sar e, ew li ser me her salê dibe buhayê 60.000 sterlîn, ev tenê ji bo xwedîkirinê ye. Ez dikarim wê bifiroşim, belê. Lê, malbat ji sala 1140'î û vir ve li vira dijî!*» Di sala 2007'an de, David biryar daye ku qesra xwe, bi destê hunermendan, bineqişîne– weke «dijminên» xwe, karmendên dewlemend û xêrxwaz. Rojekê, vî kurê komtê Glasgowê biryar dide ku nexşên qesra xwe ji nû ve bide çêkirin: «*Ew hunermendên brezîlî bûn, ên ku ji nava atmosfera civakên xizan ên Rîoyê derketibûn. Lê belê wî karibû bibira dereke din jî. Belê, ji aliyekî ve ew hunereke civakî bû.*» Jinên brezîlî bi huner dimeşin, weke pûmayên li ser xaniyan.... «*Ev nêrîneke sîstema çînî ye, ji ber ku ev herdu kom bihev re nakevin nava têkiliyan, ew dibe rewşeke rast a jiyana rojane. Belê, ev rewşa me ye. Lê mixabin, binezantî ev rewş her ku diçe kîn û nefreta di navbera çînan de zêdetir dike*».

Digel hemû tiştan, li Glasgowê, tu carî «*kîna di navbera çînan de*» ewqasî tûj, nixumandî û veşartî nebû ye. 28 salên sînorê jiyanê ku taxên dewlemendan û ên xizanan ji hev qetandine ji cîhana siyasî bi dûr xistine, ji xizmeta dewletê mehrûm hiştine. Li van deveran sînorên coxrafîk nehiştine ku zêde pirsgirêk derkevin. Niherîna xebateke îdeolojîk ku di van sîh salên dawî de pêkhatiye weke celebekî bêmaliya civakî ku, bê girdav, xwe dubare dike. Armanca wan ew e ku pirsgirêkên kevnar ên malbatî formûle bikin: li vê deverê, weke sedsala XIX'an, dewlemendên xêrxwaz û xizan bi hev re dijîn "*Ev çareseriya çînan, dide xuyanî ka çima heya niha tu sosyologan di derbarê dewlemendên Glasgowê de kar nekiriye*", Ev gotin ên Paul Littlewood in, sosyologê ku ji Zanîngeha Glasgowê teqawît bûye.

Xitimandina siberoja hinan bersiva siberoja zelal ya hinine din e. Summera Shaheen, ku birêvebira dikana Diamond Studio'yê ye, dikaneke kevirên giranbûha ku li nava bajêr e, balê dikişîne ser van gotinan: "*Bazara lûks xwe baş bi pêş dixe. Bajar bi tenê pir xweş e. Dikanên hemû marqeyên mezin li vî bajarî hene: Rolex, Ralph Lauren, Versace… Li Brîtanyayê, di warê dikanan de, piştî Londonê, Glasgow bajarê duyem e.*" Destpêka adarê, Shaheen komeleya Love Luxury Glasgow ava kiriye, ev komele weke saziya dostaniya di derbarê tiştên luks de ye, ên weke lîmûzîn, spas, bûtîkên lûksê, cîhên lîstina golfê... "*Bê guman armanca me ew e ku em muşteriyên skoçî bikişînin, lê belê em dixwazin herweha ji xwe re muşteriyên nû ên rûs jî çêbikin.*" Li gorî teoriya vê xanimê RCT îşê wan xerab dike. "*Zêde îhtimala wê nine ku muşteriyên me li her deverê li rastî wan kesên ku hûn behsa wan dikin werin. Pirraniya herêmên xetere li derveyî bajêr in. Û herweha, hûn dizanin ku şêniyên Glasgowê xwediyê dilekî mezin in. Vê hefteyê sê çalakiyên xêrxwaziyê di nava bajêr de hatine sazkirin.*" Ji bo ku di nava bajarekî xizanan de, mirov bi awayekî dewlemend bijî, tenê pêdivî heye ku mirov çalakiyan saz bike û li pêşiya kamereyan dilê xwe veke.

Gelo di zirweya dewletê de heman encam pêk tên ? Koalîsyona di navbera muhafazakaran û lîberalan de xwediyê hejmareke mezin ya mîlyoneran e ku ev hejmar heya niha di nava hikumeteke brîtanîk de nehatiye dîtin. Ji 23 parlementeran 18'yê wan, ku ev dike ji 5'an 4'ê wan, xwediyê hesabên bankeyê yên weha ne ku ji 7 sifiran pêk tên. Li gorî *Sunday Times*, dewlemendiya wan dike pêncî mîlyon sterlînan [14]. Bê guman, piştî îlankirina projeya birîtanîk ya tevdîrên aborî, wê ev dewlemendî hinekî hebûna xwe ji bo bandora xwe ya siyasî jî bi kar bîne.

Wergera ji fransî:
Ahmet Dere

1- Bixwîne : Pierre Rimbert, «Bêedaletiya civakî dikuje», Walîza dîplomatîk, www.monde-diplomatique.fr, 2 îlon 2008

2- Rêxistina cîhanê a tendurustiyê «Commission on Social Determinants of Health - final report», Who.int, 2009

3- Xwarina gelêrî a li ser bingeha meşiyan, patatan û sûcûxan

4- Projeyên civakî, razandinên di nava dibistanên girseyî û çêkirina nexweşxaneyên ku hatine terkkirin, alîkariya ji bo karê ku hatiye wendakirin, bêyî ku zêdebûna bacê were hesibandin, ku ew jî %17,5 bûye % 20

5- Bixwîne: Nicholas Watt, «Michael Gove freezes rebuilding of schools in £3.5bn savings». *The Guardian*, Londres, 4 tîrmeh 2010

6- 8 atletên bilind di sala 2010'an de, Lîstikên olîmpîk ên London'ê, di sala 2012'an de jî, Lîstikên Commonwealth di 2014'an de…

7- Ev herweha «*bajarê ku bi pêş dikeve*», li gorî Courrier international. Rojnameya hefteyî her wiha nivîsekê ji The Independent jî digire, di wê derê de dibêje «*pirr huner, mîmarî, mûzîk û xwarin lê heye. Ev hemû bi xwe re mantiqa pêşbirkê û ya pragmatîk ku wê karakterîze dike jî tîne*» (15 cotmeh 2009). «*Di nava hefteyê de, li kolanan girseya ku dimeşe, dikeve dikanên marqeyên mezin!*». Gelo em dikarin li radyoya fransî ya France Info guhdar bikin (18 nîsan 2008)

8- «Scottish Snippets», Rampantscotland.com, 11 tebax 2007

9- Li gorî lîsteya mijarên dewlemend ku her salê ji aliyê rojnameya *The Times* ve tê weşandin (London), William Haughey xwediyê dewlemendiyeke weha ye ku heya 100 mîlyon sterlînan jî diçe. Di nava salên 2008 û 2009'an de, ew ji cîhê 1446'emîn derbasî cihê 540'emîn bû ye, li gorî rêza dewlemendên Birîtanyayê

10- Bixwîne: Jenny Davey, «The humbling of Tom Hunter», *The Times*, 4 çile 2009

11- Daxuyaniya nîvê hezîranê ku dibêje birêz Warren Buffet, ji «*% 99'ê dewlemendiya xwe*» daye ji bo xebatên xêrxwaziyê û dixwaze çil mîlyarderên pêşîn bicivîne û wan jî qane bike. Herweha, bi vî awayî ew dixwaze piştgiriyê bide Tom Hunter û William Haughey. Weke rizgariyekê, di nava kêmkirina xercên cîhanî de, mirov, bi hêza xwe a çandê û a dolaran, cîhanê diparêze

12- Di tîrmeha 2007'an de, ji baxçeyê vî bajarî wî bi rêya BBC'ê ve dabû xuyanî ku, ew difikire «*di saxiya xwe de mîlyarek sterlîn bide*»

13- Konserên Live 8, bi dengê «*Na ji xizaniyê re!*», her sal hunermendên cîhanê li ser dikan dicivîne û pirsgirêkên civakî rexne dike

13- Bixwîne: Gabriel Milland û Georgia Warren, «Austerity Cabinet has 18 millionnaires», *The Sunday Times*, London, 23 gulan 2010

# Deryaya reş

Deryayeke girtî, bi awayekî pirr bibandor şêlû bûye, hin caran weke dereke «marjînal» hatiye dîtin. Digel vê jî, Deryaya Reş xwediya wateyeke mezin a stratejîk e. Li wê derê, di navbera welatên Kafkasyayê, Yekîtiya Ewropayê, Rûsyayê, Turkiyeyê, welatên Asyaya Navîn û welatên Rojhilata Navîn de cerri andina hêzê tê bikaranîn. Herweha ev dere weke karta rê ye

JEAN-ARNAULT DÉRENS û LAURENT GESLIN *

## SINOP
### (Turkiye)

1'ê gulana 2010'an, dema ku sendîkayan hêzên xwe li meydana Ataturk civandibûn, xebatkarên lîmana masiyan a Sinopê jî li heman derê xwepêşandanek bi armanca protestokirina xebatên nukleerî li dar dixist: «*Sinop nükleer istemiyor*!» – «Sinop nukleerê naxwaze!»

Projeya nukleer, li vê bajarê piçûk yê turk ku li ber Deryaya Reş e, hêrsa şêniyan bilind dike. Dê were zanîn ku qiraxa deryayê, ji Sinopê heya Stembolê, her tim weha ye, tê parastin, parçeyê din, yê ku ji Sinopê diçe heya sînorên Gurcistanê, derdorê 600 kilometre, bi tevahî hatiye betonkirin. Otobaneke mezin, hemû bajar ji qiraxa deryayê bêpar kirine. Bi sedan xanî, weke kivarkan, hatine çêkirin û di wan de şêniyên ku demeke berê ji herêmên çiyayî hatine û armanca wan peydakirina kar û bidestxistina jiyanekê baş e, dimînin.
Li hinek deveran, ev otoban li ser axa ku ji deryayê hatiye qetandin derbas dibe, ew îro ji bi xetereyeke şeqitandina erdê ve rû bi rû ye. Bi armanca ku vê xetereyê ji holê rakin, her ji çend kîlometreyan, kevirên mezin ên ji betonê hatine çikandin. Ev derman ji nexweşiyê xirabtir e, ji ber ku rêyê li bayî digirin û nahêlin ku xweza bi hemdê xwe bi pêş bikeve, tenê ew xetereyê çend metreyan dûr dixin. Carinan mirov hin keştiyan li ber van kevirên betonê dibîne, lê belê ev lîmanên nû yên ku bi tenê dema ku mirov di otobanê de diçe dibîne, tu xizmetê nakin û gellek keştî di rewşa terkirinê de ne.

Masîgirî, hin caran xebata herî baş ya Deryaya Reş e, bi xetereya tunekirinê ve rû bi rû maye. Ji ber ku her ku diçe çavkaniyên wê têne xitimandin. Rûsyayê, hin şertên pirr dijwar, ên sînorkirina masîgiriyê, bi Turkiyeyê dane qebûlkirin. Avên Deryaya Reş di bin gefa qirêjiyê de ne, bi taybetî ji ber madeyên organîk ên bijehr. Ev rewş weke encama rasterast ya qirêjiya ku di vê deryayê de hatiye rijandin û herweha ya cihên xwedîkirina fosforê ye. Maddeyên ku ji bo çêkirina fosforê ku li vê derê hatine reşandin û kêmbûna oksîjenê; bûye weke fenomeneke xurtkirî di Deryaya Reş de. Ev derya zêde sor nîn e, ji ber ku avên çemê Dniestr û yê Danûbeyê diherikin ser wê.



Wêne: LMD

Gellek saziyên navneteweyî, weke komîsyona ji bo parastina Deryaya Reş a li dijî qirêjiyê, bi salan e ku bangewaziyan dikin ku balê bikişînin ser vê pirsgirêkê ; lê belê, ji ber pêknehatina hewldanên kêrhatî û nebûna mafê biryar girtinê, ev komîsyon nikare tu tiştî bike [1]. Û divê were zanîn ku parastina hawîrdorê ji bo welatên li qiraxa deryayê, weke berpirsiyariyekê nehatiye naskirin.

Piştî ku hikumeta turk qiraxa deryayê beton kir, ew ketiye nava hewldanên ji bo bipêşxistina elektrîkê. Piştî ku saziya elektrîkê ya neteweyî, Turkiye Elektrik Kurumu, hatiye fesihkirin û qada elektrîkê hatiye firotin, projeyên cur be cur ên barajên elektrîkê zêde dibin. Dewlet, bi lîstina rola xwe ya birêvebirina bazarê, bi rêya ajansa xwe EPDK, xwe kêfxweş dibîne û ji fîrmeyên taybet re rêya 49 salan xebatên di vê qadê de vedike. Bi tevahî, ji hezar û sê sedî zêdetir proje di tevahiya welatî de, bi giranî jî di herêma Deryaya Reş de, hatine destpêkirin. Li gorî Selco Gunay ku xwediyê oteleke newala Firtinayê ye, «*Ji bo vê demê, reaksiyonên girseyî karîbûn nehêlin projeyeke navenda nukleerî bimeşe* ». « *Ev proje dikare % 14'yê pêwîstiya elektrîka welatî pêşwazî bike. Ji aliyê din ve, wendayiyên me, ên ji bo veguhestina elektrîkê, % 30'î derbas dibin*». Gunay bi xwe berdevkê platforma ekolojîst ya vî bajarî ye. Tevgera ji bo muxalefeta li dijî barajan dikare hemû gelê herêmê li hev bicivîne. Turkiyeya ku demên berê ji Bulgaristanê elektrîk dikirî, nuha bûye welatekî ku dikare xwe bi xwe bijî, lê belê fîrmeyên taybet dixwazin elektrîkê ber bi Kafkasyayê ve bibin, lê belê li Turkiyeyê, li bajarên mezin, ên weke Stembolê, buhayê elektrîkê her ku diçe bilindtir dibe.

## SAMSUN
### (Turkiye)

Orhan Dogbayê serokê komeleya Çerkezan ya li Samsunê weha dibêje «*Ji şeş nîşan û vir ve Çerkez masiyan naxwin.*» Çerkez, piştî dagirkeriya Rûsan ya li herêma derdora Deryaya Reş, hatine Turkiyeyê. «*Bapîrên me, herêma qiraxa Deryaya Reş, a ku nuha di destê Rûsan de ye, ji Novorossiisk heya Sotchiyê, hemû kontrol dikirin. Ji destpêka sedsala XIX'ê û bi şûn ve, ji bo bidestxistina Circassie* [2] *'yê, Rusyaya Çarî şerr kiriye. Ev şer di dawiya sala 1864'an de, bi pelçiqandina êlên çerkez, li Kbaadayê, bi awayekî fermî hatiye bi dawî bûye. Kesên mayî tenê karibûne biçin û xwe biavêjin Împaratoriya Osmaniyan. Ew li qiraxa deryayê civiyane ser hev, li wê derê sekinîne da ku rojekê keştî werin û wan bibin* [3]. *Ji wan gellek kesan, ji ber nexweşiyên cur bi cur, jiyana xwe winda kiriye. Ên din, di rêwîtiyê de pirr zehmetî kişandine. Wan termên miriyan ji keştiyan avêtine deryayê. Ji ber vê sedemê, çerkez masiyan naxwin.*»

Dozeke mezin Çerkezên Turkiyeyê dixe nava tevgerê, hejmara wan derdora çar heya pênc mîlyonan e : muxalefeta lîstokên Olîmpiyad yên zivistanê ku tê xwastin ku li Sotchiyê, di sala 2014'an de, pêk werin. Navenda van lîstikan wê li nava çiyayên jora bajarî be. Îstasyona skiyê Krasnaïa Polianayê, li ser axa şerê Kbaadayê hatiye çêkirin. Dogbay weha dibêje; «*Bi rûsî, "Krasnaïa Poliana" tê wateya "hevguhertina sor", û Rûs bi xwe dibêjin ku ev nav ji rengê gîhayên ku li wê derê şîn dibe tê. Lê belê, em dizanin ku li wê derê xwîna bapîrên me hatiye rijandin.*»

Digel ku rêxistinên Çerkezan agahî




daye Komîteya Nevneteweyî ya Olîmpiyadê jî, wan tu bersiveke erênî negirtine. Rêxistinên Çerkezan daxwaza naskirina komkujiya Çerkezan dikin. Destpêka nîsanê, delegasyoneke bi navê Kongreya Cîhanê ya Çerkezan, a ku navenda wê li Amerîkayê ye, bi parlamenterên gurcî re civiyan. Hikumeta birêz Mikheïl Saakachvili ku vê demê muxalefeta Moskovayê dike, dikare Gurcistanê bike welatê yekem ku komkujiya Çerkezan, bi awayekî fermî, nas bike.

# TRABZON
## (Turkiye)

Di tevahiya sedsala XX'ê de, gelên li qiraxa Deryaya Reş tim di nava hev de jiyane. Ji peymana Lozanê bi şûn de, Yûnanên pontûs [4] ji qiraxa Deryaya Reş, aliyê Turkiyeyê, winda bûne. Li gorî Peymana Lozanê dê gel, di navbera Turkiyeyê û Yûnanîstanê de, bi hev bihatana guhertin. Trabzon, navê wê ê kevin e, bi yûnanî, Trebizonde ye, nuha bûye cihê netewperestiya turk. Qatilê rojnamevanê ermenî, Hrant Dink ku 19'ê çileyê 2007'an hatibû kuştin, ji vî bajarî ye [5]. Gültekin Yücesan hewl dide ku komîteya parastina mafên kesayetiyê zinde bike, ew xwe weke «*şoreşgerên luksembûrgîst*», bi nav dikin, yanê Rosa Luxemburg. Heta sibehê wî xwast bi me bidaya fêmkirin ku artêş û saziyên îstixbaratê dixwazin Trabzonê bikin weke cîhekî sembol: «*Li cem me, bandora leşkeriya kemalîzmê [6] hê nemiriye.*» Digel vê rastiyê, di heman bajarî de mirov bandoreke pirr aşkere ya îslamê dibîne. Ji bo alkolê vebixwî, divê tu dakevî taxên li ber deryayê û biçî bîraxaneyan. Di heman demê de, keçên ciwan jî bala mirovan dikişînin ser xwe. Wisa diyar e ku muşteriyên wan jî rûs in, ne turk in.

Her rojê, keştî ji Trabzonê diçin Sotchiyê, bajarê Rûsyayê. Keştî tim tije ne û di saetên xwe de jî naçin û nayên, digel vê rewşê, her tim jî bi hejmareke mezin rêwî li benda wan in û ji bo cih bigirin ecele dikin. Di nava rêhevalên me de, jinên rûs ku bazara valêzan dikin hene, ew cilan û hin tiştên kavnar tînin welatê xwe; herweha di nava rêhevalên me de Gurcî hene ku ji Rûsyayê tên û dixwazin biçin welatê xwe. Ji ber ku ji şerrê sala 2008'an vir ve ew nikarin ji Rûsyayê rasterast biçin welatê xwe. Herweha gellek kafkas jî di nava wan de hene. Komeke ciwanên ku bi rûsî û bi zimanekî kafkasî diaxifin û li ser wan cilên sportîf hebûn jî bi me re bûn. Di kontrola deriyê Turkiyeyê de me dît ku bi wan re torbeyên tije Qur'an hene.

# SOUKHOUM
## (Abhazya)

Ev bajarê hinekî taybet nikare ji rêwîtiya Sotchiyê re bibe asteng, bajarê ku lê amadekariyên Lîstikên Olîmpiyadê tên kirin. Nuha otobanek, ji gundê pêşerojê yê Lîstikên Olîmpiyadê Adler diçe heya Krasnaïa Polianayê tê çêkirin. Rawestgeha piçûk Adler, di sînorê Abhazyaya cudaxwaz de ye.

Viatcheslav Chilikba şêwirmendê serokê Abhaz weha dibêje «*Bê guman em li benda hatinên aborî ên Lîstikên Olîmpiyadê ne*». Abhazyaya ku di nava sînorên sovyeta kevn de dimîne, û bi abhazî jê re dibêjin Apsny, an jî «*welatê ruh*», di sala 1994'an de bi Gurcistanê re şerrekî dijwar meşand. Di wî şerrî de heyşt hezar kes hatin kuştin. Piştî şerrê tebaxa 2008'an ku di nava leşkerên rûs û gurcî de pêk hat, Abhazyayê serxwebûna xwe îlan kir [7]. Nuha ji 250.000 nifûsa vê komara piçûk ji sedî 45'ê wê abhaz in, yên din ermenî, rûs û yûnanên pontus in. Piştî şerrê 1994'an, pirraniya gurcên Abhazyayê ji vî bajarî reviyane. Tu kes nafikire careke din vegere. Li gorî serok Sergeï Bagaptch «*Heke penaber vegerin, wê careke din şerreke dijwar çêbibe.*» Pirraniya wan destbixwîn in.

Abhazya [8] nuha di bin bandora ambargoya Gurcistanê ye, herweha heman ambargo ji aliyê pirraniya welatên endamê civaka navneteweyî ve jî pêk tê. Li ser lîmana paytext Soukhoumê, aleke mezin ya Abhazyayê heye û ew hemû qiraxa Deryaya Reş dagir dike. Digel hemû rewşa heyî, ji Trabzonê her tim kargo tên vî lîmanê. Ev keştî bi mebesta ku biçin Batoumê, bajarê Gurcistanê, dikevin rê, li ser deryayê ew berê xwe didin Abhazyayê.

Şêniyên bajêr tim di qahwexaneyên li qiraxa deryayê ne, ji ber ku li vê derê hinek tûrîst hene. Lê belê Rûsyayê jî dest pê kiriye ku li vê komarê çalakiyan bi pêş bixe. Digel vê rewşê jî, Soukhoum naxwaze weke piyoneke Rûsyayê were naskirin. «*Di welatê me de du wargehên leşkerî ên rûs hene, di wan de deh hezar leşker hene û armanca wan ew e ku li dijî êrişên hêzên Gurcistanê, me biparêzin. Ji 1994'an vir ve, cara yekem e ku em rehet radizên û di nava aştiyê de ne*», ev gotin ji devê Bagaptch derdikevin. Zimanê wî tûjtir dibe: «*Heke Abhazya weke piyonê Rusyayê be, gelo Gurcistan piyonê Amerîkayê nîn e? Çima Kosovo weke welatekî serbixwe tê naskirin, lê Abhazya nayê naskirin?*»

Li derdora paytextê, jiyan hêdî hêdî xwe ava dike: çendî avahî kavil bûbin û ji wan bêhn were jî, mirov tê de rûdinin; li her derê kafeterya û dikanên piçûk vedibin. Li bajarê Soukhoumê, xaniyên zanîngeha dewleta Abhaz, nîşanên dema şerrî vedihewînin, lê belê, dîsa jî li wê derê nêzîkî deh hezaran xwendevan hene. Gudisa Tskaliayê bîst salî, li wê derê, têkîliyên navneteweyî dixwînê. Ev xwendevanê ji bajarê Gudautayê ku pêncî kîlometre ji wê derê dûr e, xwedan wê xeyalê ye ku rojekê bibe dîplomat û di qada navneteweyî de welatê xwe temsîl bike. Vê gavê, ev welat tenê ji aliyê Rûsyayê, Nîkaraguayê, Venezûelayê, Grava Nauruyê û –herweha ji aliyê kluba welatên piçûk ku nehatine naskirin, ên weke Transnistriya, Osetyaya Başûr, Komara turk a Qibrisê ve hatiye naskirin. Guftugoyên ku bi rêya Neteweyên Yekbûyî ve dimeşin, ber bi asta xitimandinê ve diçin. Herweha, di sala 2009'an de, Abhazyayê karî bikiraya ku leşkerên Neteweyên Yekbûyî vekişin û derî ji çavdêrên leşkerî yên Ewropayê re girt.

# BATÛM
## (Gurcistan)

«Sînorê» di navbera Abhazyayê û Gurcistanê de, pireya li ser ava Ingouri derbas dibe ye. Ev pirr tenê ji bo kesên peya tê bikaranîn. Li wê derê em rastî komeke Gurciyên ku li Abhazyayê dijîn tên, ew dixwazin biçin bajarê Zugdidiyê ku çend kîlometre li aliyê Gurcistanê ye, ji xwe re tiştan bikirin. Derbasbûn bi nêzîkatiya leşkerên gurcî û ên abhaz ve girêdayî ye, heke ew bixwazin wê bihêlin ku mirov derbas bibin. Gellek caran li ser vî sînorî tevlihevî û şerr diqewime. Roja 8'ê hezîranê, leşkerekî abhaz hatiye kuştin. Gurcistan tenê difikire ku rojekê Abhazyayê bike bin kontrola artêşa xwe, wekî din li çareseriyekê nagere. Ji «şoreşa gulê» ya 23'yê çiriya paşîna 2003'an ya ku bû sedem ku Saakachvili bibe serok û bi vir ve, Gurcistan hewl dide ku cudaxwazên Adjarie, Abhaz û Ossetiya Başûr di nava xwe de entegre bike. Saakachvili li Adjariyê pirraniya dengan girtibû.

Ji wê demê û bi vir ve, hikumeta Tiblîsê ku pirr nêzîkî rojavayê ye, dixwaze rengekî nû bide Gurcistanê. Kesên derdora serokdewletî, ketine cîhên birêveberiyê ên girîng û dixwazin li bajarên weke Batûmê karekî baş bi dest bixin. Di wî bajarê kevin de, otelên luks tên avakirin. Sheratonekê li ser 24 qatan, 1'ê nîsanê hate vekirin. Gellek xaniyên din têne çêkirin: oteleke Hyatt, yek Hilton û yek jî Radisson… Ji serê 2008'an û vir ve, mirov dikare bibêje ku pirr kêm tûrîst tên vî bajarî, lê belê ew kara xwe ji hatina Turkan dikin. Ji ber ku li Turkiyeyê gazîno qedexe ne, tûrîstên turk tênê gazînoyên vî bajarî. Lewre hejmara gazînoyan ji ya otelan zêdetir e.

Lîmana karmendiyê ya hema di ber bajarê kevin de ye, ji nû ve tê çêkirin. Ew ji bo 49 salan, ji aliyê holdingeke neftê ya kazak ve hatiye kirîn, KazTransOil. Trafîka salane ya 2009'an, derdikeve heya heft mîlyon ton neftê. Bi rêya hesinî, ji Azerbaycanê, ji Kazakîstanê û ji Turkmenîstanê ber bi Batûmê ve tînin.

Bûroya birêvebirê lîmanê, bi wêneyên du serokan ve hatiye xemilandin: Saakachvili û serokê Kazakîstanê Noursoultan Nazarbaïev. Birêvebir bi xwe, di dema sovyetê de 22 salan dîplomatî kiriye. Bi giranî wî li welatên ereb xebitiye û bi hevkariya aborî ve elaqadar bûye. Bi dû re, ew bûye balyozê Gurcistanê yê li Kazakistanê. Wê demê rayedarên Kazakistanê pêşniyarî wî kiriye ku karê balyoziyê di cî de bihêle û bibe birêvebirê vê holdînga li lîmana Batûmê.

Herçend Kazakîstan pirr bi Rûsyayê ve girêdayî be jî, ew bi Gurcistanê re gellek karan dike. Li gorî çavdêrên ku van dosyayan baş nas dikin, Rûsya xwe ji karê fîrmeyên Kazakistanê re kerr dike, daku fîrmeyên welatên bi hêz yên ku dikarin zora Rûsyayê bibin, li Gurcistanê kar nekin. Shoulgaïa, di derbarê sekinandina şerrî de bi hêvî ye û ji me re weha dibêje ; «*Hemû şerr neçar in ku rojekê bi dawî bibin.*»

# POTÎ
## (Gurcistan)

Derdora pêncî kîlometreyan li bakurê Batûmê ye, lîmana Potiyê jî, a ku di şerê 2008'an de ji aliyê artêşa rûs a li ser Deryaya Reş ve hatibû dagirkirin, ji bo 49 salan ji aliyê Mîrekîya Ras-al-Khaimah ve hatiye kirrîn. Jinûvekirina wê baş dimeşe. Bi rêya vî deriyê deryayê ve, di navbera Kafkasyayê û Asyaya Navîn de Poti dê bibe deriyê herî mezin.

Maxim Shoninê berpirsiyarê komeleyeke lîmanên Deryaya Reş ku navenda wê li Odesa, bajarê Ukraynayê ye, balê dikêşîne ser girîngiya bipêşxistina têkîliyên di navbera Potî û lîmana bulgar Varnayê. Bipêşxistina dan û standinên di navbera avên rojhilat û rojavayê Deryaya Reş de ku Rûsyayê marjînalîze dikin, di çarçoveya Korîdora gihaniyê ya Ewropa-Kafkasya-Asyayê de (TRACECA) çê dibe. Vê Korîdora ku di 1998'an de hatiye zelalkirin, çardeh welatên



Wêne: LMD

herêmê û Yekîtiya Ewropayê bi hev dide girêdan.[9] Li wê derê tenê nefta deryayên Hazar û ya Asyaya Navîn mijara gotinê nîne, herweha ew rêyê li Anadolûyê jî vedike. Lîmana Potîyê rêyê li Ermenistanê jî vedike û ji wê derê, bi hêsanî xwe digihîne Îranê jî.

Di navbera lîmanên Odessa û Varnayê de dijminatiyekê dijwar heye. Pêşxistina aktuel dikare Ûkraynayê zêdetir marjînalîze bike. Ev welat, ji hilbijartinên 7'ê sibata 2010'an û vir ve ku Viktor Ianoukovitch bûye serok, di navbera Ûkrayna û Moskovayê de têkîlî xurttir dibin. Vê gavê, em hê nikarin di derbarê tiştekê erênî de biaxifin, lê belê pirsgirêka di navbera Potî û Varnayê de, piştî ku dan û standinên di navbera Rûsya û Turkiyeyê de bi pêş dikevin, hinekê piçûk tê dîtin. Shonin weha texmîn dike ku «*% 80'ê keştiyên ku ji kendava Çanakkaleyê derbasî Rûsyayê dibin rûs in.*»

# SEBASTOPOL
## (Ukrayna)

Sebastopol di demeke dirêj de bû sedemê dijwarbûna asta têkîliyên di navbera Rûsya û Ukraynayê de. Di dema sovyetê de, ev bajar xwedî statûyeke taybet bû, ew girêdayî komara xweser ya Krîmê bû ku Krîm din bin bandora Ukraynayê de bû. Piştî ku Ukraynayê serxwebûna xwe îlan kir, di 1991'ê de, heya demeke dirêj jî Rûsyayê nedixwest bandora Kievê li ser vî bajarê girtî nas bike: Ji bo hatin û çûyîne, pêdivî bi destûreke taybet hebû. Di sala 1997'an de peymanek çêbû: Moskova êdî bandora Ukraynayê ya li ser Sebastopolê, nas dike, lê belê ew lîmanên li ser Deryaya Reş ji bo wargehên xwe ên leşkerî kirê dike. Peymana kirêkirinê, di meha nîsanê de, ji aliyê Ianoukovitch ve heya 2042'an hate dirêjkirin. Nêzîkî 20 hezar leşkerên rûs li Sebastopolê teva malbatên xwe dijîn.

Di navenda bajarê Sebastopolê de, li qiraxa heykelê pirr mezin yê Lenin, avahiya xizmetê ya hîdrografîka deryayê ya rûs heye. Rengê boyaxê piçekî guherî be jî, dekorasyona wê a welatparêziyê hê ya dema sovyetê ye. Lê belê, Evgeni Georgievitch, leşkerê rûs yê bi eslê xwe ve ukraynî, bi devkeniyeke mezin û bi silaveke ji dil û can tê û pêşwaziya me dike û ji me re dibêje «*Hêza rûs ya Deryaya Reş tim hebûye*». Di serê 2008'an de, artêşa rûs ji vê wargeha Sebastopolê çûye ser Gurcistanê û hêzên wê ên li lîmana Potiyê pelçiqandiye.

Ji derekê bilind ê bajar, birêz Andreï Chobolev awirekî diavêje ser lîmana Potiyê ku ew baş nas dike. Ew herweha xwediyê rojnameya Sevastopolskaïa Gazeta ye û li Sebastopolê pirr tê hezkirin. «*Ji bo pirraniya şêniyên Sebastopolê, ev bajar xwediyê cîhekî pirr bi wate ye, ji ber ku vî bajarî li dijî hêzên nazî li ber xwe daye, lewre, di dîroka Yekîtiya Sovyetê de cîheke wî yê bi rûmet heye. Ev dîrok tim zindî ye: Sovyet û herweha lewendiyên wê tim teva me dijîn. Sebastopol nikare bibe ukraynî, lê belê ew tam rûs jî nîn e. Ew bi serê xwev ve lîmanek û cîhanek e, bajarekî bi serê xwe ye.*» Chobolev xewneke mezin li ser Sebastopolê dibîne, bajarê şerrî, dê bibe bajarê aştiyê ku dê roleke navaxiyê (navwelatiyê) bilîze. Di heman demê de wargeha Rûsyayê ya artêşa wê ya Deryaya Reş dê tim li vê derê be, ji ber ku tu kes nikare bifikire ku rojekê Rûsya dev ji vê «keleha xwe ya Deryaya Reş» berde, bi taybetî jî vê dema ku NATO wergehên xwe ên li Bulgaristanê û li Romanyayê xurt dike.

# ODESSA
## (Ukrayna)

Heke di van mehên dawî de, têkîliyên Rûsyayê bi Ukraynayê re hinekî baş bûne, lê yên bi Romanyayê re hê tûnd in, sedem ew e ku Ava Tûna di navbera van du welatan de weke sêveke ku nayê parvekirin e. Ev av di axa herdu welatan re nêzîkî 3 500 kîlometreyan diherike. Ew deriyê avên Ewropayê ku diçin ser Deryaya reş e. Herweha, ev ava mezin ji bo Ewropayê li herêma xwezayî ya yekem e. Di sala 1991'ê de ew weke Nirxa Mirovahiyê ya Cîhanê ji aliyê Rêxistina Neteweyên Yekbûyî a ji bo Perwerde, Zanistî û Çandî (Unesco) ve hatiye naskirin. Li wê derê hezar û dused cure nebat, sêsed cure teyr û çil û pênc cure jî masî dijîn.

Profesor Nikolai Berlinski ji me re weha dibêje ; «*Divê parastina vê ava mezin bi hevkariya rayedarên romen ve pêk were, sîstema ekolojîk sînoran nas nake. Min krîzeke dilî derbas kir, di akademiya zanistî ya Kievê de, min şerr kir da ku ez bi dewleta Ukraynî ve bidim qebûlkirin ku ew ava Tûnayê qirêj neke*». Berlinski nuha ji bo Enstîtûya Hydrologîk ya Odessayê kar dike. «*Ez li dijî qanalan nîn im, û herweha li dijî gîhaniya li ser Tûnayê jî nin im, lê belê cureyê ku em vê avê bi kar tînin pirr xirab e.*»

Di 2004'an de, Kievê dest pê kir ku ew xebatên ji bo gihaniya avê ya li ser parçeyekî xwezayî yê Tûnayê ku di axa Ukraynayê re derbas dibe, kanala Bystroe, geş bike. Ji 14'ê gulana 2007'an û vir ve, piştî xebata sê salan, nuha keştiyên kargoyê û yên konteyneran dikarin di ser Tûnayê re, ji Ewropayê bigihîjin Deryaya Reş. Çend meh pişt re, li ser ava Tûnayê ku di axa Ukraynayê re derbas dibe, bi armanca vekirina rêyeke bi çend kîlometreyan, buldozeran dest bi kar kir û dîwarên betonî çik kirin. Ji bo Kievê armanca tîcaretê ew e ku ji sedan keştiyên ukraynî re rêya ku ew bacê nedin dewleta Romanyayê vekin. Ji ber ku heya nuha bi sedan keştiyên Ukraynayê di ser ava Sulinayê re, di axa Romanyayê re, diçin û tên. Armanc ew e ku bi vê rêyê ve ew bikare piçekî pereyên din bike qaseya dewleta Ukraynî.

Berlinski weha dibêje ; « *Bêyî ku em li encamên hawîrdorê bifikirin, niherîna çêkirina vê kanalê bi xwe tiştekî bêaqil e. Bi xurtbûna beşên avê, Tûna dikare her salê çil metreyan firehtir bibe, ev jî tê wateya ku ji bo parastina rêyeke qiraxa avê, pêwîst e ku her tim kanal werin paqijkirin…*» Betonên ku îro di kanala Bystroe'ê de têne çikkirin, pênc kîlometre di qiraxa avê de ne, ew bi bayê zora pêlan ji bakur dişemitin başûr. Nuha ew dişemitin ber devê kanala Sulinayê, rêya avê ya din ku li aliyê Romanyayê ye, ev jî hêrsa Bukreşê tîne.

Ji belavbûna Yekîtiya sovyetê bi şûn ve, ev du welat, li ser sînorên avê û herweha pirsgirêkên parvekirina ava ku di axên wan de derdikeve, li hev nakin. Pirseke pirr girîng e, dema mirov difikire ku di binê herêma ku li ser niqaş têne kirin de sed (100) milyar metre kûp gaz û deh milyon ton neft heye. Romanyayê ev pirsgirêk bir pêşiya Dadgeha Navneteweyî a La Haye. Roja 3'ê sibata 2009'an heman dadgehê biryar daye ku : % 20'ê herêma ku herdu welat li ser li hev nakin, ku ew jî dike 2 500 km², ji Ukraynayê re bimîne, % 80'ê jî, ku dike 9.700 km², ji Romanyayê re bimîne.

# VILKOVO
## (Ukrayna)

Li vî bajarê ku ji pirsgirêkên jeopolîtik dûr, Vilkovo, heyşt hezar kes dijîn, ji ber kanalên ku di nava wê re derbas dibin, ew weke « Venedîka Ukraynayê » hatiye binavkirin. Digel soza rayedarên ukraynî ku di 2004'an de gotibûn ku kanal dê bibe wesîleya xebata çar hezar kesan, hê jî rewşa aborî pirr xirab e. Kaptan Nikolaï, kevneleşkerê ku nuha rêberiya tûrîstan dike, ji me re weha xemgîniya xwe dianî zimên «*Mirov ji vir diçin, kar tuneye, lîman û karxaneyên sovyetê hatine girtin. Tenê tiştê ku mirov dikare jê pereyan qezenc bike, jêkirina qamîşan e ku mirov bifiroşe Hollandayê.*»

Digel ku ew li aliyê avê yê din e, ji bajarê Vilkovo hemû rêyên komûnîkasyonê yên bi Romanyayê re qut in. Ne rê, ne pire û ne jî rêwitiya li ser avê, di navbera Vilkovo û Tulceayê de tuneye. Tulcea, bajarekî mezin yê Romanyayê ye. Ji bo ku mirov biçe Romanyayê, pêwîst e ku rêwîtiyeke bi saetan bike û di derên pirr xirab re biçe. Kaptan Nikolaï weha berdewam dike ; «*Nuha Romanya bûye endama Yekîtiya Ewropayê, ji me re vîza divê*». Cîhekî kontrola ukrayniyan ku di nava qamîşan û cihê hezik de ye, hemû rêwiyan di kontrolê de derbas dike. «*Nuha sînor ji dema Sovyetê zêdetir dijwar bûye, dîwarekî din yê hesinî vê ava mezin ji hev qut dike.*»

* Redaktorê hezkirî yê Courrier des Balkans û rojnamevan e. Herduyan bi hev re pirtûka bi navê *Rêwîtiyekê li welatê Goraniyan Di destpêka sedsala XXI'în de Balkan* nivîsandiye (Voyage au pays des Gorani. Balkans, début du XXIe siècle), Cartouche, Paris, 2010

Wergera ji fransî:
Ahmet Dere

1- Bixwîne: «Herêma Tûna û ya Behra Reş», Europa.eu, hezîran 2005
2- Ji herêma berê ya Kafkasya'yê, ber bi gelên ku piranî musulman in ve
3- Bixwîne: Alexandre Grigoriantz, *Kafkazî. Sedemên sereke bêdawî*, Gollion, Infolio, 2006
4- Ev gotin ji navê Behra Reş bi yûnanî tê Pont Euxin. Digel ku ji destpêka salên 1990'î vir ve, piraniya Pontusên Sovyetê çûnin Yûnanistan'ê, hê li Rûsya'yê û li Krîm'ê hejmareke girîng ya Pontusan heye
5- Hrant Dink damezrînêrê rojnameya pirrzimanî ya *Agos*'ê bû, yek ji entelektûlên bi bandor ên civaka Ermeniyên li Turkiyeyê bû
6- Ideolojiya ji Mustafa Kemal Ataturk maye (1881-1938), damezrênêrê komara turk ku bi nêzîkatiya laîsîzmê û nijadperestiyê ve dimeşe
7- Bixwîne: Vicken Cheterian, «Pênc rojên ku Kafkasya hejandin», «*Cinq jours qui ont fait trembler le Caucase*», *Le Monde diplomatique*, sibat 2009
8- Bixwîne: Leon Colm, «Abhazya bêşans. Çîroka dewleteke nenaskirî» «*Improbable Abkhazie. Récits d'un Etat-fiction*», Autrement, Paris, 2009; Jean Radvanyi û Nicolas Beroutchachvili, *Atlas géopolitique du Caucase*, Autrement, Paris, 2010
9- Bixwîne: Jean Radvanyi, «Gihanî û jeostratejiya li başûrê Rûsya'yê», «*Transports et géostratégie au sud de la Russie*», *Le Monde diplomatique*, hezîran 2008



Wêne: LMD

# Di nava Ereban de dînamîkên çandî

HICHAM BEN ABDALLAH EL ALAOUI *

**Di nava serrûpela rojeva navneteweyî de, gelek caran bi rêya şîroveyên jeopolîtîk ve behsa cîhana erebî dibe. Herweha, raya navneteweyî balê dikişîne ser wan kêşeyên demokrasiyê û adaleta civakî jî ku di nava cîhana erebî de hene. Lê belê, haveynê çandî yê li vê herêmê nabîne û xwe jê re kerr dike. Digel ku ev dînamîka çandî fikr û kiryar û tevgerên herkesî diyar dike. Bi vî awayî, belavbûyina girêdana serê xwe ya li Rojhilata Navîn û welatên Mexribê (ji bilî Îran û Erebistana Suûdî) bêyî biryareke siyasî û bi tenê bi rêya zexta civakê ve pêk hat. Çand bi rastî jî dergûşa gotar û kiryaran e.**

Di pêvajoya van du sed salên dawîn de, ulemayan hergav xwe ji şêwazên modern ên derbirînê parast, bi tirsa ku ew dê bibin sebeb ku xelk jiyanê û cîhanê, bi rêyên li derveyî şert û çarçoveya olî binasin û têbigihin. Wan çiqas dijayetiya wê kir jî, pirraniya berhemên hunerî û çandî, li bal alim û rayedarên olî, qabilî qebûlkirinê nebûn. Rast e ku hindek ji wan şêwazên afirandina hunerî (bo nimûne, wênesaziya hemdem), mohra Rojavayê li ser bû û bi tenê bala efendiyan (burjuwayên rojavadost) dikişand.

Ev xweşbîniya tevdîrî, ji çarçoveyeke fikrî ya teolojîk (kelam) dihat ku di wê çarçoveyê de ol di nava sînorên hiqûqa olî (şerîet) de asê nabe, belkî heta dereceyekê pirrengiyekê jî di nava xwe de dihewîne. Herçend qaîdeyên heyî bin pê bikin jî, bikin hate qebûlkirin ku berhemên edebî û hunerî yên kêm-zêde sekuler (helbest, hunerên plastîk, destxet, muzîk) ne li dijî olê ne. Berhemên cihêrengiyeke berfireh û afirîneriyeke dilêr, parçeyê dîroka me yê navendî pêk tînin.

Mezinahiya Îslamê bi taybetî ji şiyanweriya wê ya damêtina hejmareke pirr a tesîr û çavkaniyên çandî dihat. Cîhana îslamî, mîrat û gerdîşên mezin ên edebî û feylesofiya klasîk diparastin, vedikolîn û pêş dixistin. Ji dêleva ku kitêban bişewitînin, kitêbxane ava dikirin ji bo parastina wan. Ev yek, ji bo dem û heyamên dirêj, bû depoya belgeyên avaker ji bo Rojavayê. Cîhana musulman têgihiştibû ku ev mîrat, ev kelepûr, sermiyanê rewşenbîrî yê hemû mirovahiyê ye.
Digel derhatina tevgerên tûndrew/binyadger, qaîdeyeke nuh xuya bû. Gelek caran jê re dibêjin "salafîst" ji ber têgihiştina wê ya ortodoksiyê ya berteng ku ew xwe dispêrê. Erê, ew rasterast weke îdeolojiyekê nayê pejirandin, lewre kêm caran bi rêya qanûnan û birêveberiyê ve tê destîşankirin, lê dîsa jî ev yek tiştekî ji hêza wê kêm nake; belkî bi pêçevane, tesîra wê xurttir dike. Ev îdeolojî, hêz û desthilata xwe êdî ne ji îktidara siyasî, lê ji wê wersiyona Îslamê ya tûndrew werdigire ku êdî di nasnameya erebî de cihekî navendî werdigire: ew êdî temsîla berxwedana li dijî rojavayîkirin û neo-kolonyalîzmê ye.

Heta çend dehsal berê, ev şêwaza oldariyê li neteweperestiya erebî ya serketî dialiqî. Îroj, dengên "sekuler" ên miyanrew bi xwe jî dudil in û newêrin bi awayekî aşkere dijberiya wê bikin: di kemîna nasnameyê de asê bûne û ditirsin ku ji aliyê rejîmê ve weke muhafezakar an jî weke komikên dijminên resenî û kevnariya çand û nasnameya erebî bêne naskirin.

Nimûneya heyirînê ew koma Fasiyên ciwan e ku havîna 2009'an, xwestin rojiya Remezanê bi pîknîkekê li parkeke giştî bişkînin. Ji bilî lehiya kerban ku ji nav refên oldar û îslamiyan rabû, Yekîtiya sosyalîst a hêzên gel [YSHG] jî, ku pêkhateya sosyaldemokrat ya herî mezin li welatî ye, doza pêdaçûn û cerîmekirina koma rojîşikênan kir. Vê «oldariya» çepgiran armanca xwe bi zimanê neteweperestan derdibirî, lewre bi ya wan, pîknîk/seyran kiryareke heqaretwarî ye bo çanda Fasê û xeternak e ji bo yekîtiya nasnameyî. Rayedar bi van îddiayan biryarê digirin ku koma ciwanan bi tawana "têkdana nizama giştî" bidin dadgehê; bê guman, li vir zagona sekuler di xizmeta dabînkirina nizama olî de ye. Zumreyên siyasî di helwêsta xwe de yekdeng bûn ku kêmtirîn averêbûna ji hukmên kitêbî [Qur'anî] jî dê neyê qebûlkirin.

Meydana siyasî bi vî rengî berebere dikeve nav sînorên çarçoveya qaîdeyên çandî yên hişk û tund, ku ew çarçowe bi xwe ji wan mecbûriyet û qedexeyan pêk hatiye ku ji xwendineke hişk û berteng a deqên olî hatine destnîşankirin. Ola ku bûye parçeyekî merkezî ya îdeolojiya serdest, ber bi wersiyona xwe ya salafîst ve dadikeve û sînordar dibe û di encamê de mentiqekê cî bi cî dike ku li gor wê mentiqê, çanda ku heta niha kafir bû, êdî ber bi xwedênenasiyê ve diçe. Li şûna ferasteke Îslamê ya bi çandê ve yekbûyî û girêdayî, şîroveyeke tundrew a şerîetê binecih dibe ku şikl û rengê çandê tayîn dike. Neqeba di navbera meydana pîroz a olî û qada kufrî ya çandê êdî vegirtî ne.
Digel vê hindê jî, ev dînamîka "salafîkirin"ê rêyê bi temamî li ber xelkî nagire ku berhemên çandî yên bi wasiteya televîzyon, vîdyo, înternet an jî edebiyata popûler têne belavkirin tahm bikin. Li hesabê herkesî tê ku çavkaniya vê pêdaçûn û serhişkiya li dû şêwazên modern bi tenê bi Rojavayê û pêvajoya globalîzasyonê ve were girêdan, yanî bibe "biyanî" an jî "xaricî". Fikreke weha bêguman dê neheqiyê li wê afirîneriya Ereban bike ku karîne pê şêwazên berhemhênana çanda hevçerx li şert û rewşa xwe bînin.

Li nav elîtan, wisa diyar e ku zewqek û elaqeyek ji bo hunerên modern bi pêş dikeve, ku bi sîstemeke handan û fînansekirinê ve tê destekkirin û di wê handanê de saziyên rojavayî, rêxistinên ne-hikumî (RNH) û monarşiyên Xelîcê pişkdar in. Li rexê xwe ve, bi elaqeya ku ji wan re bexş dikin, xelk jî heta dereceyekê para xwe ji berbelavbûyina şirketên navneteweyî yên hengê [entertainment] û medyayê werdigirin. Çavkaniyên berhemhênana çandî yên xwemalî jî li berbelavbûna berhemên Amerîkaya bakur zêde dibin, wekî kanalên agahiyan El-Cezîre û El-Erebiye, rêzefîlm an edebiyata popûler, bi taybetî namilkeyên pêşniyarên pratîk an jî evîndariyê, herweha pijiqîna afirîneriya muzîkî û hunerî ku bi rêya înternetê ve îmkan bi dest xist û, di nava ciwanên ereb de, bû armanca elaqeyeke mezin. Kawdaneke wisa bi awayekî wazjênehên bi xwe re wersiyoneke ticarî û "festîwalî" ya çanda erebî ya modern jî tîne; fenomeneke weha ku bêguman mexsûs bi cîhana erebî nîne, û ku berfirehbûyina wê bi saya serê karsazên mezin, teşwîqker û navbeynkarên lokal e.

Pirraniya van prêzeyên çandî ne xwedanê muhtewayeke olî ne. Di bin bandora globalîzasyonê de -û ne bi tenê rojavayî, belkî hindî, latînoamerîkî û hwd.- îmajeke bi temamî sekuler didine der. Digel rabûn û hemleya Îslama siyasî, hewlên îslamîkirina huner û çandê nisbeten lawaz û bêfayde dimînin. Lê belê, hunermend û produktorên ku di bin pêwîstî û şertên dijber ên çanda globalbûyî û qaîdeyên olî de mane, bi dilxwazî qerekter û taybetmendiyên xwe yên "musulman" didine pêş, digel ku berhemên wan qet pêwendî bi olî nîne û carinan têkoşîna sekulerkirina civatê ye jî. Bi xwebicihkirina li jêr sîwana vê aîdiyetê, ew hunermend nasnameyekê ji xwe re pesend dikin, ne prêzeyeke olî.

Rengekî şîzofreniyê meseleya olî dagirtiye: di mehrema malê de, an jî li qadên nîv-giştî yên dûrî kontrolê, xelk çanda kufrî an jî derveyî olê dimezêxe; di meydana giştî û di nava xelkî de, mirov pirr hewl didin ji bo nîşandana nasnameya xwe ya musulman, bo numûne bi şiklê neçûna sînemayê, bi çûna mizgeftê, bi dirêjkirina ridînê an jî dapoşîna destmalê. Ev herdu qadên jiyana çandî di eynî wextî de û paralel diguherin û dewam dikin, lê nizama olî di qada giştî de hegamoniyaya xwe radigire.

Xelet e ku em rabin û vê diyardeyê bi dabeşbûn û ferqên civakî yên di navbera elît û tebeqeyên xelkê asayî ve rave bikin. Bêguman sedsala bihurî, burjuwaya rojavadost dikaribû bi zewqa xwe îstifadeyê ji her cûre berhemên çandî yên sekuler bike û xelkê asayî jî pirrî caran di nav dîwarên çanda adetî de dima ku wê çandê jî bi reng û serdestiya Îslamê ve şeweyê xwe girtibû. Ev cudayî û qutbûyina civakî, ne ku ji beyn rabû, lê belê ev qederê zêdetir ji bîst salan e ku pêşketinên di warê perwerde û xwendewariyê de, herweha pê re zêdebûn û berbelavbûyina amûrên peywendiyê -di serî de televîzyon û înternet-, ferq û cudayiyên di meydana civakî de serûbin kirin. Bihîstin û nasyarbûna digel ziman û çandên cihê êdî nema bi tenê îmtiyazeke çînên raser û elît e. Naverokeke her cihêrengtir û çeperekê her firehtir pêkhat. Ciwan, gellek caran bi zimanekî ji derveyî erebiyê, romanan dixwînin, li fîlman temaşe dikin, belgeyan raçav dikin, guhê xwe didin muzîkê, li blogan diniherin. Ew bi tenê wan berhemên çandî namezêxin, xwe baş fêr dikinê -hetta hindek caran ew bi xwe derdixine bazarê- kar û barên çandî yên di cewher de tesîr û têgihiştinên Rojhilat, Bakur, Başûr û bêguman, Rojavayê li ser zal in.

Cihêrengî û pirrcûreyîbûna çanda giştî, ser bi xwe û xwe bi xwe pêvajoyeke sekulerkirin û demokratîzekirinê bi xwe re nayne. Lewre, mirovê ku îroj romaneke evîniyê dixwîne dikare sibehê deqeke olî bixwîne; yê ku li pêş weşana Iqraa TV'yê, kanala peykî ku bo weşana Îslamî terxankirî ye, dest bi firavîna xwe dike, dikare şîva xwe li ber klîbeke Rotanayê, "MTV'ya erebî" , temam bike.

Salafîstan jî herwiha xwe bi şiklekî rêkûpêk li van alavên nû yên wek înternetê adapte kirine. Baş dizanin ka dê çawa wan ji bo berjewendiyên xwe de bi kar bînin. Di hişmendiya wan bawermendan de, mezaxtina berhemên çandî yên sekuler divê wek "guneheke xef û nepenî" bimîne; ji bo rejîmên otorîter, divê ew berhem di nav çarçoveya zewqwergirtin û hengê de bimîne û qet encameke wê ya civakî û siyasî nebe. Û her kesek divê riayetê li qaîdeyên salafîstiyê bike, herçend di qada arizî û şexsî de jî be. Diyardeyeke nakokbar e, lê wisa diyar e ku têperbûn an jî ihlalkirina şertên kitêbî di "heng" û pratîkên nava malê de, bi tenê bi kêrî zêdekirin û bihêzkirina desttêwerdana oldariya tundrew tê: lewre, têperbûn an jî îhlalkirin tevgereke şexsî ye, qaîdeyên salafîst giştî ne. Pêkgihiştina van her duyan rêyê li ber durustbûna hêzeke îdeolojîk a "nerm" vedike ku ji sansureke burokratîk xurttir e.

Ev şîzofrenî bêguman li zimanî nabuhure, lewre ziman qorzîberê çandê ye. Ji qedîm heta nuha, ûlemayê hergav nivîs wek balatirîn awayê derbirîna rewanê mirovî nirxandiye û bi vî rengî qedr daye nivîsê. Digel vê hindê jî, wêjeya erebîziman di nava civakê de xwedanê cihekî marjînal e, ji ber ku rewşenbîrên ereb bi zimanê ku gelê wan pê diaxive nanivîsin. Neteweperest û oldarên tundrew li ser xalekê digihine hev: bi tenê erebiya klasîk, yanî zimanê Qur'anê (foşe), wek alavê derbirrîna çandî qebûl dikin. Ji bo hindekan, foşe, xerca neteweya erebî ye; ji bo hindekên din, ew xet e ku cîhana musulman, yanî ummetê musulmanan pêk ve digire. Ev hişmendî û têgihiştina hanê bêguman girîngiyê nade wan ferq û cudahiyên kûr ên di navbera erebiya klasîk, ku li derveyî medreseyên olî kêm caran pê diaxivin, û erebiya kolanê, hetta erebiya „standard" ya di medya, axaftinên cemawerî û çîrokên popûler de serdest e. Ji bo nivîskaran, ev mijar gellekî aloztir e, lewre roman çeşneke şikber e, ji ber ku roman pirsên hebûnê di nava xwesepandina du şertan de kişf dike: yek, bi rêya xwenîşandana li aliyê olî û yek, bi rakêşana zimanê erebî ya ji sînorên fosheyê bi wêdetir. Ev qutbûn, rêyê li ber rabûn û berbelavbûna derbirîneke popûler a bi rêya wêjeyê digirin.

Her heman zehmetî û kêşe di meydana huqûqî de jî tên dîtin. Her deweletek wersiyona xwe ya zagonî û "îslamîbûn"ê destnîşan dike; gellek caran di zagona wan de qaîdeyên huqûqa modern têne bicihkirin, lê herweha şerîetê wek çavkaniya zagondariştinê ya bingehîn nas dikin. Vê duseriyê, heta niha ihtîmal û derfetên siyasî sînordar kirine. Lê belê, dîsa di vê qadê de jî, dasepandina rêzik û qaîdeyên olî, hergav biryar û awayê birêveçûna fiîlî ya dadgeh û birêveberiyan diyar nake.

Bi rêdan û qebûlkirina salafîkirina qaîdeyên olî di meseleya exlaq û tevgeran de (fişara bi pênavê dapoşîna destmalê, girtina sînemayan û hwd.), dewleta erebî ya modern, siyaseta xwe ya hevkariya nerasterast ya digel wê ulemayê, yanî parêzvanên resmî yên Îslamê peyttir dike ku ev civata ulemayan jî wisa diyar e ku ji veguhartina rejîmê bêtir, li dû wergirtina her zêdetir qencî û îmtiyazan e. Dewlet heta dereceyekê dikare bi wan

îslamiyên “miyanrew“ re bigihije lihevhatinekê ku bernameya wan îstifadekirina ji îdeologên olî ye -ne ku îstifadeya ji hêza polîsî- ji bo binecihkirina serweriya oldariyê ya di nava civakê de. Bi vî rengî, meydana ku dewlet xwedîgotiniya xwe tê de diyar dike bi qedexekirina şert û kiryarên herî tundrew ên şerîetê (bo nimûne, recmkirina jin û mêrên ku ketine têkiliya cinsî bêyî ku zewicîbin) sînordar e. Ev yek rê didiyê ku qedrê wê li bal miyanrewên navxweyî û çavdêrên rojavayî bilind bibe ji ber ku nahêle îslamîbûneke temamî bi cih bibe, lê belê di heman demê de serdestiya salafîzmê wek qaîdeya sosyal binecih û qahîm dike.

Li aliyê din, rewşenbîrên alîgirên sazkariyên demokratîk li dû parastina dewletê ne li dijî gefên ûlema û tevgerên tundrew. Beramberî vê yekê, carinan razî dibin ku piştgiriya rêveberên xwe bikin. Bi dîtina wan, hikumetek herçend gellek otorîter jî be, karesateke ji îslamîzmê siviktir e, ji ber ku qet nebe hindek meydanên azadiya çandî diparêze û pêla hêviyên azadiyeke berfirehtir ji bo paşerojê radigire. Di heyema salên 1990‘î, rewşenbîrên laîk bi vî rengî piştgirî dane dewleta Cezayirê di têkoşîna wê ya li dijî îslamiyan de. Li Misrê, nivîskar Seyîd El-Qemmî îstifade ji parastina dewletê kir gava ku bi fetwayekê ceza (yê kuştinê) lê hate birrîn. Hetta gelek qedrê wî hate girtin û alîkariyeke mezin jî pê hate kirin.

Digel ku kes pê xweş nebe jî, dewlet carinan digel hindek rêxistinên îslamî, bo nimûne, yên weke Biraderên Musulman kêm-xeternaktir têne zanîn, li hev were. Hetta carinan dikare heta wê dereceyê jî biçe ku, bi navê muxalefeta xweşdîtî, di meclisê de xerentiya kêmayetiyeke sabîd jî bide wan. Lihevhatineke bi vî rengî derfetê dide dewletê ku hem cîhadgeran û hem jî wan îslamiyên ku dixwazin sîstema siyasî di nav re veguherînin serkur bike.

Dengeya hessas ku di nava aktorên civakî yên cihê de serdest e, destê desthilatdariyê xweş dike û dike ku di siyaseta xwe ya zext û tepeserkirinê de berdewam be, erê, dîsa bi awayekî bêinsaf lê belê êdî li ser armancên diyartir dibe fişar û zext û herwiha rêyê li ber dasependina qaîdeyên salafîst jî vedike.

Ev rewşa hêvîşikên di nav rewşenbîran de bi tezahûra şêweyên meyl û encamên siyasî yên cuda tê ber çavan. Li aliyekê, cûreyeke “reva mêjiyan“ a rastî û vîrtûel li kar e. Hejmareke hunermend û nivîskar êdî li derve dijîn an jî karê xwe ji bo cemaeteke dûrî welatê xwe dikin. Xwe wek “ereb“ û “musulman“ didin nasîn, ne wek misrî an jî tunisî; ji xwe re nasnameyekê diyar dikin ku hêmanên awayekî ên wê nasnameyê pirr nêzîkî nirxên salafîzmê ne; bi foşe dinivîsin û wisa digirin ku “ereb“ û “musulman“ yek tişt in. Endamên diyasporayeke coxrafîk an jî îdeolojîk in û lewma digel welat û xelkê xwe peywendiya wan namîne, û axir, êdî bêtir nasnavê giştî yê “ereb“ tercîh dikin. Digel vê hindê jî, qet xema birêvebiran nîne gava ku rewşenbîrên wan radibin û dikevine dû dozên hevpar yên weke Filistîn û Iraqê; yanî heta ku li ser dika siyaseta neteweyî dest bi çalakvaniyê nekin ji bo rêveberan sebebek nîne ku pê aciz bibin.

Bi qasî ku rewşenbîr li hember dubendiyên civakî yên li welatê xwe rêya xemsariyê didine ber xwe, ewqas jî bi dilxwazî berê xwe didine dergehên civaka navneteweyî; lewma bazarên lokal bi tenê dibine bingehekî teng û piçûk ku hunermend û nivîskar bikarin xwe bispêrinê. Nebûna polîtîkayeke neteweyî ya piştgiriya afirandina hunerî dike ku produktorên berhemên çandî her bêtir şexsî û depolîtîze bin, û herweha berê xwe bidine derveyî welatî ji bo cemaet û çavkaniyên dahatan. Gellek ji piştgirên darayî, ji bo veguherandina civakê, meydana çandî ya “pak û nezîh“ tercîh dikin. Bo nimûne, rewşa weqfa Fordê weha ye, ya weqfa Soros û ya zanyarîhezên ji monarşiyên petrolê jî weha ye. Bi vî rengî, galeriyên hunerî û wîtrînên şîk û luks ên Xelîcê birrên berhemên li ser navê nasnameya ereb-musulman numayîş dikin, lê belê ji ber sponsorên wan ên rojavayî, ew pêşangeh ji civakê qutbûyî û dûrî wê dimînin.

Di meydana romanê de, çend navendên reqîb berhemên “herî baş“ ên çanda erebî han didin: xelata Emirates Foundation International bo romanê; xelata edebî ya Blue Metropolis Al-Majid Ibn Daher (Lubnan); xelata navneteweyî bo fîksiyona erebî, digel Booker Foundationê (London).

Reng e qet kêşe nebe ku hunermendên herêma me bi aramî û bi hejmareke mezin beşdariya di yariya çandî ya cîhanî de bikin -hetta belkî ev awayekî pêşketinê jî be. Lê belê, dibe ku hunermendê “ereb“ yê ku li ser dika cîhanî dibe xwedanê qedr û qiymetê, ji gelê welatê xwe bi dûr bikeve. Û bi vî rengî, çi rola azadkir û gorankir hebe, wê jî ji dest bide.

Bêşik e ku înternetê qadên nû vekirine bo berhemhênan û mezaxtina alavên çandî. Lê belê, çendî îmkanan ji bo tevgereke muxalif a heyî durust bike ku di çalakvaniya xwe de karîgertir be jî, Tor û Înternet bi xwe hişyarî û şiûreke siyasî çênake. Dibe ku bibe alavek ji bo bihêztirkirin û berbelavkirina çalakvaniyekê, weke ku li Misrê qewimî, lê belê ew bi tu awayî cihê wê xebata meydanî ya sebirkêş nagire ku ji bo birêkxistina têkoşînekê şert e.

Li aliyê din, cîhadger jî bi rexê xwe ve înternotên [bikarhênerê înternetê] ecêb dahêner in; lewre di propagandayên wan yên înternetî de ji qerfê bigire heta bi îlahî û sirûdan gelek rêbaz hene. Baweriyên wan yên olî digel nûkariyên teknolojîk sazgar dibin, reng e ji ber wê cudakariya hanê be ku dixine navbera şexsiyeta kesê “ramyar“ (yê rêzdar) (“mûtafakir“) û yê “rewşenbîr“ (şermezar) (“mûthaqqaf“).

Înternet wekî din, digel faktorên din, dibe binasê xwecudakirina kesan û parçebûna civakê. Bikarhênerên înternetê bi pirranî dûrî çavan –gellek caran bi awayê nihênî- di ekranên kompîturên xwe re danûstendinan dikin. Nihênîbûn rê dide acizan ku tundrewiya xwe derbibirin bêyî ku bi tu awayî rîska rûbirûbûna bi dijminê xwe re hilgirin û bikevin ber xetereyên encamên ku ihtimal e ji rûbirûbûneke wisa derbên. Lê ew dikarin li ser înternetê hem tinazên xwe bi desthilatê bikin û hem jî xwe ji cîhana rastîn rizgar bikin.

Hunermend û rewşenbîrên ku terka wê rola xwe ya ku berê pêk dianî (û ku hêj jî carinan li welatên musulman ên wek Îran û Turkiyeyê pêk tînin) kiriye, êdî nema pêşeng û serkêşên tevgereke civakî, siyasî û çandî ne. Zumreya wan êdî her bêtir ji wan elîtan pêk tê ku li ber sî û starên dewletê lûsiyane an jî xwe dane bin çengên parastina çend dewlemend û hêzdaran. Îmaja hunermendê berhelistkar û muxalif, ku berê di şexsê nivîskarê misrî Sonallah Ibrahîm an jî koma muzîka fasî Nass El Ghiwan de berceste bûbû, êdî şûn jî lê nemane. Bo nimûne, li Misrê, wênesazê avangard Faruk Hosni niha wezîrê çandê ye. Li Sûriyê, wergêra berhemên Jena Genet, Hanan Kessab Hassan, di sala 2008‘an de wek serperiştkara giştî ya “Şam, paytextê erebî yê çandî“ hate tayînkirin ku bernameyeke bi pişkdariya Unesco‘yê ye. Çendîn balkêş jî bin fikrên wan yên di derbarê çand û civakê de, hunermendên mîna Wael Chawki (ku berhemên wî li bienala Îskenderiyeyê hatine numayîşkirin) an jî Hala El Koussi (xelatgira xelata Abraaj Capital Art ku li Dubaiyê bi rê ve diçe) xwe ji her çi helwêst û dozkariyeke polîtîk diparêzin.

Modernîzebûna bizavên çandî yên cîhana erebî dibe ku pêvajoyeke berdar digel xwe bîne. Hunermendên ku xwe di nava wan bizavan de dibînin, dibin xwedanê sermiyaneke sembolîk an jî awayekî prestîjê ku dikarin ji bo handan û pêşxistina guherînên li welatên xwe bi kar bînin. Teqez e ku rewş û rêveçûna heyî nabe çare ji bo kêşeyên heyî, lewma kişfkirina meydanên nû yên azadî [otonomî] û hewl û ceribandinan dikare rê bide ku li hember desthilatdarên zordest, ku hikumê li para mezin a cîhana erebî dikin, muxalefetek pêk were.

Tiştek heye ku divê şika kesî tê de nebe: ji bo ku karê hunerî û rewşenbîrî rêyê li ber demokratîzekirina siyasî û civakî veke, şert e ku li dijî qaîdeyên salafîst her li ser erdê wê têkoşîn were kirin, bi rêya danana alternatîfeke pêbawer. Aşkere ye ku modeleke hazir û çêkirî bi kêr nayê; girîng e ku jî kaniya adetên erebî û musulman vexwe ku, bi sedan salan, meydanên azadiya çandî her bi wan firehtir bûne. Ew qaîde û modela ku li cîhan û nirx û adetên me tê, divê bibe yek ji stûnên hemû projeyên rasteqîn yên demokratîzekirinê. Diyar e ku ew qaîdeya nû nikare li ser înkara kêşe û karesata salafîst ava bibe. Û ne jî bi rêya serşorkirina li ber şert û dasepandinên wê ve.

* Endamê lijneya birêveberiya Freeman Spogli Institute for International Studies (Freeman Spogli Institute bo Lêkolînên Navneteweyî), û lêkolîner di Center on Democracy, Development and Rule of Law de (Navend ji bo Demokrasî, Geşepêdan û Hukmê Qanûnê) li Zanîngeha Stanfordê (Californie); serokê lijneya rêveberiya Center on Climate Change and the Challenge to Human Security (Navenda ji bo Guherîna Klîmayî û Metirsiyên li ber Ewlehiya Mirovahiyê), Zanîngeha Californie; endamê lijneya şêwirdariya Human Rights Watch (Çavdêriya Mafên Mirovan).

Wergera ji fransî:
Ergîn Opengîn

1- Bi destê mîrê suûdî Al-Walid ben Talal hatiye avakirin. Bixwînin : Yves Gonzalez-Quijano, «Le clip vidéo, fenêtre sur la modernité arabe», «Culture, mauvais genres», Manière de voir, n° 111, hezîran-tîrmeh 2010

2- Weke ku li Misrê «serhildana Facebookê» ya li dijî serokdewlet Moubarak di bihara 2008'an de nîşan da

# Ber bi koka qeyrana taylandî ve

DAVID CAMROUX û PHILIP GOLUB *

Xwepêşandanên protestoyên girseyî yên ku bi qasî 9 hefteyan Tayland da ber xwe, bûn sedema mirina 88 kesan û birîndarbûna 1185 kesan. Gelo ew jî yek ji wan pêlên şiddetê yên bêdawî bû ku ev welat bi awayekî bi rêk û pêk di wan re derbas dibe? Ji dawiya monarşiya mutleq ya di 1932’an de û vir ve ye ku li Taylandê yanzdeh darbeyên leşkerî bi ser ketine (tew em behsa yên ku bi ser neketine nakin), hijdeh destûrên bingehîn çêbûne û bîst û heft serokwezîr hatine ser hikum. Van dehsalên dawiyê weha xuya ye ku Taylandê daye ser rêya bihêzbûneke demokratîk, tevî ku sala 1973’an û sala 1992’an ji bo aramkirina atmosfera civakî ya ku ji ber sedema tûndrewiya artêşê êdî hatibû ber teqînê, navbênkariya melîk Bhumibol Adulyadej (Ramayê IX’an.) pêwîst bûbû jî.

Di vê navberê de, heger mirov bûyerên vê dawiyê weke şokeke bihurî ya di rabûna “pêncemîn pilingê asyayî [1]” a ku kes nikare rêyê li ber bigire şîrove bike, mirov dê bikeve nava xeletiyê. Berevajî yên beriya xwe, ev turbulans ji şerrên desthilatdariyê yên berê jî û herweha ji hatiniyên wê yên di nava elîta herêma Bangokê jî (ku % 50’ê dewlemendiya neteweyî lê kom bûye) bi dûrtir diçe. Ev bûyer bi awayekî nîşana wan dijberiyan e ku reh û rîşên wan kûr in û nerazîbûnên civakî yên ku ji gelek dehsalan û vir ve tên xwedîkirin aşkere dike. Vê carê gilî û gazinên xelkê xizan yê gundan û bajaran xwe bi carekê bi ser elîteke entegrekirî de ferz kir; ev elît “*ji wekheviyê hez nake* [2]” û desthilatdarî û çavkaniyên aborî yên neteweyî jî kirine bin destê xwe.

Ev aliyê çînî, aloziya niha ji yên dîroka modern ên Taylandê cihê dike. Ew erozyona sîstema meliktiyê zêdetir dike, lewra monarşiya li gorî destûra bingehîn êdî weke çareseriya nerazîbûnên civakî nayê dîtin, heta weke yek ji çavkaniyên wan tê dîtin. Ji “welatê girnijînê” re parfuma dawiya desthilatdariyê: Kî wê şûna melîkê niha bigire – niha temenê wî 82 ye û ji îlona 2009’an ve ye ku li nexweşxaneyê tê dermankirin –, ev mijar di nava gel de dibe sedema fikara herî mezin.

Di pêvajoya dirêj a derbasbûnê ya rejîma feodal de di nîvê sedsala 19’an de bi awayekî wêrek serdemeke nû dest pê kir. Hêzên neteweperwer peyxam ji şoreşa Meiji ya li Japonyayê girtin û di bin serokatiya melîk Mongkut (Ramayê IV’an, 1851-1868) û melîk Chulalongkorn (Ramayê V’an, 1868 – 1910) ji bo modernkirina destûra bingehîn û aboriyê, bûn yek. Dema ku ev kirin jî, ketina nava welêt a ji rojavayê sînordar kirin. Di destpêka sedsala 20’an de ev hewldan bi “şoreşa” 1932’an a li dijî rejîma berê ku dawî li monarşiya mutleq anî, bi dawî bûn. Şoreşê soza rakirina çînên civakî û bidawîkirina civaka nîzama hiyerarşîk û di eslê xwe de arîstokrat dabû, lê belê ev soza xwe bi cîh neanî. Ji hingê ve welat di navbera rejîmên leşkerî û sivîl de diçe û tê.

Li gorî tişta darî çav, têkoşîna siyasî ya heyî, “kirassoran” (alîgirên serokwezîrê berê Thaksin Shinawatra ku darbeyeke leşkerî îlona 2006’an di dema erka wî ya duyemîn de dawî li wezîfeya wî anî û ji hingê ve li derveyî welatê xwe dimîne) û “kiraszeran” (alîgirên hukûmeta nuha ya nehilbijartî ya Abhisit Vejjajiva ku rengên monarşiyê li xwe dike) tîne hemberî hev. Di civakeke weha de ku hê jî nirxên arîstokratîk bi awayekî xurt rengê xwe didiyê, yên kirassor para bêhtir ji herêmên gund ên bakur û bakurrojhilatê welêt tên, bi navlêkirina “ga” û gundiyên baş perwerdenekirî yên ku Thaksin û hevalbendên wî ew manîpule kirine, tên piçûkxistin. Ev şîrovekirineke seresere ya qeyranê ye.

Statuyeke *deus ex machina* (di dramaya kevin a yewnan de, dema ku xwedayek ji bo pirsgirêkê çareser bike bi rêya mekîneyekê dadiket ser dika tiyatroyê) didin serokwezîrê bi darbeya leşkerî hatiye xistin, him bi nepixandina girîngiya wî ya bi rastî û him jî piçûkdîtina girîngiya wî ya sembolîk. Herçend rast e ku wî tevger qismî fînanse kir jî, tevger xwe beriya hertiştî disipêre alîkarî û bêşa ji malbat û tevnên civakî yên ji bakur û herêmên karkeran ên ku li Bangokê komkirî ne. Bi ser de jî bi qasî ku tevger di dilê paytextê yê bazirganî de bi pêş ket, ewqasî jî hevgirtina li dora kesayetiya Thaksin jî li ber derketina daxwaza wekheviya civakî û beşdariya siyasî, kêm bû.

Giraniya sembolîk a serokwezîrê berê, li gorî lêkolîner Pasuk Phongpaichit xwe disipêre rastiya ku di bin birêveberiya wî ya hikumetê de ew “*tevî ku ew bi xwe jî li ber asteng bû, veguherî lîderê tevgereke hêzdar a ku li ser kokên civakê peyde dibû*”.[4] Thaksin bi pirraniyeke mezin sala 2001’ê hat hilbijartin, wî jî nû ve lîderekî gel “vedît” ku li dijî elîteke kal a bi desthilatdarî û îmtiyazên xwe ve girêdayî, têdikoşe. Hikumeta wî bernameyên fînansekirina mîkro li gundan dan destpêkirin, alîkariyên ji



SERHAD BAPIR, *Operasyonên Enfal*, Grafîka li ser bleksîglass û dar

bo pîşekarên piçûk ên herêmî û planeke sîgorteya tendirustiyê, da ku xizan jî ji xizmeta tendirustiyê sûdê wergirin, ji projeyên hikumeta wî bûn.

Ev cara pêşî bû, kesên mexdûr serokwezîrek dît ku ne bi tenê weke ku bi pirsgirêkên wan re eleqedar bibe xwe nîşan dide, lê herweha xwediyê navgînên dewamkirina guhertinê bû [5]. Ev jî rave dike bê ka çima nav û dengê Thaksin ne bi gunehkariyên nepotîzm (aboriya girêdayî komekê yan jî malbatê) û bertîlxwariyê ku li dijî wî hatin kirin û ne jî bi pêkanînên xwe yên otorîter xêra nebû (3 hezar kuştinên bêpirs û îfade yên li dijî bazirganên narkotîkê yên muhtemel dixin stuyê wî û ew ji zordariyeke hişk a li Başûrê Welêt herêma misilman jî berpirsiyar e ku bi awayekî mafdar komeleyên mafê mirovan pêkanînên wî eşkere kirin).

Serokwezîrê berê hêrsa derdorên nêzî malbata melîkî rakir, lewra projeyên wî yên pêşxistina herêmên gundan, weke mînak ji bo îmtiyazên melîktiyê yên ku ev 50 sal in dewam dikin, xetere bûn. Ew bi zirardayîna melîkî (ev gunehbarî dikare bibe sedema vekirina dozên giran) hat sûcdarkirin û guman jê dihat kirin ku niyeteke wî ya komarxwaziyê ya veşartî heye – ev tawanbarî di dema bûyerên vê dawiyê de hatin dugêsinîkirin. Darbekarên ku sala 2006'an dawî li serokwezîrtiya wî anîn, îddîa kiribûn ku wan ji bo parastina monarşiyê darbeya leşkerî kiriye. General Prem Tinsulanond, serokwezîrê berê û serokê Konseya Saltenatê, bi awayekî çalak cesaret daye wan.

Di heman demê de tu armancên darbeya leşkerî yên girîng nebûn. Di sala 2007'an de hilbijartinên nû di bin navekî din de, partiya Thaksîn ji nû ve kir desthilatdar. Vê yekê kir ku li bakur, bakurrojhilat û li keviyên bajêr ên ji Bangokê hatî qutkirin gel dakeve qadan û kêfxweşiya xwe nîşan bide. Bi xêra manovrayên meclîsê yên di encama xwepêşandanên "kiraszeran"[6] de, çiriya paşîna 2008'an Dadgeha Destûra Bingehîn hilbijartin betal kirin da ku Abhisit bibe desthilatdar. Koalîsyoneke di nava elîtan de ya ji monarşîparêz û endamên çîna navîn û jor yên Bangokê pêk dihat, destek dida Abhisit. "Kiraszeran" doza guhertinên destûra bingehîn dikir. Li gorî van guhertinan wê destûr bihata dayîn ku beşekî parlamentoyê yê girîng bi fermanê bihataya destnîşankirin û hikumeteke ji teknokratan pêk bihataya.

Ev şerê siyasî nîşan dide ku di nava civakeke bi awayekî hişk hiyerarşîk de, di navbera herêm û çînên civakî de qelşên kûr hene. Artêşa ku "kirassor" tepisandin, bi dilê xwe dengê xwe ji xwepêşandanên "kiraszeran" re dernexist. Xwepêşandanên "kiraszeran" welat gelek mehan tevizandibû. Qesra melîkî bi awayekî çalak cesaret da wan. Rastiya antagonîzma (dijberiya dubendî) çînên civakî di jiyana rojane ya Taylandê de xwe dida der. Ew tu carî zêde bi dûr neketibûn. Weke piştrastkirina vê, em behsa tevgerên cotkarên bêerd ên salên 1970'î bikin, hingê ji bo belavkirina erdên cotkariyê û mafên xwe yên bingehîn, ev gundî têdikoşiyan. Lê belê ji hingê ve aşkere ne. Erê, veguherîna aborî ya 50 salên dawiyê ji bo herkesî yan jî hema hema herkesî bi xêr bû (rêjeya kesên ku rojê bi kêmtirê du dolaran debara xwe dikin, di wekheviya hêza kiryariyê de % 57'ên destpêka salên 1960'î daketiye % 11.5'ên îro), ew herweha bû sedema pêkhatina newekheviyeke mezin [7]. Li gorî pîvana newekheviya belavkirina dewlemendiyê di nava civakê de ya Gini (Coefficient Gini) rêjeya Taylandê 42.5 e û bi vê rêjeyê Tayland yek ji welatên herî newekhev ê başûrê Asyayê ye, ji Çînê dibihure (41.5) û hema di bin Filîpînê re ye (44). Li gorî daneyên bankeya navendî ji sedî 20'ê Taylandiyan ên herî dewlemend xwediyê ji sedî 69'ê dewlemendiya welêt in, ji sedî 20'ê herî xizan jî bi tenê xwediyê ji sedî 1'ê dewlemendiya welêt in [8].

"Mûcîzeya" aborî ya Taylandê weke gelek welatên herêmê ku bi pêş dikevin, xwe disipêre du motoran. Pêşî hêzeke kar a seyar û erzan ji bo febrîqe û sektorên xizmetê yên bajêr e ku ji herêmên gund tê. Ya din jî serjimareke gundan ku zad û qûtê ji bo bajaran bi buhayê herî erzan hildiberîne. Gund di heman demê de bi rola toreke civakî jî rabûn; di demên depresyona aborî de bêkariya bajaran dihewînin. Weke mînak di dema krîza 1997-1998'an de vê mekanîzmayê teqîneke civakî ku herkes li bendê bû, asteng kir. Vê modela aborî newekheviya herêmî û parçebûna welêt a li gorî cih, derxist pêş. Bi vî rengî şêniyên Bangoka mezin kêfa dewlemendiyeke heşt caran li ya şêniyên bakur û pênc caran jî li ya şêniyên bakurrojhilat derdixin [9].

Li welatên din ên herêmê jî newekheviyên bi vî rengî hene, lê heta niha qet teqînên civakî yên bi vî rengî li wan pêk nehatine ku bêguman sedema wan ketina nav hev a pirsgirêka civakî û rewşa siyasî ya li Taylandê ye. Thaksin bû serokê komeke nû ya siyasî ku bingeha wê li derveyî Bangokê ye. Ew ji bo xizanan qehremanek e lewra wî dengek û hesta ku ew dikarin çarenûsa xwe bi xwe diyar bikin, da wan. Hilbijartina wî ya sala 2001'ê û çar salan pişt re ji nû ve hilbijartina wî, weke ku nîşan bide ku rêya pêşketina civakî dikare di hilbijartinan re derbas bibe. Yên bêpar hiştî destûr dan xwe ku hêvî bikin, ew ê rojekê karibin ji eşyayên li navendên kargehan tên nîşandan îstîfade bikin û ne ku rêyan paqij bikin, firaxên dewlemendan bişon yan jî ji bo ku xwe ji germa û hêwîbûnê biparêzin li taxên luks biçin û bên… Jixwe jesta xwepêşandêran ya dawîn, xirabkirina sembola berxwiriya Bangokê bû; Central World'a navenda kargehan a herî mezin a paytextê.

Bi awirekî sosyolojîk, şerrên 1973 û 1992'an ên ji bo demokratîkbûnê dijberiyên di nava elîtê de didan der. Çînên navîn ên pêş diketin doza roleke siyasî ya girîngtir dikir. Sîstemê ji bo ku wan jî bixe nav xwe, xwe sererast kir. Dema ev yek kir jî bi komên din ên civakî jî da bawerkirin ku daxwazên wan dikarin bi rêya demokratîk ve pêk werin yan jî qet nebe bi guhnedaneke sivîl a ne bi şîddet. Di vê navberê de berevajî demokrasiyên din ên asyayî yên ku beriya wê û, bi awayekî reh û rîş berdayî, modernîze bûne, mîna Japonya, Koreya Başûr yan jî Taywanê, sîstema Taylandê nekarî yan jî nexwast bersivê bide daxwazên çînên gel.

Ji 1992'an û vir ve, demokratîkbûn ji cewherî bêhtir fermî (formel) bû. Li pişta rûyê ber bi derve yê demokratîk, sê saziyên kilît welat bi rê ve dibir: burokrasiya sivîl û leşkerî, *sangha* (mezinên dînî yên bûdîst) û monarkekî bavkanî ku bi awayekî belloq xwe di ser vî lodî de bi cih dike [10]. Monarşiya ku weke tevneke bandor û patrontiyê ya hêzdar tê zanîn avahiya cewherî ya sîstemê bû – û hê jî wisa ye. Lê êdî ji hev de dikeve.

Dema dirêj a desthilatdariya melîk Bhumibol digihêje dawiya xwe û guman hene derbarê yekîtiya xanedaniyê û dewama kapasîteya wê ku karibe di paşerojê de jî ne yekser jî be desthilatdariya xwe dewam bike. Di şanoya li ser rêyê ya xwînî de ku li Bangokê pêk hat, monarşî ji aliyê "kirassoran" ve weke hêzeke partîzan hat dîtin ku nîşan da ku jê nayê/yan jî meyla wê ya lihevanînê nîne. Di xwepêşandanan de posterên melîkî ji binî ve nebûn. Di çarçoveya herêmî de rewş hê xirabtir e. "Kirassoran" rol û siberoja monarşiyê kiriye mijara nîqaşan (red kiriye), lê herweha întelektuelên ku li çareseriyekê digerin jî ev kiriye. Artêş û polîs bi xwe di dema krîzê de bûne dubeş.

Aramî dîsa li Bangokê vegeriya. Birêvebirên xwepêşandêran yan xwe radest kir yan jî reviyan. Xwepêşandêrên herî dawiyê ku xwe sipartibûn perestgeheke bûdîst, hikumetê ew vegerandin gundên wan ên li bakur û mesrefa vê yekê jî girt ser xwe. Hikumeta Abhisit pêşniyara xwe ya hilbijartinên pêşwext bi şûn ve kişand, ev hemû jî bi şîretên lihevhatinê kirin. Ya xuya dike ew e ku hikumet û artêş bi alîkariya burokrasiyê ve desthilatdar in. Lê belê nerazîbûna civakî di bin re dewam dike û dikare ji nû ve xwe bide der. Vê carê, ew ê monarşiyê jî bide ber xwe bibe.

* Li Zanîngeha Sciences Po (CERI) lêkolîner e; li Zanîngeha Paris 8, li American University of Paris û li Enstîtuya Lêkolînên Ewropî profesorê tekîliyên navneteweyî ye.

Wergera ji fransî:
Luqman Guldivê

## Adi 74 salan de hijdeh darbeyên leşkerî

**-1932**
Darbeyeke leşkAerî bêyî rijandina xwînê monarşiya destûra bingehîn damezirand.

**-1939**
Siamê navê Taylandê li xwe kir.

**- 1941**
Japonyayê Taylanda ku hevdîtin dikirin, dagir kir.

**-1946**
Melîkê niha Bhumibol Adulyadej ji mişextiyê vegeriya û bû welîahtê Melîktiya Taylandê.

**-1947**
Darbeyeke leşkerî dîktatoriyeke leşkerî ya 26 salan dewam bike anî holê.

**-1950**
Bhumibol Adulyadej taca melîktiyê da serê xwe.

**-1954**
Thayland endamê damezirîner yê Rêxistina Peymana Asyaya Başûrrojhilat (SEATO) e, peymaneke leşkerî ya alîgirê rojavayê ye.

**-1965**
Di dema şerê Vîetnamê de Thayland dibû baregeheke leşkerî ya amerîkî.

**-1973**
Damezirandina rejîmeke parlemanteriyê ku dê ji aliyê cuntaya leşkerî ya sala 1976'an ve ji holê bihataya rakirin. Generalan heta 1982'an welat bi rê ve bir.

**-1992**
Partiya Demokrat di hilbijartinên parlamentoyê de bi ser ket.

**-2001**
Di encama hilbijartinan de ku partiya wî bi ser ket, karsaz Thaksin Shinawatra bû serokwezîr.

**-2006**
Darbeyeke nû ya leşkerî. Piştî hilbijartinên 2007'an hikumeteke alîgirê Thaksin kete şûna wî.

**-2008**
"Kiraszerên" dijberî hikumeta nû, herdu balefirgehên navneteweyî yên Bangokê dagir kirin. Partiya desthilatdar hat qedexekirin. Abhisit Veijajiva bû serokwezîr.

**-2010**
Piştî gelek hefteyan dagirkirina beşekî paytextê, hêzên leşkerî û polîsên dewletê dor li "kirassoran" girt. 88 kes hatin kuştin.

1- Robert Muscat, *The Fifth Tiger: A Study of Thai Development Policy (Pilingê pêncemîn: Lêkolîneke li ser siyaseta pêşketinê ya taylandî)*, United Nations University Press, New York, 1994

2- Hevpeyvîna Pasuk Phonpaichit, *New Mandala (Mandelayê nû)*, 4'ê Îlona 2007'an, http://asiapacific.anu.edu.au/newmandala/2007/09/04/interview-with-professor-pasuk-phongpaichit/

3- Chris Baker û Pasuk Phongpaichit, *A History of Thailand (dîrokeke Taylandê)*, çapa duyemîn, Cambridge, Cambridge University Press, 2009

4- Pasuk Phopaichit, *New Mandala*, li jor behsa vê hevpeyvînê hate kirin

5- Pasuk Phongpaichit & Chris Baker, *Thaksin*, çapa duyemîn, Silkworm Books, Chiang Mai, 2009

6- Bixwîne; Xavier Montheard, Thaïlande, au coeur de la "revolution jaune" (Di dilê "şoreşa zer" de Tayland), Planète Asie, *Le Monde diplomatique*, 15'ê Îlona 2008'an

7- Daneyên bankeya pêşketinê ya asyewî. Bixwîne; Zhuang Juzhong (dir), *Poverty, Inequality and Inclusive Growth in Asia (xizanî, newekhevî û mezinbûna pêre li Asyayê)*, Anthem Press, London, 2010, r. 3

8- *Bangkok Post* a 22'ê Adara 2010'an cih dabû van statîstîkan

9- Heman çavkaniya di jêrenota beriya vê de

10- Maurizio Peleggi , *Thailand: The Worldly Kingdom (Tayland: Meliktiya dinyewî)*, Reaktion Books, London, 2007

# Exlaq û aborî Kapîtalîzm nayê ser rêyê

YVON QUINIOU *

Gelo dema wê nehatiye ku kapîtalîzm biexlaq bibe? Di dema herî dijwar a qeyranê de, ev pirs ji alîyêbirêvebirên me ve hate bilêvkirin, Nicolas Sarkozy di serî de, ango ji alîyê kesên din ve hate rojevê ku berî dabûn paraztineke liberalizmê ya çavgirtî ku weke temsila “dawiya (bextewar) a dîrokê” dihate qebûlkirin. Pirsa ku bi vî awayî hate zimên tev li hev e: ger bivê, mirov wê biexlaq bike, wateya wê ew e ku kapitalizm bêexlaq e; ku mirov karibe wê biexlaq bike, tê wê wateyê ku *di eslê xwe de* weke sazûman ne bêexlaq e. Bi tenê biexlaqkirina aliyên wê yên tûj mewzûbahs e. Lê belê, berevajiya têgihiştina kesên ku di aboriyê de rastiyeke derexlaqî dibînin, bêexlaqî di haveynê kapitalîzmê de heye.

Ekonomistê ultra-liberal Friecriche Hayek, hîn di destpêka sedsala XX’ê de îtiraza xwe ya di vî warî de diyar kiribû [1]: bitenê tevgerek kesayetî ya bi zanebûn dikare yê biheq an neheq ji hev derxe – belkî sîstemeke civatî ya bi vî rengî nabe ku ji alîyê herkesî ve bê qebûlkirin. Ev yek Hayek heta ber bi redda têgeha “edaleta civatî” ve jî dibe ku Hayek wê tewş dihesibîne, ji ber ku ew tiştê ku nayê pirsiyarkirin jî dide ber pirsan û weke mînak wiha dinivîse: «*Pîvaneke ku mirov pê karibe tiştê “ji alî civakî ve neheq e” derxe holê tuneye, lewra kirdeya ku ji aliyê wê ve ev “neheqiya civakî” karibe hatibe kirin tuneye*[2]». Ew tê de heta bi şopeke antropomorfizmê (mirovteşetiyê) dibîne, ku li ser rastiyeke bêmirov (bi maneya bêkesayetiyê) projeya xwe ya niyetên mirovî pêk tîne; ev antropomorfizm dê cereyana sosyalîst û îddiaya wê, ji nû ve parvekirina bi awayekî adil a dewlemendiyê û navgînên berhênana wê zindî bike. Têgihiştina Hayek, di warê rêxistina aborî ya civakê de xwe digihîne exlaqîtiyeke temam, heta bi awayekî biryardayî, berî her tiştî, derfetên serpûşkirina xirabiya ku maka wê ye ji xwe ra peyde dike û bo vî awayî bingehê wê yê ramanî ji navê dibê û wê inkar dike [3].

Vê têzê bi saya André Comte-Sponville û pirtûka wî ya bi navê *Kapitalizm exlaqî ye gelo?* [4], ji xwe re ciwanine nû û bi saya wan jî serkevtineke medyatîk peyda kir, herçend ku naveroka wê ne li gora qeyranê be jî, ev yek nîşan dide ku îdeolojiya lîberal dîsa jî belav dibe. Gava ku di nava jiyana civakî de pergala zanyarî û teknîkî, ya hiqûqî û siyasî, ya exlaqî û etîkî (rewiştnasî) ji hev cihê dike jî (bi evînî salix dide), ew aboriyê dixe nav rêza yekem û wiha dibêje: «*Exlaq ji bo wê ne girîng e û ne xema wê ye jî; ew bi tenê ji bo wê ye ku ji wan çend pêvajoyan têbigihê yan wan rave bike ka kîjan dê di rêza pêşîn de ciyê xwe bigire. Ev yek bi taybetî ji bo aboriyê jî wiha ye ku ew jî beşek ji (wan) e*»[5]. Wê gavê exlaq li derveyî dimîne, kapitalîzm xwe li derveyî meydanê dibîne: ne biexlaq ne jî bêexlaq, lê li derveyî herduyan. Ev nayê wê wateyê ku exlaq nikare mudaxeleyî wê bike – êdî kes zêde piştgiriya helwêsteke wiha tûndrew nake. Lê, bi tenê dikare li der û dora wê, bêyî ku karibe, ne jî pêwîst be ku sedemên wê ji holê rake, ji bo ku ziyana wê kêm bike, di nav siyaset û hiqûqê de biçe û bê. Ji aliyê din ve, mirov nikare li ser navê pîvanên heyî ku bi tenê li ser kiryarên subjektif pêk tên, di pêvajoyên aborî de, di derbarê neliserkarbûna tu kirdeyan de, hikum bide: ji nû ve *derketina* fikra ku, li gora wê, herçend bersiva pîvanên edaletê nede jî, dê wateyeke exlaqî ya adilbûn an neadilbûna civakî, û vatiniyeke guhertina aboriyê hebe. Kapîtalîzm dikare neheq be, ew vê yekê qebûl dike, weke çawa ku xweza di parvekirina şiyanê di nava mirovan de ne adil e, helbet ev yek qet jî ne bêexlaqî ye û wê gavê nayê wê wateyê ku gerek ev ji binî ve bê guhertin [6].

Axavtinên weha ne bi tenê bi kêrî bêgunehkirina kapîtalîzmê tên ku zirar û ziyana wê ya mezin hê jî li pêş çavên me ye –ji aliyê din ve, bi kêrî piştrastkirina wê ya îdeolojîk ve jî tên- herweha bi ji wê jêbirina bitemamî ya azweriya exlaqî jî, li dijî siyasetê, aciziyeke giştîbûyî xurt dikin. Piştrastkirina wê li ser bingehaê çewtiyeke mezin e, ku pirr aşkere li cem Compte-Sponville û niha li bal hemî partîzanên kapîtalîzmê xuya dibe: entegrekirina aboriyê ya warê zanyarî û teknîkî, bi rastî jî ji aliyê exlaqî ve tiştekî naguhere. Wateya wê ew e ku tiştê ku wan bi awayekî bingehîn ji hev cuda dike were jibîrkirin.

Zanyarî û teknîk (ku aborî bi awayekî vekirî bi wan ve girêdayî ye) ji navgînan pê vê ne tiştekî din in û bi tenê bikaranîna wan a civakî dikare bê muhakeme kirin. Bi vî awayî, teknîkeke nû ya berhênanê ku berhênaniya karî zêde dike, ew bi xwe ne sedema bêkariyê ye û ne jî ne baş e; ew, berevajiyê wê, derfeta kêmkirina dema karî dide, ku ev jî dibe sedema hindikbûna êş û derdê mirovan: mirov dikare di demeke pir hindik de, bi heman karkiran ewqas berheman biafirîne ku ew jî ewçend derfeta başkirina mehaneya karkiran bi saya qezenca afirandinê dide. Buhayê vê yekê jî wê gavê di çawaniya bikaranîna wê bi xwe de ye.

Dijberê wê - û ev doktrîna Marx ya mezin e, jibîrkirina van teoriyên aborî yên fermî heta qeyrana nû-aboriyê ji *pratîkên* ku bi saya wan *hinek* (kapîtalist) li hemberî kesên din (karkir an kesên din ên bi mehaneyê dixebitin) bi cure awayekî tev digerrin ku – bi xwarina keda wan, bi xistina wan ya nava sistemeke dojehî, bi jikarderxistina wan ya bi mahneya reqabetê, yan jî bi saya çandeke rikeberiyê



Wêne: LMD

ku yekî dike dijminê yê din an jî bi qaideyên birêvebiriya nû ku dizane heta kijan radeyê êş û azara li karê di halê hazir de nayê tehemul kirin, xwe geştir dike [7]. Ev hemû ne ji zanyarî û teknîkê tên, lê ji tedbiqkirina wan a civakî ku karî organîze dike tên, ku weke tê xwestin li ser bingeha armancên berjewendiyê be û ji ber vê jî ravekirina wê pêşkêşî hukmên exlaqî tê kirin: pratîka mirovane yan nemirovane, pratika exlaqî yan a bêexlaqî. Marx jê bi awayekî zelal têgihîştiye û ji bo wê jî wiha dibêje «*aboriya siyasî ne teknolojî ye* [8]».

Bi awayekî giştî, –ji ber ku li vir hêza siyasetê mewzûbahs e- ev cûre rastiyek e ku bi awayekî giştî bi deyn didin aboriyê ku divê mirov bi mêrxasî li dij rabe: rastiyeke hergîz û objektîf, ku ji derveyî mirovan hatiye îlankirin (tevî ku ew wê dikin) û girêdayî qanûnên bêperwa, weke yên xwezayê, ku diyar e ku mirov nikare li wan hikum bike: mirov qanûna ketina tiştan rexne nake... ku carinan dikare mirov biêşîne jî! Navekî vê tevgera ramanî heye: *ekonomîzm*. Ev ekonomîzm, ne bi tenê ji bihêzkirina çalakiyên aborî yên sereke û giranbuha ku beriya her tiştî tên û yên mayî di bin siya wan de dimînin pêk tê, lê ew di eslê xwe de weke ku ji pêvajoyên ji bin berpirsiyariya politikayê derketibin pêk hatibe tê hesibandin.

Tevî vê jî, divê mirov baş têbigihê ku, heger bi rastî jî qanûnên aboriya kapîtalîst hebin, ew teqez yên sistemeke berhênanê yên navxweyî ne ku ji aliyê milkiyeta taybetî ve tên birêvebirin; ew dikarin têr nekin û heta, weke prensîb heger mirov sîstema wan biguhere, dikarin xera bibin ango bi kêr neyên. Wê gavê divê mirov di wan de *qaîdeyên likarbûna* cûre aboriyeke diyar (helbet ne dawiya dunyayê ye) û organîzekirina cûre raporeke pratîk di navbera mirovan de bibîne ku statuyeke wan ya pratîk bi xwe heye. Ew (niha di misteway cîhanî de) hatin qebûlkirin û bi cîh bûn, ji bo wê jî dikarin bên guhertin. Wateya wê ew e ku «qanûnên aborî» yên navborî, weke hemû tiştên ku tekiliya wan bi pratîkê ve heye yekser dikevin nav mewzûata exlaqî. Ji ber wê ye ku «zanyariya aborî» bi xwe nikare bibe zanyariyeke xwerû û ji darizandina nirxî jî nayê şûştin: weke çawa ku zanyariyên civakî bi awayekî giştî û weke pêdiviya xwezaya mijarê –kes jî tev li wê dibin–, nirxan, bi kêmanî nerastarast teahut dikin; ew çalakiya mirov digire û, em bixwazin an nexwazin jî, şiroveya rastiyê bi vî aliyî û wî aliyî de rast dike, dişîne.

Aborînasê amerîkî Albert Otto Hirschman tevliheviya di vî warî de baş diyar dike û destnîşan dike ku, gelek caran mirov bêyî hişê xwe, zanyariya aborî û ya exlaqî tevlihev dike. Ew diyar dike ku «*bi şertê ku exlaqê lêkolinerên zanista civakî zindî be, cihekî exlaqê* (…) *ê taybetî di navenda karê mirovî de heye* [9]» ; ew dide zanîn ku divê wê gavê metirsiyên exlaqî bi awayekî pirr vekirî ji aliyê zanyariya civakî ve bên misogerkirin – di vir de xwe dighîne Marx ku di *Destinivîsên 1844'an de* piştrast dike û dibêje ku aborî «*zanyariyeke exlaqî ya rasteqîn, him jî di nava zanyariyan de, zanyariya herî bi exlaq e* [10]».

Li me dimîne ku em zanibin bê gelo ev exlaqê ku ji me dixwaze ku em metirsiyên aboriyê di ser guhê xwe re navêjin û wê weke rastiyeke weha ku divê siyaset bi awayekî sersar serê xwe li ber bitewîne nebînin, ka çi ye. Beriya hertiştî, divê peywendiya mirov bi dîmena bi ser dunyaya têkiliyên nav kesan a bi dilpakî de xwarbûyî û kêmasiyên şexsî re nemîne. Berevajiya vê, divê mirov qebûl bike ku, ev exlaqê ji rewiştnasiyê cuda û di encamê de bandorê li têkiliyên bi kesên din re jî dike [11], divê li van hemûyan, bi awayekî giştî li *têkiliyên civakî*, yanî li jiyana siyasî (bi wateyeke teng, li saziyan), civakî (disa bi wateya peyvê ya teng, li mafên civakî) û aborî bê tedbîqkirin. Wê gavê, heger bi rastî jî wê ji Danezana mafên mirovî û hemwelatîtiyê ya 1789'an heta ya 1948'an dest pê kiribe û li herdu qadên sereke şopên xwe hiştibin, mirov dê bixwaze ku ew li ber deriyê aboriyê raweste. Divê mirov siyaseteke exlaqî ku divê di heman demê de bibe aboriyeke exlaqî jî bide ber çavên xwe û vê qedexeyê rake, yanî siyaseteke weha hebe ku nirxên exlaqî heta bi qada aborî pêk tîne.

Lê wê demê pirsa kijan siyaset û kijan nirxî tê rojevê? Bersiva vê pirsê dikare di nav tarîfa ku Kant kiriye de bê dîtin, ku xwe digihîne wateya exlaqê giştî: ev pîvana Gerdûnî ye, ku dixwaze ku mirov rêza kesên din bigire û fersendê nediyê, ku firehkirina sînorên otonomiya xwe li ser mirov ferz bike. Şuştina xwe ya ji hemû paşmaweyê metafîzîkî û dînî, mirov mecbûr dike ku serdestiya siyasetê (ku bi awayekî nîvco be jî ji alî saziyên demokratîk ve pêk hatiye), çewsandina civakî (ku bi awayekî qismî bi xêra qanûnên ku bi saya tevgera karkiran ji sedsala XIX'an û vir de hatine bidestxistin pêk hatiye), û herweha, *kedxwariya aborî* ji holê rake : di vî warî de, hîn pirr karên ku bên kirin hene; bi tenê heger mirov di vî warî de bi ser bikeve, dikare bi alîkariya siyaset û destkevtiyên exlaqî yên di warên din de wî biparêze û hîn pêştir bixe.

Bi rastî jî, derdikeve holê ku biexlaqkirina kapîtalîzmê, hergîz ne mimkun e, ji ber ku di xwezaya wê bi xwe de bêexlaqî heye, ji ber ku xwe dixe xizmeta hinekan, karkiran weke navgîn dibîne û otonomiya wan inkar dike. Ji aliyê kapîtalîzmê ve ferzkirin exlaqekî, dê bi rastî jî wê bigihîne ferzkirina rakirina wê bixwe ya ji holê, herçend ev kar gellekî dijwar be jî.

*Fîlozof. Pirtûka wî ya bi navê *Azweriya siyasetê ya exlaqî. Mirov guhertin?*, di nav weşanên *L'Harmattan*, koleksiyona *Raison mondialisée* de derketiye.

Wergera ji fransî: Yakûb Karademîr

1- Bi taybetî li pirtûka F. Hayek, "*Droit, législation et liberté / Qanûn, mevzûat û azadî*" binêrin, Presse universitaire de France (PUF) c. 3, 1980-1983
2- Berhema navborî (Bnb), c. 2, r. 94
3- Li ser pirsa encamên lîberalizmê yên li ser mirovî jî, Hayek bi rehetî weha dibêje, heger di rêyê de qurbanî hebin jî, «hema de bila ewçend jî hebe!»
4- Albin Michel, Paris, 2004, çapa nû 2009
5- Bnb, çapa 2 em, r. 78
6- Bnb., r. 238-239
7- Bi taybetî li xebatên Christophe Dejours an Jean-Pierre Durand «Nouvelles aliénation» binêrin, Actuel Marx PUF, Parîs, n° 39, Gulan, 2006
8- *Contribution à la critique de l'économie politique / Beşdariya rexneya aboriya siyasî*, Editions sociales, r. 151
9- Albert O. Hirschman, di *L'économie comme science moral et politique / Aborî weke zanyariya exlaqî û siyasî* de, Gallimard / Seuil, r. 109
10- Marx, passée la période de jeunesse / dema naşîtiyê derbaskirin, ev beş nehatiye teorizekirin: ev kêmasiyeke berhema wî ye
11- Ji bo min rewiştnasî tenê jiyana takekesî eleqedar dike û dikare xwe weke forma hişmendiyekê jî nîşan bide, û heger mirov bixwaze wê hîn bibe, dikare bê pêşniyarkirin

# Erebistana Suûdî, Dewlet li hember berhelistiyan

PASCAL MÉNORET

Vaye dewletek ku % 77'ê karsazên wê radigihînin ku ji bo başbirêvebirina karê xwe mecbûr in ku qanûnan binpê bikin. Ev hejmar û rêje zêde jî ne hevaheng e digel îmaja Erebistana Suûdî a monarşiya petrolê ya bi navûbangeke mutleq. Steffen Hertog, di berhemeke nû û asofireh de çerxên ekonomî-polîtîkaya Suudî Erebistanê keşf dike û yek bi yek îlûzyonên derbarê teoriya «*Dewleta rantiye*» de dadişikîne. Yekem qurbaniyê tûrneya wî ya li sofayên [salonên bendemanê] qraliyetê : fikra dewleteke qadirî mutleq ku xelkê xwe bi dewlemendiya xwe dipelçiqîne. Nivîskarê ku çend salan di wezareta Suudî ya plansaziyê de xebitiye, nîşan dide ku dewlet ji Saturna ku kurên xwe dadiqurtîne bêtir dişibe Gulliverê beramber Lilliputê: ev fîlê qurbanê qelewiya xwe, ji ber hezar xet û têkiliyên hûrik şehitiye. Dewlet hindî hazir û nazir e ku li her derê hind jî sabît û bêtevger e; çend zêdetir dahat û qezencan belav bike, bi wê nisbetê jî zêdetir dibe bende û girtiyê muşterî û torên xwe.

Heta niha hergav wisa nebû: salên 1950 û 1960'î, hejmareke mîrzayan rêveberiyek ji tunebûnê ava kir. Tenya xem û armanca wan tesdîqkirin û sabîtkirina hêza xwe û dewlemendiyê bû. Lê berhema wan [rêveberiya bêrêzik û bêpergal] bere bere şiklê xwe wergirt; ji kontrolê derket, her ku çû mezintir lêhat bêyî ku şiklê wê bê guhertin. Bi taybetî piştî zêdebûna petrolê bêhed a salên 1970'î, îroj encam û halê heyî pirr xirab û tirsnak e: Suûdî Erebistana ku bêhed dewlemend û hindî ku bibêjî bêserûber û belawela ye, ne xwedanê wê şiyanê ye ku reformekê bide sîstema xwe û civaka xwe veguherîne.

Ne ewqas hêsan e ku mirov tawanbarekî destnîşan bike. Ev dewlet dahata xwe ji çavkaniyeke derveyî ekonomiya neteweyî bi dest dixe, ku navê wê yê dewleta rantiye ji wir tê. Ji bo wê, ne hewce ye ku xwe li ser xelkê xwe ferz bike, ji ber ku dahatên wê ji petrolê tên û li gor prensîba «bac nebe, temsîl jî nabe» dixebite: xelk qebûl dike ku rayan [deng] nede û, beramberî vê, dewlet jî bacê ji xelkê nastîne. Digel vê hindê jî, mesele ne bi tenê li dora rantê dizivire, lewre Hertog bi hostatî nîşan dide ku ji bilî berdana zerfekê di nava sindoqeke dengan, rêyên din jî hene ku xelk ji dewletê re bibêjin «na». Nezelalî, gendelî, torpîl, îro-nasibe, rê û mekanîzmayên xwexilaskirin û reaksiyonê ne; ew rêbaz derfetê didine memûr û karsazan ku bibine xwedangotin û li pêş polîtîkayên ji jor ve têne ferzkirin li ber xwe bidin. Heke xelk hemû bi dewletê ve girêdayî bin, dewlet jî bi rexê xwe ve girêdayî hemû xelkê ye, û her yek bi awayekî çalak li dû bidestxistin û ragirtina berjewendiyên xwe ye.

Bi vî rengî, sîstem ne bi tenê otorîter e, herweha parpar e jî. Mîr û mîrzayên li ser barên zêran rûniştî ji xwe re bere û zeametin çêkirine ku heke hewce be beramberî hev bêdeng jî dibin. Berevajî Japonya an jî Koreya Başûr, wezareta endustriyê û wezareta plansaziyê qet nekariye wîzyona xwe bi birêveberiyê bidaya qebûlkirin. Bi ya Hertog, ev e sebeba rastîn ku Erebistan, digel ku bêhed û bêhesab dewlemend e, di warê aboriyê de serkeftî nîne.

Berhema Thomas Hegghammer ji rexekî din ve meseleya cîhadê ya li Erebistana Suûdî vedikole. Nivîskarê ku lêkolîner e di wezareta norwecî ya parastinê de, li dû ye ku bersivekê peyda bike ka çima êrîşên yên El-Qaîdeyê yên li nîvegirava erebî di navbera salên 2003 û 2006'ê de zêde bûne. Bersiva wî di du ristan de ronî dibe: sala 2002'ê, gelek şerrvanên suûdî ku ji dagîrkirina Afganistanê ya ji layê leşkerên hevpeymaniya amerîkanî direviyan, vegeriyane welatî û li dijî aramiya rojavayê dest bi tevger û çalakvaniyeke nû kirin. Îstîfade ji bêserûberiya hêzên asayîşê kirin û toreke çekdaran danîn û dest bi birêvebirina êrîşên xwe kirin berî ku ji layê îstixbaratên suûdî, amerîkanî û brîtanî ve bêne derdestkirin û bêtesîrkirin.

Nivîskar bala xwe bi zêdeyî dide ser El-Qaîdeyê û lewma çarçoveya siyasî û dîrokî ya Erebistanê di tariyê de dihêle, bi taybetî jî çerxên kontrol û tepeseriyê ku bi ya wî "ji aliyê mafên mirovî ve hêjayî pesindayinê ne" (r. 237). Diyar e ku gellek bikêrhatî ye ji bo ronîkirina teoriya tevgerên civakî, lê belê boçûn û perspektîfa wî analîzeke pirr klasîk e derheqê gotar û profîlên cîhadîstan de. Rûpelên hişk ên wekî fîşên polîsan, El-Qaîdeyê şexs bi şexs, beyan bi beyan, êrîş bi êrîş pêşkêş dikin. Beramber berfirehî û zêdeyiya belgeyan, mirov bi tenê dikare hêvîşkestî bibe: ya ku karîbû di warê dîrok û zanistên siyasî de bibûya pirtûkeke berketî, di eslê xwe de, bi tenê raporteke din e li ser "terorîzma îslamî".

Wergera ji fransî: Ergîn Opengîn


1- Steffen Hertog, *Princes, Brokers, and Bureaucrats: Oil and the State in Saudi Arabia*, Cornell University Press, Ithaca, 2010
2- Thomas Hegghammer, *Jihad in Saudi Arabia: Violence and Pan-Islamism since 1979*, Cambridge University Press, 2010




ILTER REZAN, *Beristan*
Teknîka tevlihev ya ser tûwalê




# NAVEROK

## TÎRMEH-TEBAX 2010

Civata rêzdar, Împeretoriya bêrûmet
SERGE HALIMI
▶ R. 1

Ji Hewldana Çareseriyê ber bi Şerrê Navxweyî ve
PROF. MITHAT SANCAR
▶ R. 1

EDÎTORYAL
▶ R. 1

"Rûyên Reş û Maskeyên Spî"
SHARO IBRAHIM GARIP
▶ R. 3

Îran û Rûsya, di navbera hevkarî û xirecirê de
JACQUES LÉVESQUE
▶ R. 4

HEVPEYVÎN
Diyalogeke banal di navbera Chomsky û guhdarên wî de
▶ R. 6

Li Amerîkayê, peywendiya parêzerî û siyasetmedariyê
ALAIN AUDI
▶ R. 8

Destana şerrê Îspanyayê
HÉLÈNE ANGER
▶ R. 9

Fatoreya salên Margaret Thatcher
J. B.
▶ R. 9

Nasyonalîzma flamanî ku ji motîfên nasnameyî bêtir xwedî bingehekî civakî ye
SERGE GOVAERT
▶ R. 10

Li gorî Mandela Incîl
ALAN GRESH
▶ R. 12

Gelo Afrîka bêyom e?
JEAN MICHEL DJIAN
▶ R. 13

Jiyana dewlemendan li bajarekî xizanan
JULIEN BRYGO
▶ R. 14

Deryaya reş
JEAN-ARNAULT DÉRENS û LAURENT GESLIN
▶ R. 16

Di nava Ereban de dînamîkên çandî
HICHAM BEN ABDALLAH EL ALAOUI
▶ R. 19

Ber bi koka qeyrana taylandî ve
DAVID CAMROUX û PHILIP GOLUB
▶ R. 20

Exlaq û aborî Kapîtalîzm nayê ser rêyê
YVON QUINIOU
▶ R. 22

Erebistana Suûdî, Dewlet li hember berhelistiyan
PASCAL MÉNORET
▶ R. 23

## Forma Abonetiyê

Nav
Name

Navnîşan
Address

Koda Postayê
Postcode

Bajar
City

Telefon

E-Mail

Abonetiya salane (12 hejmar!)

☐ Almanya (50 €)

☐ Derveyî Almanyayê (60 €)

☐ Abonetî ya dîjîtal (20 €)

Independent Kurdish Media Group GmbH (IKMG)
Post Bank
Account/Konto: 371219609 - BLZ: 50010060
IBAN: DE84 5001 0060 0371 2196 09
BIC: PBNKDEFF